


kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatolîyê

bîrnebûn

hejmar 80 | 2021



Mîrekîyên kurdên Anatolîyê, ALÎŞANZADE

Dr. Mikailî

Kurmancên Çankiriyê/Zeyvelîyê

Firat Karakuş

Hevbandorîya çand, bawerî û tevgerên tewşê

S. Erdem

bîrnebûn

ISSN 1402-7488

Tidskriften utkommer 3 nummer per år.

Çar mehan carekê derdikeve.

Utges av Apec Förlag AB

hejmar 80 / 2021

Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi

Editor: Ali Çiftçi, Seyfi Doğan, Muzaffer Özgür

Koma hevkarên vê hejmarê

Ali Çiftçi, Altun Başaran, Seyfi Dogan, S. Erdem,

Mûlla Evîndar, Selahattin Bult, Mem Xelikan,

Nuh Ateş, Ehmed Milan, Mehtab Îdelî, Xizan Şilan,

Feridun, Dr. Mikailî, Firat Karakuş, Bedia Sarihan,

Berivan Keskin, Zinarê Xamo, Konê Reş,

İbrahim Korkmaz, Ehmed Milan, Baranê Qereyazîyê

Adress

Navnîşana li Swêdê

Box: 8121,

SE 163 08 Spånga/Sverige

E-post

info@apectryck.se

Internet:

www.birnebun.eu

Belavkirin / Distribution:

Ewropa: Muzaffer Özgür

Birnebûn

Postfach 900348, 51113 Köln / Almanya

Tfn: 0049-172 298 24 51

Türkiye

İstanbul

Selahattin Bulut/Medya Kitapevi

İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Biha/Pris:

Europa: 5 Euro

Türkiye: 10 TL

Abone ji bo du salan

Swêd: 400 SEK -Almanya 50 Euro

Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

Numra kontoya li Swêdê:

(Birnebûn) bankgiro: 402-2224

Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê

APEC, "Birnebûn" Bankgiro-Stockholm/Sweden

BIC/SWIFT: DABASESX

IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874

Çap / Baski: Apec-Tryck AB



Zêva Xelê ji Altîlera

Wêneyê berga pêşin: Gundê Qışla ye.

Gundê yekem e ku kurdên Kengiriyê (Çankiri) ava kirine.

Ji arşîva Dr. Fikret Yildiz.

Her nivîskar berpirsê nivîsa xwe ye.

Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Birnebûnê re tîn, sererast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan nayên vegerandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û

Komela Ziman li Almanayê piştgirên kovarê ne.

Naverok

Ali Çiftçi, <i>Ji birnebûnê</i>	4
<i>Ji bo bîranîna Hüseyn Kerpiç</i>	5
Selahattîn Bulut <i>Ji bo yên dû min re</i>	6
Ali Çiftçi, <i>Roja zimanê dayikê</i>	8
Dr. Mikailî, <i>Mîrekiyen kurdên Anatoliyê, Alişanzade</i>	11
Firat Karakuş, <i>Kurmancên Çankiriyê / Zeyvelî</i>	25
Mehtap Îdelî, <i>Çend gotinên ji kurmancîya me</i>	30
Mûlla Evîndar, <i>Hêvîyên qaçax</i>	38
Mem Xelîkan, <i>Newroz e</i>	42
Bedia Sarihan, <i>Zarok pêşeroja me ne</i>	43
Mûlla Evîndar, <i>Karwan</i>	45
Mem Xelîkan, <i>Kilamên me-6, Mehmo Larwo</i>	46
Nuh Ateş, <i>Hênzel û Grêtel, çîrokeke almanî ji yên Grimm</i>	49
Seyfî Dogan, <i>Qerfê û Quto</i>	56
Seyfî Dogan, <i>Helbest</i>	57
Ferîdun, <i>Henek/Yaranî</i>	58
Berîvan Keskîn, <i>Çîroka Dikê Kuliksor</i>	60
Altun Başaran, <i>Şare, Ejê</i>	62
Zinarê Xamo, <i>Em ji kalikên xwe ji paşdetir in</i>	65
Konê Reş, <i>Zimanhezîya min ji gundê min Doda dest pê kir</i>	68
Îbrahîm Korkmaz, <i>Şofêrê texsiyê</i>	71
Ehmed Milan, <i>Ji çarînên Omer Xeyam</i>	74
Nuh Ateş, <i>Wergera ji almanî hikayeya Giovanni Boccaccio Teyr</i>	76
Baranê Qereyazîyê, <i>Şev tarî bû</i>	83
S. Erdem, <i>Hevbandoriya çand, bawerî û tevgerên tewşê</i>	84

Ji bîrnebûnê

Xwendevanên birêz, ev hejmarê 80î di destpêka biharê de derdikeve. Em bi vê hem dilşa û hem jî Xemgînn in! Em dilşa ne ji ber ku bihar destpêka jiyaneka nû ya salê ye! Saleka nû bi hatina biharê re dest pê dike. Jiyan ber bi ronahîyê ve tere. Roj dirêj û şevên tarî kêmîtir dibin. Ev jî her hêviyeka nû dide pêşerojê û meriv bi hêvî dike!

Ji bo me kurdan jî herçiqas destpêka biharê hêviyek û destpêka jiyaneka nû be jî, di eynê wextê de bi bîranînên komkujîyên wek Helebce û qirkirina kurdan bo me dilşikeştineka netewî ye.

Ji serdema îslamê vir ve nêzî sed fermanan li ser kurdan hatine dayîn. Erê, îro jî dişan ferman li hember kurdan têne meşandin. Ev demeka kurt bû ku êrîşên Dewlata Îslamî (IS) û Dewleta Tirk hinekî kêmtir û bêdeng bûn. Bi hatina hîharê re dişan bajar û wargehên ku kurd xwedî desthilatdar in tûşî êrîşan dibin. Lê kurd wek millet tu carî jî nav ranebûne û têk neçûne!

Hêvî û daxwazên me jî pêşengên hêzên kurdan ew in ku ji bo xatirê zarokên kurdan dev ji berjewendîyên xwe yê biçûk yê rojane û şexsî berdin û ji bo jiyaneka bi rûmet a însanî û kurdîtiya zarokên kurd hewil bidin û destbiraikiya hevûdu bikin da ku pêşeroja zarokên me jî wek yê xelkên din bin. Ne ku bi bîranînên wekî Helebce, Zilan, Dêrsim û Şengalê bin!

Birêzan, di vê hejmarê de ev babet nivîs hene: *Roja Navneteweyîya zimanê dê. Ji bo yê dî min re ji welathêz û emekdarê kitêbên kurdî Selahattîn Bulut, Mîrekîyên kurdên Anatoliyê, Alishanzade bi amedekariya Dr. Mikailî, Kurmancên Çankiriyê/Zeyveliyê ji Firat Karakuş, Çend gotinên kurmancîya Anatoliya Navîn ji Mehtap Îrdeliyê, Hêviyên qaçax ji Mûlla Evîndar, Zarok pêşeroja me ne ji Bedia Sarihan, Kilamên me: Memo Lawo ji Mem Xelîkan, Hênzel û Grêtel a ji çirokên berhevkar ên birayên Grimm bi wergera Nuh Ateş, Qefo û Quto ji Seyfî Dogan Henek û yaranî ji Ferîdun, Çirokê Dikê Kuliksoz ji Berîvan Keskin, ji folklorê me bi sernivîsa Ejê ji Altun Başaran, Em ji kalikên xwe ji paşdetir in ji Zinarê Xamo, Zimanheziya min ji gundê min Doda dest pê kir ji Konê Reş, Şofêrê teqsiyê ji Îbrahîm Korkmaz, Ji çarînên Omer Xeyam bi wergera ji farisî bo kurmancî Ehmed Milan, Teyr ji Giovanni Boccaccio bi wergera ji almanî Nuh Ateş, Şev tarî bû ji Baranê Qereyaziyê, Hevbandoriya çand, bawerî û tevgerên tewşê ji S. Erdem ve hatîye dagirtin.*

Di vê navberê de me çend heval, nas û dostên xwe, Hüseyin Kerpiç, Emrullah Süslü, Bayram Peker û İdrîs Kaya wenda kirin. Serê malbat û rêhevalên wan sax bin!

Bi hêviya ku hûn ê xwe û kesên din jî vergirtin û belavkirina Covid-19an biparêzin, Newroza 2021an li we pîroz be, bîminin di xêr û xwaşiyê de!

Alî Çiftçi

Ji bo bîranîna Hüseyn Kerpîç



**Me dost, heval û xizmê xwe yê delal
Hüseyn Kerpîç wenda kir!..**

Roja 05.11.2020 ji nav me bar kir û çû ser dîlovaniya xwe! Êşa me pir giran e.

Di jiyana xwe de hertim ji bo xelkê xwe û bi taybetî ji bo
kurdên Anatoliya Navîn xebatên bêhempa kiribû.

Hertim li dijî zordariyê bû. Azadîxwazê gelê xwe bû.

Serokê komela GÖLSAĞ (Komela hevkarî û piştgiriya gundê Gölyaziyê) bû.

Di destpêka derketina kovara Bîrnebûnê de piştgiriyan bêhempa kiribû.

Em wî ticarî ji bîr nakin û ew ê hertim di dilê me de bijî.

Malbata Kerpîç

Malbata Sarıtaş

Malbata Aksoy

Kovara Bîrnebûnê

Heval û rêhevalên wî

Ji bo yên dû min re

Çend roj berê xortekî nas lê navê wî mahfûz, hat kitêbxaneyê. Kitêbek ştend û ji me xwest em bidin kesê/a yekemîn ê dû wî/wê re. Me bi ya wî kir. Paşê ev name şand ji me re. Me xwest vê nameyê bi we re parve bikin.

Xwînerên ezîz ên kitêbxaneya medyayê

Di wê baweriyê de me ku mirovên heman mekanê parve dikin û ji heman kaniyê vedixwin sînerjiyeke bêhempa û taybet diafirînin. Ewqas ku, ne tenê bandora van ciyan li ser nasname û kesayeta me dimîne; di heman demê de mirov li hev jî zêde dikin. Min jî ji xwe pirsî ka ez dikarim çi bikim ji bo vê lihevzêdekirinê bidim berdewamkirin. Çi ku ez pir kêfxweş im ku yek ji mudawîmên vê mekanê me. Çi xweş e ku li vî bajarê metropol ciyek heye serê xwe têximê! A xweştir, parçeyek ji vê civatê me ku xwe li vê mekanê digrin!

Ez behsa Kitêbxaneya Medyayê dikim. Di her serdana xwe de ne tenê kitêbekê, hestgermîyên me yên hevpar jî davêjim tûrikê xwe û vedigerim mala xwe. Ji bo hevbandoriya xwînerên Medyayê geştir bibe, min xwest kitêbekê hîlbijêrim û piştî ez ji Kitêbxaneyê derketim, diyarî yekemîn kesê/a piştî xwe bikim û min ev ji Selahattîn Beg re got. Bi awayê ku ji dilê min hat, min xwest diyarî bidim kesên ji nav civata xwînerên Medyayê. Xalek jî heye, wê baş be binxêz bikim, ev tiştekî bi dilxwazî ye ku bi temamî ji xwîneran tê. Hêvîdar im hevbandorî û parvekirinên wiha piçûk wê nîrxên insanî vejînin.

Min kitêba xwe hîlbijart û ji yekemîn serdêrên piştî min re hişt. Hêvî dikim hevalê ku ev kitêb têkeve destê wî/wê, wê kêfê bigre. Bi hêviya zêdebûna tiştên xweşik, hay ji xwe hebin.


10/10/2020

Xwînerêk

Kitêbek we heye li kitêbxaneya Medyayê

Wek ku hûn dizanin “xwînerêk” hatibû kitêbxaneyê û kitêbek ştendibû. Him ji bo diyarî bike, him bi yên piştî xwe têkiliyêk wî/ê çêbibe, him jî bi hêviya ku bibe adetek, kitêbek ji me re hiştibû “ji bo yên dû wî/wê

re.” Me jî li gor daxwaza wî ew kitêb dabû yekî/ê. Di nav demeke kurt de fikra wî/ê xwînerî/ê hat bihîştin û bala mirovan kişand. Ji bo mayinde bibe li ser hesabên xwe yên medyaya civakî parve kirin. Ji bo bibe adet bi



hev re ketin têtîliyê. Va ye wê fikrê
berê xwe yên ewil dan. Vê heftayê
xortek hat. Du kitêb stend û “ji bo
yên dû wî/wê re” hiştin.

Bi hêviya ku her dem li Kitêbxa-
neya Medyayê “kitêbek ji bo we
hatibe hiştin” hebe...

Selahattîn Bulut



Roja zimanê dayikê

Alî Çiftçi

21ê sibatê roja navneteweyî ya zimanê dayikê ye.

Di sala 1952an da ji aliyê polîsên pakiştanî komek xwendekarên bengalî ji ber ku bi xwepêşandaneke doza zimanê xwe kirin, hatin kuştin. Li Bangladeşê ji sala 1971ê ve roja 21ê sibatê ji bo bibîranîna wan xwendekaran wekî Roja şehîdên zimanê dayikê tê bibîranîn.

Ew roj ji hêla UNESCOyê ve (Rêxistina Zanist, Çand û Perwerdeyê ya Neteweyên Yekbûyî) di 1999an de wek Roja zimanê dayikê ya navneteweyî pejirand da ku pîrrengîya zimanî pêşve bixe û yekem car di sala 2000an de hate pîrozkirin. Li Swêdê li gor Enstituya ziman û bîranînên gel (*Institutet för språk och folkminnen*) tê texmînkirin ku nêzîkî 200 zimanên dayikê têne dengkirin. Zimanê herî mezin swêdî ye, bi qasî 8 mîlyon, finlandî û erebî jî zimanên ku piştî swêdî herî pir têne dengkirin. Ji wan zimanên dayikî jî derveyî swêdî, samî, meänkieli û romanî yên din giştîk zimanên koçberan e. Gelek zimanên zikmakî yên din li Swêdê hene ku tenê sed an dused axaftvan hene, wekî zimanên afrikî woolof an

mandinka. Piştî ku Swêdê di 2000an de Peymana Ziman a mînorîteyên ewropî îmze kir, finlandî, samî, meänkieli, romanî û yîddîş ji zimanên hindikahîyên neteweyê (minorîte) ve xwedan statuyek taybetî ne. Zimanê îşaretê yê swêdî di heman demê de zimanê dayikê tê hesibandin wekî zimanên hindikahîyên neteweyî (koçber) bi taybetî tê parastin û pêşve xistin. Mafê herkesî li Swêdê li gor vê peymanê hatiye parastin û jê ra îmkan peyda kirine ku bixwaze perwerdeya zimanê dayika xwe bibîne. Zarokên kurdan jî bi taybetî yên bakurê welêt û yên Anatolîyê cara yekem meriv pir bi rihetî dikare bibêje ku li Swêdê ev mafê xwe karibûne bi kar bînin.

Tirkîyeyê Peymana UNESCOyê di 20ê gulana 1946an de îmza kiriye. Ji nav 22 dewletên ku cara yekem peymana UNESCOyê îmze kirine de Tirkîye di rêza 10an de bûye. Lê heta niha jî tu cara ev peyman bicîh neanîye!

Kurdên me yên ji Anatolîyê ku di destpêka 1960î de wek îşçî/koçber hatinê Swêdê bi reforma zimanê malê ku li Swêdê di 1977an de dest pê kiribû, bûn xwadîyê wî mafî ku

perwerdeya zimanê xwe bibînin. Di destpêka 1980î de ji ber vê reformê li bajarê Stockholmê çend kireş (helînên zarokan) ji bo zarokên kurdan li beledîya (şaredarî) Stockholmê hatin vekirin. Hinek ji wan jî bi duzimanî bûn. Herçiqas Tirkîye li dijî perwerdeya bi zimanê kurdî derdiket jî ev xebat bi salan berdewam kir û îro li seranserê Swêdê ev maf ji bo zarokên kurd heye û bi hezaran zarok perwerdeya zimanê dayika xwe dibînin.

Fersenda pêşxistina zimanê dê ji bo her însanî hewceyeke bingeîn e. Yên ku ji zimanê dayikê bêpar in jiyana wan diwartir dibe, bi taybetê di vê dema niha de ku pirçandî li piraniya welatên Ewropayê heye. Encamên lêkolînên li Swêdê hatine kirin, diyar in. Zarokên koçber ên ku perwerdeya zimanê dayika xwe pir dibînin, di dibistanê de serkeftî dibin û bi gelemperî di fêrbûna zimanê swêdî de jî baştir dibin.

Îro li piraniya welatên Ewropayê perwerdeya zimanê dayikê pirs-girêkek siyasî ye. Pêşeroja zimanên zikmakî li Swêdê jî pirs-girêkek siyasî ye. Pêdivî ye ku di dibistanan de ji bilî zimanê sereke yê welatên Ewropî ku kurd lê dimînin, fêrkirina bi zimanê dayikê berfireh bikin. Ev



maf li hemû welatên Ewropayê û li Tirkîyê jî li gor peymana UNES-COyê heye.

Li Swêdê ji 1ê havîna navîn ya 2009an ve qanûnek taybetî ya ziman heye. Li gor vê qanûnê divê zimanê swêdî li Swêdê bibe zimanê sereke, zimanekî bêkêmasî û civakî. Di qanûnê de her weha tê gotin ku mafê her kesî yê zimanê xwe heye. Ev tê wateya mafê fêrbûn, pêşxistin û bikaranîna swêdî, zimanê nişana yê swêdî û mafê pêşvebirin û bikaranîna zimanên din ên dayikê. Ger ev bi rastî bê pêkanîn, mercên pêşerojeka baş ji bo swêdî û zimanên din ên dayikê li Swêdê hene.

Gotina zimanê dayikê

Gotina zimanê dê (*modersmåf*) herî kêr ji sedsala 15an ve bi swêdî heye. Ew wergerandineke raşterast a lingua materna ya latînî ye. Di sîstema perwerdeya Swêdê de, îro zimanê

dayikê ji bo zimanên koçbera tê bikaranîn ku hemû zimanên dayikê yê ji bilî swêdî, yê ku berê bi gotineka ne dîyar wekî zimanê malê dihat binavkirin.

Rewşa zimanê kurdî li welêt û li welatên Ewropayê

Îro piraniya zarokên kurdan ji vî mafê xwe yê bingeîn li welatê xwe bêpar in. Tirkîye ti cara ev maf ji bo zarokên kurd bicîh neaniye û her politikaya xwe ya asîmîlekirinê roj bi roj pêşda biriye û di van salên dawîyê de hîn jî bi hêztir kiriye.

Li vê dema ku internet och medya civakî pêşketiye, em dibînin di şûna ku kurd bikaribin vê destkevtiyê ji bo pêşxistin û parastina zimanê xwe bi kar binin, piraniya kurdan berê xwe didine medyeyê bi zimanê tirkî!

Eger li bakûrê welêt pêşengên kurdan, partiyên siyasîyên kurdan û

herwiha welatên ku kurd lê dimînin ji bo ku zarokên kurdan bi zimanê xwe perwerdeyê bibînin îmkana peyda nekin, pêşeroja zimanê kurdî ji bo zarokên kurdên bakûrî û yên Anatoliyê tune ye!

Wek min li jor destnîşan kir, li welatên Ewropayê ev mafê parastin û pêşxistina zimanê dayikê ji bo herkesî heye ku dixwazin nasnameya xwe û zimanê xwe biparêzin. Li Swêdê herçiqas kurdên me gîştik wî mafî bikar naynin jî ev li gor welatên din pêşdatir e. Îro li Swêdê bi sedan mamosteyên bi zimanê kurdî dersê didin hene û nêzikî heft hezaran jî zarokên ku dersa zimanê xwe yê dayikê bi kurdî dibînin hene. Ya li me dikeve ev e, divê em lê bixebitin ku ev nimûneya li Swêdê heye, li welatên din hîn bi berfirehî bê bikarnîn.

Mîrekîyên kurdên Anatolîyê

ALÎŞANZADE

Dr. Mikailî

Eger meriv li arşîvên dewleta Osmanî mêze dike û tê da li kurdên Anatolîya Navîn digere, di her rûpelê da rastî navekî tê:

Alîşanzadeyan

Bi rîya wana, yan jî bi rêbertiya wana kurd bi zorê li Anatolîyê hatina îskankirin. Di piranîya belge-nameyan da zelal dibe ku ew memurê dewleta Alî Osmanî bûne. Di hêjmarên kevn ya kovara me da li ser vê xanedaniyê çend caran hatibû nivîsandin. Le wê hingê di destî me da ev dokumentên arşîvan tunnebûn. Nika bi nivîsên ji arşîvan va, hertişt hîn jî zelaltir û eşkere bûn.

Gotinên malbata wan û tiştên ku li ser wan hatine nivîsandin û meselên di nav xelkê navçê da di derheqa Alîşanzadeyan de hatine qalkirin, hevdu digrin û temam dikin.

Em li vir dikarin vê bibêjin: Alîşanzadeyan bi çend neslan di navçeyê da mîrîtiya kurdan kirine û hertim bi dewletê va tevhev kar kirine. Ew li gor belge-nameyan ji serî

1763an bigire heta 1865an li ser hukm bûne.

Berî hatina wan ya Anatolîya Navîn jî, ew dîsa malbateka mîr bûne. Li gor belgeyan ew ji Xarpetê (Harput) ne. Rola wan, yan jî karî wan di vê navçeyê da, ji Çankiriyê (Kengiri) bigire hetanî Amasyayê heye.

Ew bi taybetî mîrê Canbegan in, lê bes dewletê hin êlên din jî bi wan va girêdane û di îskan û îdara kurdên reşî, şêxbezenî, hêcibî, etmanî, şêxkî, mikailî, zeyvelî, geygel jî ew bi kar anîne, wezîfe dane wan.

Pir cara hukmê wan, quwet û hêza wana negihîştîye êl û eşîrên din yên kurd yan jî turkmenan, yên ku bi fermana sultanî Osmanî di bin îdara wan da bûne. Wê hingê di nav wan da şer derketîye û ji hev pir kes jî kuştine. Li gor rîwayetan Alîşan begê mezin di van şerana da jiyana xwe daye û hatiye kuştin. Lê em di nav arşîvan da rastî vî tiştî nehatin.

Ew xanedan hetanî 1865an li ser kar mane, jî vê tarîxê şûn va Osmanîyan

êdî li her derê împaratorîya xwe mîrên kurd ji ser kar hilgiritine û li şûna wana ji Stenbolê memûrek şandine û dane ser kar. Weka bi navî midûrê nahîyê, kapucubaşi, kethuda, qaimaqam. Piranîya van memurên dewletê bi eslê xwe alban/arnawut û ji balkanan bûne.

Hin caran li ser gilîkirinê ji vê malbatê ki li ser kar bûye, ew avêtine hepsê, yan jî sirgûnî bajarekî din kirine. Yan jî li dereka din wezîfe dane wana. Lê li şûna wana dîsa ji vê xanedanê kesek anîne ser kar. Yekcaran ji bo karî wan î baş nîşan û xelat danê, yekcaran jî ceza dane wan. Em ê belgenameyên wan bûyerana giştikan, ji tarîxa kevn da bigirin heta dema nû pêşkêşî we bikin.

Herçiqaş malbat qala sê Alişanan dikin jî, di belgeyan da em rastî qala du Alişanan hatin. Alişanê 2yan kurê Xelîl begê ye û Xelîl beg jî dîsa lawê Alişan begî lê ye. Alişanê 2ya ji sala 1845an da hatiye ser kar hetanî mirina xwe (1857) li ser kar maye. Ji bo vê, êl û xelkê din pir gurra wî nekirine, rêz lê negirtine. Lê li hêla wî apanên wî hukum kirine. Em di belgeyan da rastî hin navan hatin ku wekaleta wî jî kirine, yanî li hêla wî îdare kirine, weka Hüseyin beg.

Em ê vana giştika bi dorê binivîsin. Kurtenivîsa van belgenameyan bi tirkîya osmanîya latîni jî pêşkêşî we dikin.

Lîsta belgenameyên rêvebirîyên Alişanzadeyan:

Belgename 200-9962, H 29.03.1157

(1741)

Malatya'nın Şutili kazasındaki Cihanbeyli aşiretinin Rakka'ya iskanlarına ve Malatya'nın eşkıyadan temizlenmesine dair Diyarbakır valisi Ali ve Malatya Mutassarıfı Rışvanzade Mehmet Paşalara hüküm.

Belgename 81 1162(1746) S. 2

Rakkadan kaçan Cihanbeyli İmranlı kürtlerinden kurtulmak için Malatya Şora kazası halkının talebi.

Belgename 103.7005, H 02.01.1199

(1763)

Ankara, Kengiri, (Çankırı), Çorum, Bozok (Yozgat) ve Kayseri sancaklarında bulunan göçebe Türkmen ve Ekrad taifesine nizam verilmesine dair defterdar takriri.

Belgename 7.628, H 10.07.1203 (1787)

Ekraddan **Cihanbeyli Aşiretinden Alişan** nam şakinin Kengiri ve Çerkeş kazaları ahalilerine vaki olan taaddi ve hasaratı hakkındaki telhis üzeri-

ne Rumeli ve Anadolu, da zuhureden eşkıyanın izalesi.

Belgename 112.5559, H 29. 05.1228 (1813)

Muharebe münasebetiyle Anadolu taraflarına dağılmış olan tatarların Karasu vadisinde (Sakarya) iskanları takarrur eylediğinden Karahisarı Sahib (Afyonkarahisar) dahilinde Barçınlı kazası ve nevahisinde bulunan tatarlar hareket etmek üzere olmalarıyla Cihanbeyli Aşireti beyi Halil Bey, in tatarlardan gasbeylediği emval ve eşyalarının veya bedelinin tahsili için Karahisarı Sahib mu-tasarıfına yazılan hüküm.

Belgename, 446. 22287, H 07.06.1240 (1825)

Cihanbeyli Aşiretinin vatani asileleri olan Harputa nakl ve iskanlarının Tırkanlı usatı gailesinin definden sonraya taliki hakkında.

Belgename, 54.2671, H 30.03.1243 (1828)

Cihanbeyli Aşireti Beyi Mustafa Bey ile amcası Hacı Ömer, aşireti arası-na fesad sokarak İstanbul'a gönderilecek koyunlara mani olduklarından Tolcu'ya sürülmeleri hakkında Karaman Valisi Ali Paşa'ya hüküm.

Belgename, Cihanbeyli aşireti beyi Mustafa Bey ile Ortaköy ayamı Ali


Ağa'nın sürgün edilmeleri hakkındaki emrin suretlerini havi.

HAT_00446_22289_I_00002, H 28.06.1246 (1830)

Rışvan aşireti, nin Sivas, ta değil Konya ve Ankara, da iskan edilmek istediklerine, Cihanbeyli Aşireti Re-isi Alişan Bey, in tecziyesine dair.

Belgename, 67.3347, H 08.09.1258(1842)

Cihanbeyli aşireti yaylaklarının, Alişan Bey, e ihalesi talebi.



Cihanbeyli aşireti beyi Alişan beye istabli nişan ve payesinin verilmesi. S1- 1259

Belge: 2.9, H 10.02.1259(1843)

Ankara'nın Cihanbeyli aşiretinden müteveffa (Vefat etmiş) Ömer Bey'in zimmetindeki alacağının varisleri tarafından ödenmesi için Ankara kaymakamına bir mektubi sami yazılmasına dair sarraf Davithanin arzuhalı ile mukteza kaydı

Belge: 88: 73.3643, H 24.02.1259 (1843)

Cihanbeyli aşireti beyi Alişan Bey'e İstabl Amire paye ve nişanı tahsis ve ita buyrulduğuna dair tezkere.

Belge 23/ Sayfa 1 H-29.02.1260(1844)
I-MVL-00055-001056-002-001,
Mir Aşireti Müdürü Abdulhalim ve Cihanbeyli Aşireti müdürü Alişan beyin azliyle, yerlerine vekil tayini ile ilgili.

Şuhudu kalem olub takdim etmiş oldukları bir fetvanız ki manzur valâ'yi müşirileri buyurulmak üzere evrakı mezkure ile müteallik irsalat-i a'lade kılınmış olmağla icra-i iktizası babında irade etmektedir.

Vezirazamın gördüğü sondaki.....

Maruz-i bendeleridir ki asla zib tevkir ve ağraz olarak işbu tezkere-i mumaileyhleri muhadi rehin ittila-i acizleri olarak nazar-i müşarun ileyhe hazretlerinin takrirleriyle mezkur mazbata müşarun ileyh Rüstem Paşa

hazretlerine bi'l iradet-i erbabına mutalatı evladır.

Hak-i pay'ı alilerine ma'ruz bendelerine muaccel'ul müzakere meclis-i vilayet havale buyurulub --- neha takdim sevb-i sipahsalarları katmak-ı maliye te'hiri

Devletlu paşa hazretlerinin.....neferleriyle meclisi ziraatın mazbatasının mütalaasından ma'lum-i rivayeti merkum emval-i mirilerinden dolayı üç senelik zimmetinde hayli şey terakkim etmiş ve kendisinin kuvve-i maliyesi olmadığından başka bazı kesane dahi....duyunu (borcu) bulunduğu aşiret-i merkume bu sene dahi uhdesine bıraktığı halde dört senelik Emval-i miriye çevireceği beyanıyla Aşiret-i merkume emri iradesine Ankara ve civarından Salahaddin Ağa beylerinin memuriyeti ve yarısından ahir bir nasbi irsal buyurulması.

Ankara Sancağı saadetlu aza paşa beyleriyle defterdarı akdi.

Kulları tarafından işar kılınmış ve meclis-i ziraatden dahi mir-i aşiret namının tay ve imhasıyla herbir cemaat için kendi ibtihablarıyla müdirler tayin kılınarak ve yargı ve mizban saireleri mumaileyhe tabii ettirilerek tefrik ve tansisi ve hususan sairelerinin tasviyesi zimnında ağayı

mumaileyhin müdür suretinde olmayarak bu hususların icrasına me'mur kılınması ve bil mumaileyhin muhasebesi bilrivayeti zaman-i miriyesinin tahsili hususunun dahi tasarrufun müsad ve defterdar-ı mumaileyhlere sualesi sureti gösterilmesi ve meclisi mezkurun mutalaası doğrusu etraflıca duyumlu olacağından risk üzerine gidilmesi lazım gelmiş ise de ma'lum mekarim-i me'zum işhaneleri buyurulduğu üzere bilcümle aşiret hakkında icra buyurularak iskan maddesi henüz takarrur edilmiş olması ve mir mumaileyhe bedel meşair etraflı bulunması cihetiyle miri-i aşiret namının tay ve imhası maddesinin şimdiden icrası esbabına ol vecihle mübaşeret olunması şayed mahallince mizar-ı maslahata muafik düşmez gibi hatırlanarak bazı mutala-i hutur itmiş ve mir mumaileyhin zaman-i miriyesi takribi mezkurde gösterildiği üzere tahsil olunmak li enderun olacağı misüllü matluban-i ahalinin dahi istirdad-i iktizayi muhaniyetden ise de matluban ahali denerek meblağ-i nukul..... ol emre rivayet olarak... badehu icabına bakılması sureti dahi tanzimat-i hayriye usul-----nesroluna muafik görünmüş olup fakat atufetlu **Rüstem Paşa Hazretleri** beyleri dahi maslahatın ma'mur..... olmasıyla

anların ifadeleri Eşaran mahalliyesinden akit olacağına beyti meclisi ve vukubulan borca bâlâ mezkurının üzerine müşir-i müşarunileyh Hazretleri bendelerinin mutalaati teveccühle ra'yi zerin isabet-i karin (Altın gibi bir görüş, yakın bir isabet) seraskerleriyle ne surette taalluk etti ise lütfen ışar ile evrak-i mezkurenin iadesi babında emr ü ferman.... mahallul emrindir.

Belgename 23/B I-MVL-00055-001.56-003-001,

Azil Sayfa 2 olduğundan şayet müdiran tarafından muamele-i atifeye kalkışılarak emr-u iskanları kamilen icra olunub bundan sonra saye-i.....mulukanede iskan ve yuvalarına teşebbüs olunacak Sivas ve mahalli saireden bozan aşaire vekaleten müstevcib-i dehşet olub bari-i husmetleri olacağı mutalaadan gayr-i baid olmasıyla böyle olmaktan ise **mir-i aşiretlik mezkurun külliye imhası** hususu merhune-i (rehin alınmış) bittevfik haremeyni aşiretin olduğu misüllü, **aşiret-i merkumenin beher oymağına birer nefer muhtar nasbıyla mumaileyh Salahaddin Ağa'nin miri-i aşiret unvanıyla me'muriyeti** icrasıyla hem emval-i miriye'nin vakt u zamanıyla istihsal ve bir taraftan makulen te'lif miyaneten ahali ile bir

tek dilhah emr-i iskan ve eyva ve ahali-i mesken hükmünde bulunmaları madde-i lazimesinin istikmaline ve hemrah-i mumaiyleh Alişan bey zimmetde meclisce tebeyyün etmiş olan emval-i hazine -i celilenin istihasi keyfiyet-i ehemmesine medar olacağı bi menni-hi teala ilerude kaffe-i aşiretin iskan ve eyvalık olduktan sonra mir-i aşiretin tebdili lazım gelenleri tebdil ve ibkaları icab edenleri ibka olunarak ol vakit cümlesinin birden ünvanları lağv ile murir ittihak olunmasında fevaid-i ari-de husule geleceğinin beyan ve mir müşar'un ileyhe mazarratlarının işbu Âşaran vakaasi mutalaat-i meclisi-i vilaye mueyyid ve muafik hali maslahat görünüb tahsilat hususunda dahi bir vechi müzakere tahrirat-i saniye taştiriyle hazinece icabının icrası hizmete nazır müşarun ileyh hazretlerine havalesi lazım geleceği meclis-i vilayete tezkir kılınması olduğu muhata' ilm-i „alileri buyurdukda emr-u ferman hazreti men lehu'l emrindir.


Muhterem çakir-i kemine-lerinedir ki isimleriyle tanzim olan işbu tezkire-i samiye-i ihzazlarıyla mazbata-i mezkure ve evrak-i meşmul haizen mekarim-i ikazeten hazreti Pa-dişah -i buyurulmuş tezekkür ve iştirak buyrulduğu vechiyle mütellik müşer-refşudur buyurularak irade-i seniyye

cenab-i Hilafet penahi iktizayi celila-neden emrederek mezkur mazbata ve evrak yine bahran-i samî'in aşafililerine (Vezire ait, ilgili) iade ve esan kılınmış olmağla ol babda emr-i ferman Hazret-i men lehul emridir.

Fi 29 Cemaziyel evvel Sene1262 (1846)

Belgename 87: 94.4731, H 01.12.1260 (1844)

Cihanbeyli aşiretinden Alişan Bey'in aşiret müdürü nasb ve tayini.



Cihanbeyli aşiretine Alişan beyin nasb ve tayini, s1- 1260

Belgename: 99.5008, H 08.03.1261 (1845)

Cihanbeyli ve tevbii aşairinin iskanlarını havi Alişan bey'in tahriratının arzı.

Belgename: 61.78, H 24.01.1263 (1847)

Sadaret yaveri Yusuf bey'in adamlarının mal ve eşyasını gasb eden Hanto ve oğulları Sivas'ta tutuklu iken Cihanbeyli aşiretinden Alişan Bey'in kefaleti ile serbest bırakıldılarsa da Türkanlı (Têrikan) aşireti ile birleşip şekavete başlamaları üzerine yakalandıklarına ve haklarında yapılan muameleye dair Ankara Mutasarrıfı **Vasıf'ın yazısı.**

Belgename: 15.52, H 27.09.1263(1847)

Cihanbeyli aşiretinden **Alişan Bey'in vekil bulunan Hüseyin bey** tarafından kır serdari tayin olunan Çakır Bey'in karındaşı (kardeşi) oğlu Ömer ve Başçavuş Fevzi ve Püsküllü Hasan ve subdari Mehmed ve arabacı kavas ve serdan Feyzi nam kimseler Seferihisar (Sivrihisar) ve Eskişehir kazaları civarlarında bazı insanların emval ve eşyası ve nükud ve eslihasını nehb ve garet etmekte ve sıkıştıkları halde miri mumaileyh tarafına firar eylemekte oldukları.

Belgename: 103.94, H 30.12.1263(1847)

Cihanbeyli Kürt Aşireti'ne ilhak edilen Geygel (Keykil) Türkmen Aşire-

tinin Bilecik Kaymakamlığına bağlanıp aşiret beyinin müdür tayin olunması niyazına dair, zıkr olunan aşiret ahalisinin mahzarı.

Belgename: 232.23, H 11.12.1265 (1849)

Cihanbeyli aşireti müdürü Alişan, **aşiretlerin iskanına memur olan Vecihi Paşa'nın kethüdası Halim Bey**'in bazı kişilerden mal ve hediye almasından dolayı kendisinin de haksız yere tedip edildiğinden bahisle Dersaadet, te istihdam edilmemesi talebi.

Belgename: 2.79, H 03.03.1266 (1850)

Cihanbeyli aşireti emiri Alişan ile Halim Bey'in Ankara'da iskan edilmiş olan Reşvan Aşiretinden rüşvet almaları ve İbrahim Ağa'nın topladığı vergiler ile emvali miriyeyi saklaması durumlarını incelemek üzere bir memur tayin edilmesine dair Maliye Nezaretine yazı.

Belgename 63 - A_}

MKT_NZD_00006_00038_001_001--17.06.1266(1850)

Cihanbeyli aşiretinden **Alişan Bey'in mahdumu (oğlu) Ömer**'in zimmetinde olan meblağın ağnam müdürüne tesviyesine dair istida ve buyruldu.

Belgename: 31.26, H 29.10.1266(1850)
Paşadağ ve Konya 'da bulunan Reş-
van aşiretinin iskanıyla uğraşan Ha-
lim Bey ve Cihanbeyli aşireti müdü-
rü Alişan, garazkarane davranarak
aşiret mallarının telefine sebep ol-
duklarından sahip oldukları makam,
rütbe ve nişanların geri alınmasına,
ayrıca Cihanbeyli Aşireti 'ne kayma-
kam olarak Ali Ağa 'nın tayin oldu-
ğuna dair Ankara valisine şukka.


**Belgename: H 25A-TSF-00008-00052-
001-A/11.1266(1850)**

Ankara sancağına dahil Cihanbeyli
Aşiretine Rikabı Hümayun kapucu-
başlarından (doğrudan Padişaha
bağlı) Ali Ağa 'nın kaymakam ola-
rak tayin edildiği üzerine sadir olan
ferman-i ali ve faaliyet buyurulan
irade-i seniyye mazbut celili üzerine
Ankara sancağına vaki Cihanbeyli
aşiretinden rikab-i Humayun-u şa-
hane Kapucubaşlarından Ali Ağa
Kaymakam nasb ve tayin olduğu
hemen ba ferman-i şerif neşriyat-i
divan-i Humayun Saadetlunun
ikra' i i'tasına işbu ilan-u haber veril-
di.

Mukabele Fi sene 1266

Seyyid Abdulkadir Haşmet

Teşriflen bulan Saadetlu Bey Efendi
i'tasına ilim.




Konya-Kirşehir iskan edilmiş Cihanbeyli
beyi Alişana 1241 verilmiş olan Müdürlük
ve tacirbaşlığının iptali, S, 1- 1269

Belgename: 755.8, H 12.10.1267(1851)

Ankara'daki Cihanbeyli, Atmanlı,
Şeyhbezenli, Mikaili, Emirler, Key-
kil ve Ziveli ile Tabanlı kazasının ade-
ti ağnam rüsumunun, adı geçen aşi-
retlerin kaymakamı Rıza Bey'e
ihalesi.

Belgename: 3525, H 21.08.1267(1851)

Konya eyaleti, Aksaray kazası ile
Ankara eyaleti Haymana kazasına
iskan ettirilen Aşairi Seba (Yedi-
boy) kaymakamlığı adı verilen Ci-



Cihanbeyli aşireti sabık kaymakamı Alişan beyin bir kazada istihdami ile iltiması, S.1. 1269

hanbeyli ve tevabii aşiretler müslüm defteri. Defter No 3525

Kurdî: *Di vê defterê da hetanî sala-1851an li Heymane- Anqara û Ak-saray- Konyayê gundên hatine îşkankirin û li her gundî çiqas mal, malbat û heywan û mîlkê wana hene, ew hatine qeydîkin.*

ML_VRD_d_00355_00001-

Konya ve Ankara sancaklarında mukim Yediboy Aşireti denilen yedi aşiretin kışlakıye adlı vergilerinden Cihanbeyli Aşireti Beyi Kapucıbaşı

Alişan Bey vasıtasıyla tahsil olunan meblağ havi defter.

I_MVL_00208_006723_001_001- H

28.06.1267(1851)

Cihanbeyli aşireti kaymakamı sabık (eski)

Alişan Beyi le Abdulhalim Bey'in sürgün cezalarının affı.

Kurdî: Alişan beg û Abdulhalim beg tèn efu kirin û dîsa ji sirgûniyê tèn welatê xwe.

Atufetli Efendim Hazretleri

Meclis saladan kaleme alınıb evrak-i müteferriasıyla beraber manzur-i âli buyurulmak için takdim kılınan muşaver mazbata maelizzet müstefad olduğu vecihile Cihanbeyli Aşireti kaymamakamı olub tufah nefiy olunmuş olan Alişan Beyi ile Sivasa nefiy olunan Abdulhalim beyin müddeti nefiyleri hayli vakit olarak rütbelerinin refinden ve sair cihetlerden dolayı sayanı merhamet-i seniyye görünmüş olmalarıyla mu-maileyhumanin avfu itlakları için lazım gelen iki kıta fermanı Âli'nin ihzar u tesyar olunmasını (Gönderme) zıkr kılınmış ise de.....herne vecihle irade-i seniyye Hazret-i Padişah-i muteallik ve şeref şudur buyurulur ise a'ne göre hareket olunacağı beyanıyla tezkereten senaveri (met-hiylen) terkim kılındı efendim, yazıldı.

Belgename 90 - Sayfa 1- 1269(1853)
Konya-Kirşehir iskan edilmiş Cihanbeyli beyi Alişana 1241 de verilmiş olan Müdürlük ve tacirbaşılığının iptali.

Belgename 89 : 126.62,

H03.02.1269(1853)

Cihanbeyli Aşireti Kaymakamı sabıki Alişan Ağa'nın bir kaymakamlıkta istihdam edilmesi.

A-MKT-NZD-00069-00054-001-

001-Alişan beyin Erzincan kaza

müdürlüğüne tayini-

Fi Receb Sene 1269

(09.03.1269/1853

Maliye Nazırına,

Arzuhalimdir ki müdir Mustafa Ağa'nın vuku-u vekatine mebni mezkur müdürlükle mahsus olan 2500 kuruş

maaşa i-ta ra merkez adet ve tahsili

icrası **Cihanbeyli aşireti Kaymakamı**

sabık Osmanlı beyin tayini

meclis-i valade tensib ve fetvayı Ali'yeden istihdam olarak irade-i se-

niyye Hazreti Padişah Efemtime ol

merkezden mutallik ve şeref şudur

buyurulup mantuk-u âliye üzerine

keyfiyeten arzum var ise Humayun-u

şerif Hazretlerine bildirilmiş olmağ-

la hazinece iktiza-yi icrasına ehem-

miyet ile işbu ferman-i Âli Kalem

Belgename: 218.98, H 12.04.1272(1856)

Cihanbeyli Aşireti sabık Kaymakamı ve **Erzincan kaza müdürü Alişan Bey**'in Bazergan Aleksioğlu Yorgi'ye olan borcu.

Belgename: 133.19, H 02.05.1275(1859)

Amasyalı Mehmet Bey'in Erzincan esbak (eski) müdürü Alişan

Bey'deki vekil harçlık hizmetinden dolayı olan alacağının oğlu Cihan-

beyli Aşireti müdürü Ömer bey'den tahsil edilmesi.

Belgename: 145.41, H27.10.1278(1862)

Cihanbeyli Aşireti Müdürü Ahmed

Ağanın yerine **Ömer Bey'in** tayini.

Belgename: 430.28, H 03.02.1280(1864)

Cihanbeyli Aşireti'nin Ankara'ya ilhakını isteyen Ahmed Bey ve sairenin arzuhalı.

Belgename: 444.125, H 18.01.1281

(1865)

Cihanbeyli Aşiretinden Hacı Halil

oğlu Ömer'in duçar olduğu bir şe-

naedden tahlislerini isteyen Konya

valisine emirname irsali.

Belgename: 696.42, H 20.11.1281(1865)

Rışvan Aşireti Müdürü Mustafa ve

Cihanbeyli Aşiretinden Ömer Bey

taraflarından Ankara Eyaletince o-

lan irtibatlarının feshi hususuna dair

Hüdavendigar (Bursa) mutasarrıfı-

nın şukkası.

Kurdi: Bi vê nivîsê herdu mîrên mezin yên kurdan li navçeyê, Mudirî Reşîyan Mustafa beg û yê Canbegan Ömer beg ji kar tèn dîrxistin û têkiliya wan bi wîlayeta Enqerê va tê qutkirin.

Belgename 86: 545.10, H03.06.1283 (1868)

Cihanbeyli Aşireti hanedanından Alişan Beyzade Ömer bey'in bir kaza müdürlüğü ile kayırılması.

Kurdî: 3 sal li dû jikardîrxistina Alişanzade Ömer begê dewlet dîsa karekî li midûriyeta qezayekê dide wî. Yanê naxwaze bira ew ji dewletê dîr bikeve û maxdur be!

Belgename: 6.103, H 11.11.1300 (1884)
Konya Cihanbeyli'deki mir Aşireti reisi müteveffa (vefat etmiş) Alişan Bey'in uhdesindeki ağnam tacirliğinin iptal edilmesi üzerine, yeniden kendilerine verilmesi hususunda Cihanbeyli tüccarlarının arzı.

Belgename: 1502.45, H 08.08.1305 (1889)

Tamamen Ankara vilayetine bağlı olan Cihanbeyli Aşireti'nin bazı köylerinin Konya Vilayetine bağlandığı.
Kurdî: Sala 1889an da hin gundên Canbegan li Enqerê bi wîlayeta Konyayê va tèn girêdan.

Belgename: 1180.20, H 23.05.1325 (1909)

Cihanbeylide hükümet dairesi olması için binasını bağışlayan Alişan Beyzade Derviş Bey'in Mecidi Nişanı ile taltif talebi.

Kurdî: Di 1909an da piştî Cihanbeyli dibe navenda hukumatê, Alişanzade Derviş beg avahîyeka xwe ji bo naven-da rêvebirîya hukumatê dibaxşîne.

Li gor van belgenameyên li jor me weşandine, têkiliyên Alişanzadeyan bi dewleta Osmanî va wekîna bûye:

1741an da Canbeg û hîn êlên din ji bo Rakkayê şandine, mecbûrî îskan kirine, yên ji wir reviyane jî di bin îdara Alişan beg da şandine sancaxa Ankarayê. 1763an da di fermanekê da qala tanzîmdanîna kurdên dorberî Anatoliyê tê kirin ku dîsa Alişan beg li ser wan bûye.

Bi vê jî em dizanin ku kurd hên li dû Anatoliyê ne!

1813an da li Kengirîyê (Çankiri) qala eşqiyatiya Alişan begekî têkirin, ku ew jî kurdê canbegî bûye. Le em nizanin gelo ew Alişan ji malbata Alişanzadeyan e, yan na.

1813an da qala Alişanzade Halil beg tê kirin ku wek begê Canbegan li hemberi teterên ku li Anatoliyê ji

ber herbê koçber bûne û reviyane, wî neheqî kiriye.

Dîsa di sala 1815an da qala neheqîya Alîşan begê li hemberî kurdên Şêxbezenî tê kirin. Em ji wê têderdixin ku Alîşan beg hîn li ser mîrîtiyê ye û kurî wî Xelil beg jî li hêla wî mîrîti dikirîye.

1825an da dewleta Osmanî xwestî Alîşanzadeyan dîsa bişînin we-latê wan î berê, Xarput ê, lê ji bona ew serhildanên Têrîkiyan bişkinin û di vir da alîkarê dewletê bin, ew nehastine şandin.

1828an da wek mirê canbegan nave Mustafa beg û apê wî Ömer beg derbas dibe. Ew ji ber neheqîyekê ji bo TOLCI yê tîrî sirgûnkirin.

Gelo ji malbatê her mîr ji bo dewletê wek mîr bû û kar dikir?

Lê di sala 1830an da em dîsa di belgeyekê da qala Alîşan begê dibînin. Wî ji padişahê osmanî re peşniyar kiriye ku kurdên Rêşî ne li Siwas ê, baştir e li Konyayê bîne îskankirin.

1853an da mîrîti û serbazîrganîya li sancaxa Konya û Qirşehir ku di sala 1841an da dane mîrê Canbegên Alîşan begê, cardin hatiye tesdîkkirin. 1842an da xwesteka îhaleya zozanan ya mîrê canbegan Alîşan begê heye.

1843an da deynê mîrî berê ye Canbegan Ömer begê ji varîsên wî tê

xwestin. Ew bi piranî dibe, eger mîrek bimire yan jî ji kar bê dûrxistin.

1843an da xelata Îstablîyê ya Amîrê Payeyîyê nîşan didin Alîşan begê. Ew xelat ji bo kesên ku ji Seraya Osmanî re hespan xwedî dikin, dihate dayîn.

02/1844an da Alîşan beg ji kar tê dûrxistin û li şûna wî dîsa 10/1844da Alîşan begekî nû tayîn dikin. Bi ya me ew Alîşan begê 2ya ye. Ji ber ku ew hîn 15 salî bûye.

Li gor malbatê, Alîşan beg ji hêla Kumara begê Emirdaxê ye, di şerekî da hatiye kuştin û Alîşan begî 2ya kurê Xelil begê bûye û wî heyfa Alîşan begê mezin hilgirtiye.

Lê em di arşîvan da tu qala vê kuştinê nehatin.

1845an da Alîşan beg ji bo îskana Canbeg û êlên bi wan va girêdayi, serî li dewleta Osmanî dixê.

1847an da di belgeyekê da qala Huseyin begekî tê kirin ku ew wekilê Alîşan begê bûye.

Dîsa di wê salê da êla Turkmenên Geygel (Keykil) gilî dike û naxwaze di bin îdara kurdên Canbegî da bimînin û li ser vê ew li Bilecikê tîrî bi şûnkirin û serokê êla wan jî dibe midûrê êlê.

1849an da Alîşan beg serî li serayê dixîne û dixwaze li Dersaadetê bê

şûnkin. Ji ber ku berpirsyarî îşkana kurdan Halim begê gendeli û neheqî li hemberî wî kirine.

1850an da li hemberî Alişan beg û Halim begê, ji bo ku wana ji kurdên Reşî ji bo iskan kirine ruşwet xwarine, gendeli kirine, lêpîrsîn çêdibe.

Li dû vê jî ew herdu ji kar tên dûrxistin û tên sirgûnkin.

Li şûna Alişan begê Kapucubaşî Ali Aga wek Qaymaqam tê şandin. Kapucubaşî rasterast ji Padişah emrê xwe hildigre. Ji ber ku navê wî jî Ali ye, ew di dîrokê da hîn cara li ba lêkolînavan bi Alişan begê va tên tevlihevkirin. 1851an da îhaleya berhevkirina baca (vergi) heywanên êlên kurd û turkmenan didin qaymaqam Riza begê.

Bi vê jî em pê dizanin ku hendu sultanên Osmanîyan hewcedariya xwe bi Alişan began nemaye û ew ji kar dûrxistine. Yanê dewrek ji bo îdara kurdan derbas dibe û dewreka nû vedibe. 1850an da kurdên ku hatine îskankirin tên hêjmartin û mal milkên wan tên qeydkirin.

Em li vir vê bînin bîra xwendevanan: Li Kurdistanê jî mîrîtiya kurdan ya herî dawîn ya Bedirxaniyan di sala 1847an da bi dawî tê û tê hilweşandin.

Bêguman ew bûyerana bi hev ra girêdayî ne! 1851da Alişan beg ji

sirgûnê tê efûkin. 1853da Alişan beg wek Kaymaqamê Erzincanê tê tayînkirin.

Yanê dewlet dev ji merivên xwe î baş bernade!

1859an da deynê Alişan begê ji lawî wî Ömer begê tê xwestin. Em ji vê derdixînin ku ew hendu tunneye, çûye rehma Xwedê.

Li ser gorna wî ya li ber camîya Çeltika Konyayê, sala mirina wî 1857 dinivise.

1862an da Hacı Halil oxlu Ömer beg midûrê Canbeganê tê tayînkirin. Berê navî wan Mîr bû, li piştî sala 1850yî ew wek midûr tên binavkin.


1865an da Ömer beg û midûr Reşîyan Mustafa beg ji kar tên dûrxistin. 1868an da Ömer beg di sala wek midûr ji bo qezayekê tê tavsiyekirin.

1874an da qiran û xelayeka mezin li Ankarayê û dorberê dibe. Ji %90 pez û nivî meriv ji ber nexweşî û birçîna dimirin. Ew him hêjmara kurdan kêmtir dike, him jî pir kes ji Ankarayê direvin derên din, êl û malbat belav dibin, hêza wan li navçeyê qels dibe.

1889an da hin ji canbegên ku di bin îdara wîlayeta Ankarayê da bûne, bi wîlayeta Konyayê va tên girêdan.

1893an da hêjmara kurdan di sala wek qeydkirin. Vê carê bi zav û zêcan va.

1909an da Alişanzade Dervîş beg



Cihanbeyli aşireti beylerinden Alişanzade hanedannından
Ömer beyin bir kaza müd. ile kayırlması. s.1 1283

li Cihanbeyliyê avahîyekê dibexşîne
navenda hukumatê, ji bo vê Nişana
Mecidî didin wî.

Li gor malbatê ew Dervîş beg li
Stenbolê jî millkê malbatê li Fenerba-
hçe û Çirpici çayirî û dîsa li Ankarayê
jî hin deran dibexşîne dewletê.

Li piştî avabûna Komara Tirkîyê
jî ji malbatê hin kes li Afyonê bûne
wekîl.

Bi piranî malbat îro kurdûna xwe
qebûl nake. Herçi qas zewacên wana
hîn bi kurdan va jî bin.

Paşnava Alişanzadeyan li Konya
Çeltikê Kökten e, li gundê Uzunbey-
li- Polatliyê malbata Özalpa jî dibêjin
em jî Alişanzade ne, lê ew ji xwe ra
kurd dibêjin.

Çavkani: Başbakanlık Osmanlı Arşivleri (BAO)

Kurmancên Çankiriyê/Zeyvelîyê

Ji devî **Firat Karakuş**

Wergera ji tirkî û amadekar: **Dr. Mikailî**

Li gor mezinên me, em ji Meletyê hatine Heymanê û ji wir jî hatine Çankiriyê. Li Heymanê çiqas mane, em nizanin. Diwêjin gayê me westîyane ji bo wê ji me ra **Go(Ga) westî** diwêjin.

Begî êla me, kalê min Ahmet begê em hilgirtine anîne Çorum Bayatê. Navî şûna ku lê mane ZEYVE ye. Qişle jî digotinê. Dûra kirin KURUÇAY, lê di nav xelkê da wek Qişle tê zanîn. Nika navî xwe yî resmî **Çamligüney** e. Tenê li vir ava şîrîn hebûye, boyî vê li vir bi cih bûne. Alîyê bakur va piştî xwe dane çîyan, ji vir ber bi Çankiriyê Ilgaz dağları, Kastamonu Tosya û derketine yayleyan. Li van derana mal çenekirine, di konan da mane. Zivistanan dihatine Qişlê.

Li ser rêya çûyîn hatinê da ji xwe ra li cîyêkî hertim bimînin mêze kirine û li vir mane, xanî çêkirine. Piranî ji pezî xwe ra **hevşo** çêkirine. Bi mal, şivan û malbatên xwe va gî tevhev li vira dimane.

Dûra di serî sedsala 1800î da li hêla çemî (Ro, rûbar bi kurdiya

Şêxbezeynî da nehir) Qizilirmakê bi cih bûne û gund ava kirine. Hindik hindik dest bi rakirina erd û zevîyan jî kirine, tenê ji bo hewcetên xwe cotkarî kirine. Ji bo cotkariyê ji turkmenên serî çiyayan dijîn, kes anîne û dane karkirin, şuxulandin. Ew pir fiqare bûne, bi ziktêrbûne ji kurmancan ra kar kirine. Ême ji vana ra digotin xizimkor (xizmetkar?).

Ji ber ku hertim koç dikirine, heta van 30 salên doyê qe sewze, darber nedireşandine. Debara xwe bi pêz û naxirê dikirine.

Sewze û mêwe ji gundîyên çîyayî dikirine. Bi piranî tiştên hişk, weka nok, nîsk û lobî dixwarine. Veşartina tiştan bi zehmet bûye. Bo wê rûn, penêr bi xwe çedikirine û di bin erdê da vedişartine. Şert û merc wêngê wekîna bûye.

Wexta begî eşîrê/êlê Ahmet beg li Qişlê dimire, li şûna wî lawê xwe Mehmet dibe beg. Berî mirina xwe di navbera wan û Şiroxlu begê da nîza derdikeve. Şiroxlîyan ji wir surgun dîkin, ew jî nika li gundî GEWERAN ya girêdayî navenda

ÇANKIRIyê ye dimînin. Ji vê malbata Şiroxlu ra KOTAN dibêjin û malbateka pir mezin e. Di nav qebîla Şiroxlu da jî nîza derdikeve û birik ji wana derbasî alîyê din î Qizilirmakê dibin û li wir du gundan ava dikin. Navê wan gundên **Aşayış** û **Kalenderoglu** ye. Dîsa gundrki Çorum Sungurluyê jî ji Şiroxluyan e û navî xwe **Taybılı** ye. Ji van her 3 gundana ra Kalenderoxlu dibêjin.

Dîsa li du vê jî ji malbatê çend kes cîhê dibin û derbasi alî din ya Qizilirmakê dibin û li wir gundi Bû-yûkbahçeli çêdikin. Ew girêdayî qeza Qizilirmaka Çankiriyê ye. Dengbêj OLKI MIXTIR(Elikê Mixtêr) ji vir e. Ji mala vana ra Molo Bako (Mala Beko) dibêjin.

Ahmet beg 4 lawên xwe hebûne, Mom (Mehmet beg), Oli (Ali), Us (Yusuf), Sotto(Sato). Vana gundi min **ÇIRCİRÊ** ava dikin.

Çend sal şunva Soto malbata xwe va li hêla Qizilirmakê gundi KAPAKLI çêdikin.

Wexta derketin yayla ew malbat û gund dîsa gî berhev dibin û bi hev ra terin yaylê. Li yaylê jî şûna wana gî li hêla hev bûne. Li wir konên xwe vedidin. Ew hetanî 1924an wekîna dajo.

Di wexta şoreşa şewqa/serpûşî

ya M. Kemal da, rokê M. Kemal tê Kastamonuyê û di rê da rastî koma kurdên ku terine yaylê, tê. Ji walî dipirse, ka vana kî ne. Ew jî diwêje, ew kurd in û terin yaylê. Atatürk dibêje ka ji min ra ban begî vana bike. Ban Mehmet begê dikin, ew bi tenê bi Atatürk va dikevin xanîkî, kes nîza ne wana di hundir da li ser çi deng kirine.

Le ku Mehmet beg dîsa tê nav eşîretê, ji wan ra diwêje, ka kê çiqas zêr û zîvê xwe hene bînin. Atatürk wana dixwaze.

Ew du heqibeyan tiji dike û tere wana dide Mustafa Kemal. M. Kemal bi vê pir şa dibe û ji wî ra dibêje:

Bira navî te ji vê şuva bibe Hecî beg!

Ev unvana min daye te! Û şûr û gelteka biçûk jî wek xelat dide Mehmet begê. Mehmet beg bi meriyê xwe va bi serbilindiyekê dîsa çex dibê û tê nav eşîretê.

Li dû wî Atatürk ji walîyê Kastamonuyê ra xeberê dişîne û dibêje: Ji vê şûnva derketina kurdan ya yaylê (zozan) ra musade neke!

Walî li ser vê derketinê qedexê datîne û ew jî dest bi cotkarîyê dikin.

Hecî beg nêzikî Qizilirmakê ji xwe ra ji bo cotkarîyê çiftlixekê çêdike. Navî vira hîn jî Hacibey Çiftliği ye.

Hema li hêla gundî Çirçirê gundê **Kürt İsmail Aga (Kuzuköy)** û dîsa nêzikî royî Qizilirmakê **Bayanpınar** û li hêla wan **Karadibek** ava dibe. Li hêla gundî Geweran(Altınli) **Göncüoglu** çêdibe. Ji Göncüoglu jî kesekî bi navî Aliosman cihê dibe û girêdayî qeza Qizilirmakê gundî **Küçükbahçeli** ava dike.

Dîsa di navbera Qışle û Çirçirê da **Taytak(Yeşilyurt)**, **Karaciceli**, **Kazbekir**, **Haciömer**, **Ağzibüyük**, **Mollamehmet** ava dibin.

Va gundana giştik ji eşîretê ne û gî meriyên hevdu ne. Ew bi kurdiya kurmançî, devoka canbegîyan deng dikin û sunnî hanefî ne.

Ji wana bêtir **Başçoban**, **Danabaş**, **Yeniyapan** û **Sarimehmet** jî ava dibe. Gundê herî cara siftê ava bûye, Qışle ye. Li alî dinê Qizilirmakê gundên girêdayî Çorum, Sungurluyê hene: Taybi, Asayiş û Kalenderoglu.

1992 ji rojnameyeka kurdan roj-namevanek hat û bi kesekî 105salî va hevpeyvîn çêkir. Wî kalemêrî digot ku em hatin vira 700-800 kon bûn, musulman û kurmanç in û ji Meletyê hatine.

Ez li dû vê çûm aliyê Ilgazê, li gundekî bûm mîvan û min ji wana pirs kir: ka berê kurd ji wir, di kîjan rêyê da diçûne yaylê?

Yekî kal got ew ji va çiyayên bilind da derbas dibûn, rêya wan ya yaylê ew bû. Ew çiyana ber bi Çorum Bayatê va terin. Ji min ra got eger tu derketî wir, tu ê rêya wan bibînî. Li hêla rê herdu alîyan gî mezelê kurdan e. Li dora 1800an ew bi nexwaşiyê ketine û gî li vir qir bûne. Ji bo vê çend salan ew nehatine yaylayan.

Di herba Koreyê da jî ji me pir kes birine û piraniya wana di herbê da mirine û hejmara me li vira kêmbûye. Ji ber ku pir jin bî, pir zaro ji sêwî mane, zewacên di navmalî da zêde bûne. Ew edeteka kurda ya berê ye.

Ji boyî wê meritîyên me yê kevn pir tevlihev e. Meri nikare ji nav derkeve.

Di serî sala 2000an da ez li Akyurta Ankarayê dimam û ji bo rojnameyekê dinivîsî. Qaymaqamîk ji Meletyê hat. Wî li ser Meletyê kitêbek ji nivîsandibû. Rokê me bi wî va deng dikir. Min qala hatina me ya ji Meletyê û gundê me î herî kevn Kuruçayê kir. Wî got li Meletyê jî Kuruçay heye û hûn ji ber îsyaneke hatine surgunkirin. Di wexta Yavuz Sultan Selim da ew bûye. Ji bo wê eşîretên we û elewî navî Yavuz li zaro xwe nakin. Got hûn pêşta hatine Adanayê, ji wir Maraş, Adiyaman û ji

wir jî hatine Polatli, Heymanê. Dibe ku hûn Drêjan bin.

Min got em sunnî musluman in, lê em pir li ser dîn nasekinin, pir nimêjê jî nakin, eceba em jî elewî ne?

Qaymaqam got: na hûn sunnî ne. Li gor qaymaqam Hz Eli bi xwe jî kesayetêki turkmen e, ji bo wê kesên elewî giştik turkmen in!

(Not: Qaymaqam li vir hinkî nezantî kiriye.)

Min got dibe ku em ermenî bin?

Qaymaqam got: na hûn sedîsed kurd, musluman û sunnî ne û nexwast hîn zêde ji min ra tiştan biwêje, digot ew sirrên dewletê ne, ez nikarim hertiştî ji we ra qal kim.

Şênayîya pezî yoz

Doya zivîstanê, ku zemherî derbas bûn, xortên gund berhev dibûn li gund û gundî dorberê digeriyan, rûnê kal, bulxur top dikirin. Bi vê jî bêyî ku avê tevê kin, zad çêdikirin û bi hev ra dixwarin, dilîştin.

Daweta da govend dihat kişandin û bi şev ar vêdixistin û li dorê **sîng sîng** dilîştin. Di dora êr ra çex dibûn û ji hev meydana dixwastin.

Lîstika Deve/Hêştir

Şeva doya dawetê bi hin tiştan wek deve, hêştir çêdikirin, du mêran kincên jinan li xwe dikirin. Li ber vana jî kesekî jê ra **Kose** digotin hebû. Rû bi kose va dikirin û dikirin delqa mê-

rekî kal. Kose bi deve û jina xwe va tev li dawetê dibû û xortên gund dixwastin jina Kose birevînin û bi vî awayî çîn derdixistin û pê dawet şên dikirin.

Yek caran Kose bi ser xwe va diçû û keçik jî di ser kose da digiriyan û şîn dikir. Di vê listikê da Kose û jina wî weka tirk nîşan dikirin. Yanê gundî bi tirkan dikeniyen.

(Not: Li aliyê Serhadê jî listika **Kosegeli** heye.)

Ku xwedanî dawetê yekî dewletî be, ji gundî dorê jî kes dihatin û cirît dilîstin. Di sala 1965an da li gundî Çirçir daweta Caferî Oskî Olî(Eli) Çawuş wekîna bi şuret bû û heta du hefteyan ajot.

Kincên keç, bûk û jinan

Heta salên 1970yî sêdawî, di ser da qutnî kiras li xwe dikirin, li navê pêşmal girê didan. Ji bo girêdana pêşmalê jinan bi xwe di tevnê da bi qalingîya du tilîyan benek dihûnandin. Ew çîn bi çîn bû. Navî vê **keji** bû. Di ser wê da jî dîsa 25 sentim biber piştîyek girê didan û jinan kêr, şe, neynikên xwe dikirin bin vê.

Sergirêdan

Şarpe û kitan didan serî xwe, dîsa kofî girê didan û bi rengên sor, zer û sipî bi kesmukan dixemilandin. Di rojên taybet da qorek zêr zîv bi ser enîya xwe da berdidan. Di ser fes da

jî dîsa kitaneka sipî girêdîdan. Jinan
gîştikan li ser enî, çeng û gepên xwe
da **deqe** xwe hebûn.

Navên jinan

Ayş, Fottê, Siltan, Zelxê, Axxê, Kêzê,
Gawrê, Xayçe, Done, Adul, Xacê hin
ji van navan e.

Navên mêran

Mammo Hammo, Mişto, Haso,
Husso, Osso, Sato, Xallo hin ji van
navan e.

Jinan dua xwe bi kurmançî va
tevlîhev dikirin û dixwandin.

Bawerîyên ji dervayî îslamîyetê

Jin oxira mêrên ji 10salîyê mezin-
tir nabirin.

Di bin eşîka dêrî da dawestî gune
ye.

Ser kulîka da gerran bi gune ye.

Cin, perî û buzmacîk hebû. Di-
gotin em nabînin, lê ew bi xortan va
dizewicin û bi van va di şûnên talde
da radikevin.

Buzmacîk

Ew li ser rêya gundan, di newalan da
derdiket pêşîya meriyan, erebe giran
dibûn, meriyan nedikarî ji şûna xwe
bileqe yan jî bireve. Xelk jî vê pir ditir-
siyan.

Çend mînak ji kurmançîya me:

Jinka min, jina min, bermalya min
Mêrke min, mêre min

Jin û mêr wek *lo û lê* bang hev di-
kin.

Bre min: erkeke kardeşim

Xuşk: Kızkardeş

Xali: toprak

Kompîr: Patates

Ji qalkirina Rîfat Karakuş em jê
derdixin ku ew Zîvelî/Zeyvelî ne û
girêdayî Canbegan e. Di arşîvan da
jî navên wan derbas dibin.

Gundê navenda Çankiriyê

Kuzuköy/Kürt İsmail

Altınlı/Geweran

Yeşilyurt/Taytak

Danabaşı

Sarımehmet

Ağzıbüyük

Molla Mehmet

Hacıömer

Çırçır

Gundên qeza Qizilirmakê

Bayanpınar

Büyükbahçeli

Kapaklı

Karadibek

Yeniyapan

Gazibekir

Küçükbahçeli

Çend gotinên ji kurmancîya me

Mehtab Îdelî

Zimanê kurdî, zimanekî ji şaxa zimanên Îranî yê bakûrê rojavayê, malbata zimanên hind û ewropî ye. Piraniya gelên Kurdiştanê bi vî zimanî diaxivin û ev zimanê sereke yê kurdan e.

Kurdî navên xwemalî: Kurmancî (kurmancîya jorîn, bahdînî), soranî (kurdî, kurmancîya jêrîn), kurdîya jêrîn (kurdî xwarig, pehlewani), goranî (hewremani), kirmanckî, dimilkî, kirdkî û lekî.

Welatên lê zimanê kurdî tê axaftin: Tirkîye, Îran (weke zimanê heremî), Îraq (fermî), Sûrî, Ermenistan, Azerbeycan, Gurcistan, Îsraêl, Asyaya Navendî dîyasporaya kurdan de.

Herem: Kurdistan, Anatolîya Navîn, Xorasan, Asyaya Navendî.

Axiverên zimanê zikmakî: Hejmara fermî nayê zanîn, lê li gor çend çavkanîyan hejmarke di navbera 35.000.000 û 40.000.000 da tê hesabandin.

Malbata zimanî: Zimanên hind û ewropî, zimanên hind û îranî, zimanên îranî, zimanên îranî yên rojava, zimanên îranî yên bakûr-rojava, kurdî.

Şiklê kevn: kurtî, medî, arşakî, Zimanê kurdî.

Zarava: Kurmancî, soranî, kurdîya jêrîn, zazakî, hewramî.

Sistema nivisê ya alfabeyên kurdî: Alfabeya latînî li Tirkîye, Azerbeycan, Sûrî, û Ermenistanê.

Alfabeya erebî li Iraq û Îran.

Di zimanê kurdî da jî wekî hemû zimanên din, zarava û devok hene. Standardî di zimanê niviskî da heye, lê di zimanê devkî da beyî mudaxele û statûya siyasetî, zimanê standart pêk nayê. Ez dixwazim hinekê li ser wê bisekinim û qala çend gotinên di devoka me ya Anatolîya Navîn da bikim.

Alosî kirin: Şelafî kirin.

Mînak: Ji bo xelatekê bigire alosîyê dike.

Amelî pê nebûn: Ne dîyarbûna tevgerîna kesekî.

Mînak: Amelî bi Husê nabe, ku kengî çi bike.

Awnî/awênî kirin/dayîn: Teselî kirin, aş kirin.

Mînak: Cîrana me birayê xwe mirî bû,
em çûnî mala wan, me awnîyek da wê.

Bajar kirin/bajarê xwe kirin:

Danûstandin

Mînak: Berî dawetê em çûn, me
bajarê bûkê kir.

**Bazara (bizarê)wê/wî/wan/
filankasî:** Wekî wê/wî/wan got.

Mînak: Bazara mêrik gotî, va dil e, qê
ne kevçiyê ber bulxur e.

Bergînî/ berginî çûyîn/kirin:

Pêşwazî kirin.

Mînak: Rûşpîyên gund berginî li
mêvanan kirin.

Bênemaz izûrî: Jê ra li bahaneyan
gerîn.

Mînak: Yê bênemaz izûrîyan dike,
derew in.

Bi ber ketin: Heyfa xwe lê hatin, dil
pê şewitîn.

Mînak: Dema min bihişt hevalan
qeza kirine, ez pir bi ber ketim.

Bi ber xwe ketin: Ji xwe fedî kirin,
an ketina fîkr û ramanan.

Mînak: Ez îro pir bi ber xwe ketim,
ku min alikariya Memo nekir.

Bi derî ketin: Rê li berê girtin, pêşî
lê girtin, rê lê girtin.

Mînak: Dijmin bi deriyê wan ketin,
nehiştin ma ew di herêma xwe
bigihîjin.

Çav qirkirin: Çavneqandin, çav
qirpandin.

Mînak: Elî çavê xwe ji Rûkenê ra qir
kir ku ma ew wî ferq bike.

Çî te ketîye: Ji te ra çîye, te çî jê ye.

Mînak: Çî te ketîye, ez çî dikim.

Çî ye xerse (Heger) ew e: Heger çî
ye ew e.

Mînak: Çî ye xerse ew e, tu çima
pirsgirêkan derdixî.

Debax jê birîn: Aciz kirin,
qutifandin.

Mînak: Dema zarok bûm, mêvanên
mala bavê min debax ji me dibirin.

Dezge bi ber xîstin: Rêbazê rê,
fend, dek û dolap bi ber xîstin.

Mînak: Dîsa hevala te çî dezge bi ber
te xîstin, tu me aciz dikî.

Di cîh da şikenandin: Fikira xwe
guherîn, xwe badan.

Mînak: Ramo bihişt ku dora çûyîna
ber berxa li wî ye, di cîh da şikenand,
berve çolê çû.

Deziye dil qetîn: Ziravekê xwe
bizdî, tirsîn.

Mînak: Tu çima ji nişka ve derketî, te
deziyê dilî min qetand.

Didan feliqîn: Diran weşî.

Mînak: Dema zarok bûm, didanên
min jî wekî hemû zarokan feliqîn.

Di xwe derxistin/ di xwe anîn

derê: Hay jê hebûn, hay ji xwe hebûn.

Mînak: Te niha di xwe derxist, ku te çî kir.

Dore din a rê: Dotira rojê.

Mînak: Zewo du roj berê çûbû bajêr, dora din a rê hate mal e.

Êfa xwe heynan: Tola xwe rakirin/ heyfa xwe hilanîn.

Mînak: Eşê çikir, nekir êfa xwe ji Husê heyna.

Êfen derbas bûyîn: Sivik derbas bûn.

Mînak: Zivîştan îsal êfen derbas bû.

Mînak: Colo nexweşî êfen derbas kir.

Êncik sist bûn: Sist bûn, nerm bûn.

Mînak: Gava Gilgil keçikeke xweşik didît, êncik lê sist dibûn.

Firîna avê a kizîyê: Pekîna avê a zengilokê.

Mînak: Dema min av vexwar, ji nişka ve av firîya kizîya min.

Gir/gir berdan: Rikîn/rika xwe dan (yekî).

Mînak: Girê xwe berdaye min.

Gidarî kirin/gudarî kirin: Pan, li bendê, li hêviyê man/ bûn.

Mînak: Li sûkê gidarî min bikin, ez ê tême.

Gotir kirin: Beytîn, nûrîn.

Mînak: Ez ê edî vê jîyanê gotir nakime.

Hal hekatên te/min/wî/wê çî ne:

Rewş û meselên te/min/wê/wî çî ne?

Mînak: Hal hekêtên te çî ne, bi min ra bêje.

Hemêl kirin: Hembêz kirin, pêşwazî kirin.

Mînak: Dema lawikê Nurê ji Enqerê hat, çing dît wê ew hemêl kir.

Hemerî bûn/ kirin: Li hemberî tiştêkî an bûyerekê meşt bûn.

Mînak: Hinarkên wê mîna sêvên payizê sor, mirov li hember xwe hemerî dikirin.

Heşyarî xwe bûyîn: Ji xwe hesî bûyîn, bi xwe hatin.

Mînak: Bi ser gotinên wê ve Hesên heşyarî xwe bû.

Hewayê bongîye: Hewayê girtî, tarî bûyîn.

Mînak: Ji ber hewayê, roj xûya nayê.

Hevlî daxistin: Xirecir, şemate, hawar.

Mînak: Dîtî ku, mala cîranan dişewite, cîranan hevlî daxistin.

Hewayê li hev ketiye: Ewr û esman li ber lêkirinê bûyîn.

Mînak: Hewayê li hev ketiye, baranê wê bibare.

Hewînî pê anîn: Ewîqîn, xwe mijûl kirin.

Mînak: Pêlistanekê bidin kurik, ma hewînîya xwe pê were.

Heyamî xweş e: Xweşbûna hewayê.

Mînak: Heyamî îro pir xweş e, em dikarin herin seyran ê.

Hing jê derxiştin: Ji hev da xiştin, ji hev belawela kirin, hûr xaş kirin.

Mînak: Bela xwe tê dan, hing ji Seyfo derxiştin.

Huzbe kişandin/ajotin: Kîn ajotin, rik girtin.

Mînak: Ew î pir huzbê dikşîne, xwedê kesekî neke dijminê wî.

Imayî bûn: Korebûn.

Mînak: Tu imayî bibî mêro!

Îzbend kirin: Veqatandina pez,berx yan kavirên jar yên ji çê. Ji bo tiştên din û ji bo insanan jî tê bikaranîn.

Mînak 1: Tucarên dihatin gundan û dixwaştin pez, berx yan kaviran biştînin, wan berê ew îzbend dikirin û dû ra diştandin.

Mînak 2: Min li bazarê bacanên sor sifê îzbend kirin dû ra şandin.

Mînak 3: Bi saya pere de yên îzbend hemû bûn meriv.

Jê ve xuya kirin: Eyan bûyîn.

Mînak: Dîsa jê ve xuya kiriye, serê xwe hilaniye û diçe.

Ji ênga da ketin: Ji hal da ketin.

Mînak: Ez îro ji bo ku pir meşiyam, ji ênga da ketim.

Ji min berê: Min wîsa hesiband, zan kir.

Mînak: Ji min berê, ew jî wê bi me ra werê mala me.

Ji nêza/nêzan mirin: Ji birçîna mirin.

Mînak: Sibêh pê da min tiştêk nexwarîye, ji ber wê ez nêza mirim.

Ji rû hev de ketin: Navber xerab bûyîn, ji hev xeydan bûyîn, ji hev dilsar bûn, nava (wan) neman.

Mînak: Bi dergistê xwe ve ji rû hev de ketine, ez êdî bawer nakim, ku navbera wan xweş bibe.

Ji xwe ve: Dilxwe de, qaşo, qeştî.

Mînak: Ji xwe ve te digot “ez şivanekî baş im”.

Ji xwe xweş bûyîn: Rind, nazenîn, bikok.

Mînak: Ew keçîka ê ji xwe pir xweş e.

Kat kirin: Gotin/vebêjîn

Mînak: Colo çi kirîye, dayika xwe dû ra her tişt jê ra yekûyek kat kir.

Ketina aha: Di liştikên zarokan da dora koma cezakirî.

Mînak: Me dora xwe kir, niha dora we ya ketina aha ye.

Ketina rû: Egle bûn.

Mînak: Min bihişt wî dil girtîye, hinekê ketime rû.

Kêm bûyîn: Wê de, biqêşite, hilbe ji vir.

Mînak: Kêm bibe here, tu çima me aciz dikî?

Kûçîk hatin/ tîn min/ te/ wî/ wê: Kûçîkan êrîşî min kirin. Se bi min da hewtîyan.

Mînak: Kûçîk ji nişka ve hatin min, ji tîrsa ziravê min qetîya.

Kûçîk lêketin: Ewtîna seya, ewtîna kûtîyan.

Mînak: Dema kûçîk lêketin, ez bizdîyam.

Lê inirî: Qehirî, xeyidî, harbûyî, hêrs.

Mînak: Lê inirîye, ew edi zor li hev tîn.

Lê persîya bûn: Lê civiyan, li ser kom bûn.

Mînak: Çûçîk hatin lê persîya bûn, pakij kirin.

Lêniştin: Lê sîyar bûn.

Mînak 1: Em li erebê niştin çûn bajêr.

Mînak 2: Tu li hespê niştî ku wa çûyî?

Li dîndarê dawestîn: Li hafa (yekî) rawestîn.

Mînak: Di ber mala me ra mêrek derbas dibû, pirîka min li dîndarê wî dawestî.

Li firîskê xîstin: Fitik lê xîstin, fikandin.

Mînak: Alo him di pê ga dibezî û him jî li firîskê dixîst.

Li xofê çûyîn: Li ecêba min çû, ecêb dîtin.

Mînak: Dema min lawikê wan yê seqet dît, pir xofa min çû.

Li stû niştin: Êrîş kirin, destdirêjî kirin, tecavûz.

Mînak: Berê, gava leşkeran gund zept dikirine, li stûyên jin û keçikan diniştine.

Li şîv xîstin: Bi hev ra şîv xwarin.

Mînak: Îro were mala me, em bihev re li şîv xin.

Lût bûyîn: Gindirîn.

Mînak: Dema erebe wergerî, tekerên xwe her yek bi aliyekê da lût bûn.

Mafqe/ bi mafqa bûyîn: Pîwenîdar, eleqedar. Ji hev ra baş yan bikêr bûn.

Mínak: Ew herduyan jî heval in û bi hev ra pir bi mafqe ne.

Milheze kirin: Şayîş kirin, fikirîn

Mínak: Ji ber sibê ezmûna xwe Zelalê hebû, xewa wê nehat û heta devdevî sibehê milheze dikir.

Mizêç/bi mizêç: Ji bo kesê ku di xwarinê de bijare ra tê gotin

Mínak: Fat îşev mêvana me ye, şalê bi şîvên me qayil be, ê pir bi mizêç e.

Niqutî zikê min: Lê eyan bûn.

Mínak: Niquitî zikê min min got, yê wenda bibe û rojekê şûnva wenda bû.

Oma xewê dayine ser: giran bûn, giranê xewê pê girt.

Mínak: Ez tehmin dikim ku ez westiyame, oma xewê da ser min.

Olken /Ulkan: Ji xwe çûn, ketin edrê.

1. Ulkan li xwe xistin: Ji bo zarok digirîn û pê ra henavan li xwe dixin

Mínak: Ez nizamim keçik çi dixwaze, ji sibê da ulkana li xwe dixê.

2. Ulkanê bûn: Dema (yek) ji xwe derbas dibe û dor xwe nebîne û nebîze.

Mínak: Ka li Elo mêske, deng ê narinê, î ulkanê bûye.

3. Olkenên min rabûn: Dema bûyereka an jî mirin bû (yek) ji xwe

derbas dibe û dixwaze dilê xwe rihet bike.

Mínak: Olkenên min rabûn, ez herim mala şînê hinekê bigîrim û dilê xwe rihet bikim.

Pê aşne bûn: Hay jê hebûn.

Mínak: Beriya ku bizewice pê aşne bûm, lê min nikaribû ku xwe bigihînim.

Pê hatine ser/ kete ser: Qanî bûn, îqna bûn, pê razî bûn.

Mínak: Me ew mesela îşpat kir şûnva, pê hatine ser.

Pê hecîn: Ji pertav ketin.

Mínak1: Heya gotina min fam kir, ez bi hecandim.

Mínak2: Heta dayîka lêwîk hat, ew ji girîya bihecî.

Mínak3: Me zevî diçînî, ava me xelas bû, em ji tîna bihecînî.

Pê ra jar bûyîn: Mirîyê yekî/tîşteki bûyîn, ketîyê yekî, tîşteki bûyîn. Ji kesekî pir hez kirin.

Mínak: Ez ê bi dayîka xwe ra pir jar im.

Qaîle kişandin: Ji xwe ra kirin derd, ketin taya tîşteki.

Mínak: Ez a wî karî îro xelas bikim, tu qaîle mekşîne.

Qebleme kirin: Hema wîsa, bêzanatî.

Mînak: Ji ber ku ew dirûnê nizane,
qebleme didûre.

Qêm kirin: Zexm kirin, pihîtkirin.

Mînak: Min vîda guherînkare bi
tornevîdê qêm kir.

Qirmit kirin: Derman kirin,
pansûman kirin.

Mînak: Pîrika gund, bi xwê û şîrê kelî
kula şewatê qirmit dikir.

Qizik kirin: Heramsûtî kirin,
dekzanî kirin.

Mînak: Berê li gund demê xort lîştika
pênckevir dilîştin, car car li hevdû
qizik dikirine.

Qot hişk bûyin: Qufulin.

Mînak: Dema min meyîte wî dît
qotê min hişk bû.

Raserdan/raserî hev dayîn: Dan
dû hev, gewitandin.

Mînak: Du zarokan li dora malê
raserî hev didan.

Rikinê xwe berdan: Girê xwe pê
xurandin.

Mînak: Mamoşte ji rikinê xwe
berdayê min.

Rucû kirin: Hêvî kirin, hêvî jê kirin.

Mînak: Ez jê rucû dikim, ku ji min ra
dîyarîyekî bîne.

Serî lê gerandin: Dorpêçkirin,
perişan kirin.

Mînak: Tu çima seri lê digerinî,
bihêle çawa xwest ma wer bike.

Soki neketin: Dawî lê nehatin,
neqedîn.

Mînak: Bi jimartinê soki neketin.

Şû kirin: Kanîn, karîn.

Mînak: Min îro şû kir, ezê werim
mala we.

Şûn lê kirin: Bi şûn kirin, xwedî lê
derketin, deşt bi ser ra girtin.

Mînak: Bila ma Reco were ba me,
emê ji wî ra ji elbet şûneki bikin.

Tan kirin: Rû xistin.

Mînak: Jê ra rindî kirîye, ew ji wê her
dem dike tan.

Teme kirin: Qewetî kirin, tembîh
kirin.

Mînak 1: Siftê giliyên bûkê dike, dû ra
ji teme dike ku ma ji bûkê ra nebêje.

Mînak 2: Dema dayika min çû bajêr,
min çend tişt lê teme kirin.

Toqilme lê xistin: Gotin li bin çenê
(yekî) xistin, tehn lê xistin.

Mînak: Xesûya min her dem toqilma
li min dixê.

Ulq teng bûyin: Bêhn lê teng bûn.

Mînak: Ulqê min î teng e, nêzî min
mebe.

Wekî qeda bûyin: Hişyar, çavvekirî,
bihendaz, çavnetirsî.

Mînak: Mamosteyî wekî qeda ye, ew çî dixwaze wê dike.

Xagî kirin: Fîz avêtin, pozbilindî.

Mînak: Xagîyên ku zengîn dikin, tesîra xwe li ser xizanan pir dibe.

Xelmaş bûn: Rewşa navbera xewê û hişyarîyê, ku mirov ne tam di xew da be û na tam hişyar be.

Mînak: Xelmaşî bûbûm, min dengê derî nebihîst.

Xar kirin: Bezîn, bazdan.

Mînak: Ji bo zarok pir xar dikin, dû ra diwestin û xwê didin.

Xwaz pê bûyîn: Bi qencî û bibextî yekî şabûn.

Mînak: Xwaz bi we, zevîyê we îsal çê ne.

Xwe badan: Reva ji ber wezîfeyekê.

Min çiqas jî xwe bada, dîsa jî ez şandim danûstandinê.

Xwedê tevîş bûyîn: Xwadê jê razî be/Xwadê ji te razî be.

Mînak: Xwedê tevîşî te be, ku te alikariya me kir.

Xwezi/i lê miçiqîn: Qirîk zûwa bûn (ji ber tîbûnê an ji ber bêhtengîyê)

Mînak: Heta em di malê gihêştin, xwezi li me miçiqî.

Xiş û xal bûyîn: Bêhal mayîn.

Mînak: Dayika min roja nan lêdixîst bi îşan xiş û xal dibû.

Xulî bûyîn: Hêrs bûn, tûre bûn.

Mînak: Tu çima li min xulî dibî, naha min li te çî kirîye?

Verêkirin: Wendakirin, bibinketin.

Mînak: Haso îro dîsa di lîstika xumarê de verê kir.

Vexwarin: Qezenckirin, biserketin, biserxistin

Mînak: Haso îro jî di lîstika xumarê de pêncsed Frank vexwar.

Ya xwe weng lê anîn: Li gora dilê xwe kirin, li gora kêfa xwe kirin.

Mînak: Çawa xwestîye wer kirîye, wî jî ya xwe weng lê anîye.

Yêkinî xwe kirin: Hemikîn, ji hindav de rabûn, li xwe dan, bilind bûn, hil bûn.

Mînak: Dema bavê wî kete odê, wî yêkinî xwe kir rabû ser xwe.

Zêm/zem kirin: Paş da peyivîn, xeyb kirin.

Mînak: Min bihîst, cîranan di dû min ra dîsa zêma min kirine.

Zikdirî dayîn: Ezîyet dan, zordestî.

Mînak: Zikdirîya dide min, da ku ma ez ji mal derkevim.

Zinaqî bûyîn: Bêzar bûn.

Mînak: Heta tu werî mal, ez zinaqî bûm.

Çavkanî: ku.m.wikipedia.org, WQFerheng

Hêviyên qaçax

Mûlla Evîndar

Kemal li vê zivîstana sar, li darîstanê ku di nav berfê de mayî bitenê ma, rêberê wan û hevalên wî ji aliyê polîs ve hatin girtin, wî xwe di kendalekî de veşart û ji dest jenderme û polîsan filitî. Pir diqelîfî, divê ew zû xwe bavêje derekê, gund yan jî bajarê herî nêzik. Hinek bi rê çû, darîstan bidawî bû, jixwe darîstaneke pir biçûk bû. Li dûr nêrî, ruyê erdê ji berfê sipî bû. Ew hinek din çû, darîstan ma li dû, hêdî hêdî şev bi ser berfa sipî de dihat, ruyê erdê sipî, ruyê esman reş bû, dinya bû reş û sipî.

Li bergeha wî, li dûr xuya bû pencereyek bi îşıqa zer, hundirê Kemal bi wê îşıqa zer germ bû, bi lez heyna gava ber bi wê îşıqê.

Pir nêzik bû, xaniyekî mîna koşk bû, li kêleka xêni ambar, qerej, traqtor, otomobîl, bi sedan darên sêvan hebûn, gişk di bin berfê de bûn. Xuya kir ku ew warê cotkarîyê ye. Di ber xêni re otoban derbas dibû, dirêj û zirav. Wekî din li jor bi hezaran îşıq xuya dibûn, îşıqên bajêr.

Ew ê niha çi bike?

Ew zimanê vî welatî nizane, ew deriyê vî xanî lêxe ew ê bêjê çi?

Pir diqelîfî, hêl û teqat li wî neman, bayekî sar dihat, ambara li hêla xêni dev vekirî bû, wî xwe avête hundirê wir. Ji paca xêni dûman dihat. Sobeya mala wî, çaya ku li ser sobe dikeli, odeya ku bi agir û pêtiya kermeyan germ dibe hat bîra wî, xanim û zarokên wî hatin bîra wî, jixwe ji ber ku ew tî, birçî nebin ji bo şixulê ji welatê xwe, ji gundê xwe yê ku li herêma kurdên Anatolîyê derket hat vî welatê Ewropayê, welatê yadan. Ji niha de bîra warê xwe kir.

Ew ê niha çi bike?

Wî cesaret nekir ku deriyê xêni lêxe, bajar dûr bû, otoban vala bû, hevalên wî, rêberê wî wenda bûn. Rêberê wan gotibû ji darîstan şun de ew dikevin welatê Swîsê, welatê ku lê bi cih bibin, bişixulin. Rêberê wan gotibû li vê sermê li hûdût jenderme û polîs nabin, lê tevî sermê jenderme û polîs hebûn û ew hatin girtin.

Kemal ji ber sermê biryar da ku derî lêxe, lê ji fikra xwe şîva vegeyriya, go: "ez ê çima wan eciz bikim, ne pismam in, ne dotmam in". Bi halê westiyayî xwest li ser êzingekî rûne, lê rûnenişt, dengê hat, xanimêk pence-reya xêni vekir û bi wî re deng dike:

“Monsieur, il fait très froid à l’extérieur, que faites-vous ici? Veuillez entrez”. (Ez benî, heyam pir sar e li der, hûn li wir çi dikin? Kerem kin, werin hundir.)

Kemal tiştekek fam nekir, lê ji dengê wê, ji awir, ji jest û mîmikên wê mîvan-perwerî diweşî. Li salên Kemal xuya dikir, Kemal 39 salî bû. Xanimê zanî ku wî fam nekir, di por, qaş û çavên wî yên reş re zanî ku ew biyan e, rêya xwe şaş kiriye, wê zanî ku ew qaçax e. Bi destê xwe tarîf kir, bi ruyekî bi ken û nerm go:

“Veuillez entrez” (Kerem ke, were).

Derîyê xêni vebû, xanimê, destê xwe da Kemal, go : *“Bonsoir, je m’appelle Lilian, bienvenue”* (Êvarbaş, navê min Lilian e, bi xêr hatî)

Kemal tiştekek fam nekir, palto û sola xwe ji berfê dawêşand kete hundir, germahîyek pir xweşik bi ser ruyên wî de hat. Hundirê malê jî mîna dervayê xêni, mîna koşkekê bû, fireh, raxistî û xemilî bû. Lilianê tarîf kir, Kemal palto û sola xwe exist, derbasî salonê bû.

Kemal li ser qoltixê rûnişt, li ser mase şûşeyek şereb û qedehek hebû. Lê Lilianê şerab îkram nekir, go : *“Un thé chaud vous fera du bien. Thé noir ou à la menthe?”* (Ez ê çayake germ bidim we, bila çaya reş an ya pûngê be?)

Lilianê her du çay jî anîn ber wî, Kemal li rêwîtiyê çend caran çaya

poşet vexwarîbû, wî dizanî mîna çaya welêt nabe, bi destê xwe çaya reş tarîf kir. Kemal tim bi xwar ve dihat û bi rêzdarî dîgo : “Sipas.”

Çay hat, Lilian jî rûnişt, Kemal çay, Lilian şerabê vedixwe, Lilian pir bedew bû, porzer, pordirêj, bejnzirav û tenik bû.

Hemgundîyên wî behsa porzerên Ewropayê pir dikirin. Kemal di bin çavan re bi fedî lê dinêrî.

Lilianê şeraba xwe heyna go:

“A votre santé” (Noşî be).

Kemal tenê di bin lêvan re keniya û dîsa go: “Sipas”.

Lilianê go: *“Avez-vous faim?”* (Tu birçî yî?)

Kemal dîsa tiştekek fam nekir. Lilianê cur bi cur penêr û nan anî.

Kemal birçî bû, bi çayê penêr û nan xweş dixwar, di dilê xwe de go: “Ev keçîka bitenê li vir çi dike, ev xaniyê mîna koşk, ev dar, ambar, qerej, otomobîl, traqtor, otomobîl yên wê ne?”. Wî go: “Qey ew keçîka axa ye”.

Lilianê şeraba xwe vedixwar, her ku çaya Kemal bidawî dibû qedeha çayê tiji dikir.

Lilian: *“D’où venez vous?”* (Hûn ji kuderê ne?)

Kemal mîna yekî lal bû, bi destê xwe li ber xwe dida, dîgo ez bi fransiyê nizanim.

Lilian: “*Vous êtes de quel pays?*”

(Hûn ji kîjan welatî ne?)

Kemal di bin çavan re dikenî, milên xwe heydinan hewa, famnekirina xwe diyar dikir.

Lilianê şeraba xwe tiji dikir, vedixwar, ku Kemal fam neke jî wê ji xwe re deng dikir.

Lilian: “*Demain c’est mon anniversaire. Je l’ai tout de même rappeler à mon copain mais il a oublié il ne vas pas faire surprise comme d’habitude. Je ne pouvais pas continuer de cette manière ç’est pour-quoi j’ai mis fin à notre relation*” (Sibe roja min a ji dayikbûnê ye, lê hevalê min dîsa jibîr kir, dîsa ne surprîz, ne jî hediye, tevî ku min jê pirsî sibe çi ye. Ez nikarim bi vî awayî bîdomim, min ev têkilî bidawî kir, birand.)

Kemal ku fam neke jî ji xwe re guhdarî dikir.

Lilian ji alîyekî ve şeraba xwe vedixwe, ji alîyekî ve tim deng dike, ew hewceyê dengkirinê bû.

Lilian: “*Pourquoi les hommes sont comme ça? Mais j’espère que toi, tu n’es pas comme ça*” (Mêr çima weha ne? Hêvîdar im, tu ne weha yî.)

Kemal idî germ bû, mîna cemedada ku dihele serma canê wî çû. Lilianê deng dikir, Kemal guhdarî dikir, di dilê xwe de dîgo: “Li ba vê xanimê kar heye eceba, ez bişixuliyama?”

Lilianê ji Kemal re jî qedehek ji bo şerabê anî, go: “*Veux-tu aussi?*” (Tu jî dixwazî?)

Kemal bersiv neda, lê Lilianê qedeh tiji kir, şeraba xwe bi wî re heyna, dîsa go: “*Santé*” (Noşî be!)

Lilian: “*Les hommes sont tous les mêmes, infidèles*” (Mêr gişk mîna hev in, ew ne dilsoz in.)

Kemal di dilê xwe de go: “Ez çi merîyekî pak im, hevalên min hatin girtin, ez nehatim girtin, karê min rast dihere, niha jî ez rastî vê xanimê hatim, ew a karekî jî bide min, weng xuya dike”.

Lilianê bi destekî qedeha xwe bi Kemal re heyna, bi destê xwe yê din jî li milê wî xist, bi wî re kenî, go:

“*Il faut toujours être fidele à sa copine ou à sa femme, es-tu d’accord avec moi?*” (Divê herdem mêrek bibe dilsozê yara xwe, jina xwe. Ne wisa?)

Kemal kêfxweş e, hat bîra wî, digotin eger li Ewropayê yekî biyan bi yeke ji wir re bizewice ew kaxiza rûniştinê distîne. Di dilê xwe de go: “Vê xanimê ji min hez kir, ew a bi min re bizewice jî belkî.”

Lilianê bi Kemal re tim qedeha xwe heydina, şeraba xwe vedixwar. Serî lê rind bû, xweş bû. Kemal jî şerab vedixwar lê tenê bi lêvên xwe dikir, hinekî devê xwe pê şil dikir, li

welatê xwe wî ti car şerab venedixwar, li salê carekê belkî yek yan jî du bîra ku dawetek, dîlanek rast hat vedixwar.

Lilian: *"Mon ex copain ne m'a jamais fait de surprise et également jamais invité au restaurant."* (Hevalê min qet ti car ji min re surprîz nedikir, ez dawetî restoranan nedikirim.)

Kemal kete nav xeyalan, ew li vir dişixule, pere qezenc dike, frankên Swîsê dişîne welat, xanima wî, zarokên wî li gund di nav kêfê de ajne dikine, cîranên wan ji wan diqarine.

Lilian: *"Demain pour mon anniversaire, nous allons manger au restaurant avec mes amies et faire une petite fête"* (Sibe em ê bi hevalan ve herin restorane û li wir dîlaneke biçûk bikin ji bo roja min a ji dayikbûnê.).500 Euro di berîya Serdar/Kemal de mabû, wî hûdût jî derbas kir, di dilê xwe de go: "Xwezî min 200 Euroyên din ji bida mal ku pê zivistanê rehet derbas bikin."

Lilian rabû çû, dema ku ew vegeheriya ew bi pîjame bû, go: *"J'ai chaud, je*

me suis changé." (Ez germ bûm, min kincên xwe guherîn.)

Lilian bi pîjame hîn sipehî û xweşik xuya dikir, her çiçes hinek serxweş be jî.

Lilianê qedeha xwe dîsa tiji kir, go: *"Pour la dernière fois"* (Ev cara paşiyê ye), wê şerab nekire qedeha Kemal, jixwe qedeha wî tim tiji bû, wekî din şûşe jî bidawî bû. Lilianê navber da sohbeta bêbersiv, qûmandeya ku li ser maseyê kir destê xwe, TV vekir. Kemal li Lilianê, Lilian li TV dinêre. Li navbereki spîker go:

"Aujourd'hui à Genève, trois villas ont été cambriolées. Les brigands viennent de l'étranger et ont été tous arrêtés" (Îro li bajarê Cenevê dîsa sê villa ji aliya dizan ve hatin derva kirin, ew diz ji der welat in, biyan in, gişk hatin girtin.)

Ruyên Lilianê tirş bûn, telefon kir re dest xwe û dengkirinek pir qut kir.

Niv saet şun de zîl lêket, polis bûn. Kemal girtin birin.

Xeyal û hêvîyên Kemal mîna wî hatin kelepçe kirin. Çend roj şunde Kemal şandin welat.

Newroz e

Çav kesperê
Rabe xwe bixemlîne
Bi rengê keskesorê
Gul û kulîlk pişxivîne
Zozan û çîyan
Her der bêhna biharê
Destan de agir
Ji çîyan daketin
Xortên Kawa
Dadan agirê Newrozê
Keç û xort
Li govendê dawestî ne
Benda te ne
Êdî kesek nikare
Vî agirî vemirîne
Dilê birîndar dixwaze
Serê govendê te bibîne

Mem Xelîkan

Zarok pêşeroja me ne

Bedia Sarihan

Ez bi vê nivîsa xwe hêvî dikim hinekan motive bikim ku bêhtir ji bo zarokan xebat bikin. Û herwiha dixwazim balê bikişînim giringîya xebat û komkirina zarokan.

Gelek lekolînêran di raporên xwe de behsa salên biçûkîya zarokan kirine ku ji bo pêşveçûna wan gelek girîng e.

Yanî jiyana zarokekî 3-salî malbata wî/wê, civaka ku ew tê da

mezin dibe, zimanê ku ew pê deng dike, wî zarokî forme dike û çawa li mezinbûyîna wî/wê tesîr dike.

Ji ber vê yekê gerek em wek gel û malbat û dê û bav, zûtir li ser pêşveçûna zarokekî bifikrin. Em ê bifikrin ku ka em zarokên çawa dixwazin. Helbet piranîya me dixwazin zarokên me, bi zimanê xwe, bi erf û edetên kurdî, bi çand û hunera kurdî bizanibin û wek wê



Ji vekirina dibistana şemîyê li Stockholmê li taxa Fittjayê, roja 24-10-2020an de vebû. Niha ji ber pandemîya Covid-19an naber hatiye dayîn.



Koma futbolê ya zarokan li bajarê Göteborgê du sal berê dest pê kirîye.

bijîn. Ev xeyala her kurdekî ye. Lê li welatên Ewropayê ku pir însanên me yên ji Anatolîya Navîn lê dijîn, rengêkî kurdî ji bo zarokan ewqas ne hêsan e. Lê ne gelek zehmet e jî.

Her malbat dikare ji ziman dest pê bike û mala xwe da tenê bi kurdî deng bike. Lê ev tenê jî têrê nake. Weqfa Kurdên Anatolîya Navîn ku li Stockholmê çend meh berê dibistana şemîyê dest pê kir, ji bo fêrkirina zimanê kurdî ji bo zarokan, mînakek pir baş e. Gerek xebatên wisa zêde û cûr be cûr bin.

Mînakek din heye ku me li bajarê Göteborgê du sal berê futbola

zarokan vekir. Bi dehan zarokên me her hefte tîn ba hev û topê dilîzin. Top dibe mane ku zarokên me bi hev bidin naskirin û herwiha bi dê û bavan ra jî sosyala aktîvîteyek û hevgerînek baş çêdibe. Mînak ku em di dawîya sala yekem da hemû zarok û dayîk li havînê du rojan çûn cîhe kampek, bi muzik, go-vend û lîstokan û me demek xweş derbas kir. 50 zarok û dayik tevî wê gera me bibûn.

Ez di dawîyê da hinek peşnîyaran bidim xwendevanan û hêvîdar im kesên ku vana dest pê bikin wê hebin. Koroya zarokan, tîyatroya zarokan, grubên govendan.

KARWAN

(Koçberên Anatoliyê)

Seda zû ji xewa şîrîn
Şîlan şiyar bû bi qîrîn
Ji xeweke kûr venciqî
Xewa çava lê miçiqî

Şîlan zarok e
Şîlan keçek kurd e
Li bayê seda
Li heyazê seda
Şîlanê nizanî ew çi ye
Ketibûn rêzê malbat
Karwan amade bû ji bo çûnê
Karwana koçberîyê li rê bû

Şîlanê nizanî bi ku ve û çima ewê herin

Ketin rêzê, gişk sîwar bûn
Kal û pîr, keçik û xort tev
Bûk û zava, zar û zêç tev
Tev ketin rê, tev bûn rêwî

Kete rê karwana koçberan
Kete rê karwana bav û kalan

Karwan çû
Toz û dûman li dû
Derketin ji hembêza warê xwe
Ketin rê hemû dost û nas
Çûn ber bi warên nenas

Kok ji axa xwe veqetî
Dil ji canê xwe veqetî
Li wan deran hiştin hêlîn
Li dû man zevîyên hêşîn

Li dû xwe Şîlanê nêrî
Bi çavên kelegirî

Li dû wan ma şûna çîrokê
Li dû wan ma rêça dîrokê

Deşt berdan ji ava kanîyên zela
Li dû wan bi pêlên xurt
deng dan çemên delal

Deşt berdan ji warê bav û kalan
Her tişt wenda bû li ber çavan
Berba bû dîrok li wan deran

Li dû xwe hiştin çiya û banî
Li dû xwe hiştin çem û kanî

Şîlan ji hembêza warê xwe dûr bû
Kanî diherikî li dû

Karwan çû
Toz û dûman li dû

Karwan çû
Çû û venegeriya

Mûlla Evîndar

Mem Xelîkan

Felek pir caran çi dike, nizane. Xwe şaş dike. Dinê, bi serê merîyan de dixelîne û dina merîyan xirab dike. Bi xaintîya xwe, jiyana wan teng, rojê lê reş dike. Bi êş û janên dide hen kesan, pê wana radi-gerîne.

Serpêhatîya Fata Kesê jî, serpêhatîyeke weng e. Bi êş û dilşe-wat e. Fata Kesê, li heremê şareke bi nav û deng e. Ji gundê Xelikên jêr e / Gölyazı. Xelikên jêr gun-deki Cihanbeyliyê ye ku bajeroka Konyayê ye. Fata Kesê hê bûka çend mehan, bûka ecer bûye, mêrê xwe bi nexwaşîyekê wenda dike. Dinê bi se-ri de dixele. Hêvîyên wê dişkên. Xwe bêkes, li dinê bi tenêmayî dibîne.

Fat hê ciwan e sal biçûk e. Mêrê wê mir û çû ser heqîya xwe şunda, hêdî hêdî xwe berhev dike. Dixwaze ji huro şuva, ji bo jiyana xwe bîryarekê bigire. Çing li ser linga bimîne, bêyî mêr jiyana xwe çing bidomîne. Neyê hêsan e, jineke salbiçûk û bî. Dema

serê xwe de wan mal-hulena dike, ji vir û wê de cîran û heval jê re dibên “Tu hê ciwan î, nabe ku tu di mal de rûnî. Mal bêyî mêr nabin. Bizewice, here mêrekî xwe bike.” Fat, na dibê, ji wana re. “Tişteki hûn nizanin heye. Min veşêrkir. Ezê bi ducana me. Min hesabê xwe kir. Min, soz daye xwe. Dergûşa min bû lawik, eza di ma-la xwe de rûnim. Lê bû keçik, eza ji mala xwe biderkevim herim mêrekî xwe bikim.” Mîna ku bi felekê re peymanê çêdike.

Roj û dem derbas dibin, lawi-kekî tine dinê. Felek daxwaza wê tine şûnê. Mîna ku careke din ha-tibû dinê. Xwedê lawek dayîbû wê. Xwedê dayîna vî lawikî, Fat carek din bi jîyanê girêdayî bû. Fata ku li dinê sîva hatî çûbû, Fateke ku tijî xwe di jîyanê girêdayî şên û bi mo-ral hatibû. Navê lawikê xwe dike Mehm. Mîna ku soz dayîbû cîran û hevalan, di mala xwe de rûdine. Mehmê xwe, telê bi tenê bi qar û

*Çavkanî: Serbilind Kanat

bar bi çila mezin dike. Jiyana xwe bi wî ve girêdide. Sal û dem derbas dibin Mehm mezin dibe. Li dora 1940î Mehm, êdî xortekî ji xwe xwaş, xortekî berzewac e. Dilekî xwe jî girtibû. Bi dildara xwe ve bi eşq û sewdake mezin ji hevdu hez dikirin. Rojekê Mehm dilê xwe, evîna xwe bi dayîka xwe re parva dike û ji wê re eşkere dike. Fat bi wê xerê xenê û şa dibe. Fatê hetanî wê rojê, ti gotinek lawikê xwe yî bi tenê nekiribûn dudu.

Fat dihere ji Mehmê xwe re keçekê gund ya here bedew û rind, dildara wî Ela Buldiq dixwaze. Heta wê demê, hertişt wek Fat dixwaze di rê de dihere û dimeşe. Mehm mezin bûye bi dergîstî/desgirtî ye û êdî xwedanê mala wê ye. Êdî ji ewqas derd û çila şunda, saya Mehmê xwe û bûka xwe de rûyê rehetîyê bibîne. Lê feleka bi Fatê re

xaîn, ti xêrê bi wê nake. Destê xwe ji pîştî Fatê nakişîne. Felek dest ji kirinên xwe yên şaş bernade. Carek din agir berdide dil û kezewa Fatê û mala wê lê dişewitîne. Fat daweta xwe dike. Roja ku bi şan û şuret bûka xwe sîyar ke, berebcî / berbû şandine mala bûkê, Mehmê ku Fatê jiyana xwe tê girêdayî, telê bi tenê li ser sokana malê, ji nişkava li ser kêlekê gêr dibe û ji pê de dikeve erde. Carek din nayê xwe. Bûka bin perdê Ela Buldiq û Fata Kesê ya ku gulîyê xwe yî reş pêdayî bi tenê dihele û dihere ser dilovanîya xwe. Ar berdide canê Fatê. Bi mirineke bêwext, hêvîyên Fatê xirab û binpa dike. Ji mirina Mehmê çend mehan şuva, bavanên Ela Buldiq, wê didin gundeki cîran, didin mên.

Bi ser wê de, agir bi canê Fatê dikeve û radigere. Bi kilama **Mehmo Lawo!**, êşa xwe ya giran tîne ziman.

Mehmo Lawo!

Lawo lawo Mehmo lawo
Bûkê simala serê xwe li ba mawo
Felekê da min telakî bi tenê
Li atî ya xwe çima poşman bûwo
Ewrê barê reqereqe
Birûska hêlê qible da çiya bi şevqe
Mehmo lawo carekê serê xwe helîne
Min ji te re anîye Ela Buldiqe sîng bi deqe
Orxana bûkê pir delal e
Zêve di bin de nalenale
Mehmo lawo carekê serê xwe helîne
Min ji te re Ela Buldiq anî male
Li serê bilinda li serê bilinda
Mehmo lawo serî girê mede li warî rinda
Mehmo li çî etika xwe sîva hatî
Min ji te re anî Ela Buldiqe başa rinda
Şevêk ji şevê zivistanê
Arekî ji Mehmî xwe re dadim ji hewşanê
Hewêsa dilê Mehmî min de mayî
Ela Buldiq nedî bi kitanê
Ro ji bana narin bana
Ti kerî neman hatin dana
Hen nîfra bikin li hena
Bên Ela bûk bi şuva here xwedana
Dilê min tînetine
Dil û gurçikê minê dikeline
Mehmo piştî xwe mede goristên ramekeve
Qemera hatin bûka min tewine

Çîrokeke almanî ji yên Grimm

Wergera ji almanî: **Nuh Ateş**

nuhates48@gmail.com

Hênzel û Grêtel

Ê zingvanekî xizan bi jina xwe û herdu zarokên xwe va li ber daristanek mezin bi cih û war bûye. Navê lawikê wan Hênzel û yê keçikê Grêtel bûye. Ew î di nav tuneşiyê da bûye, tiştêkî ku ew gez bike û bicû tunebûye. Û carekê, gava ku li welêt hertişt pir bûha bûye, wî nikanîye ku nanê rojê peyda bike. Her êvarê ew di nav nîvînan da difikiriye û ji ber tahlîyan xwe virda û wêda di hev daye û bi berxweketî ji jina xwe ra digotiye, „em ê wengina çir bibin? Di destê me da tiştêk tuneşe, ma em ê çawa bikanin zarokên xwe yên xizan bixwedî bikin?“

„Mêro tu dizanî bi çi awayî,“ jina wî bersiv dayiye û gotiye, „siweda zû em ê zarokan bibin nava daristanê li dereke ku dar lê silxet in cih bihilin. Em ê ji wan ra agirekî dadin û parîyek nan bidin her yekî ji wan û paşê em ê herin ser karê xwe û wan bi tenê bihilin. Ew nikanin rêya malê viderxin û bi vê şêklê em ê ji wan xelas bibin.“ Mêrik gotiye; „na, jinê ez vê nakim, dilê min bi vê razî nabe, rûyê min

nagire ku ez zarokên xwe li daristanê bi tenê bihêlim! Heywanên bejî dê hema werin û wan parçe bikin!“ Jina wî gotiye, „ax budelewo, lê wekî din em ê her çar ji ji nêzda bimirin, tenê texteyên tapûtan tu dikanî çêbikî“ û ew ji pîstê wî nebûye hetanî ku wî gotiye, erê. Mêrik gotiye, „lê belê dilê min pir bi zarokên xêrnedî dişewite!“

Her du zarokan yên ku ji ber birçîbûnê nikanibûn rakevin, gotinên êşdar yên ku dêmarîyê ji bavê wan ra gotibûn bihîstine. Grêtelê hêstêrik barandine û ji Hênzel ra gotiye, „aniha qedera me aşkere bûye!“ Hênzel gotiye, „Grêtel hiş be, xwe pê neêşîne, ez ê ji me ra çareyekê bibînim.“ Û gava ku kal û pîr ketine xewê, Hênzel rabûye ser xwe, fistanê xwe li xwe kiriye û xwe avetiye derva. Hîv pir ron bûye û kevir û kurçikên hûrik yên li peş malê mîna pereyên kevn û hesinî dibiriqîne. Hênzel xwarve hatiye û kultekek ji wana berehev kiriye û kiriye berîya fistanê xwe. Paşê ew vegehiye mal û ji Grêtelê ra gotiye, „ji xwe ra

meke derd xwanga şîrîn û bêxem ra-
keve, Xwedê me bi tenê cih nahêle,
û şûnda ketiye nav nivîna xwe.

Dora dina rojê, hîn ro helnehatiye,
jinik hatiye û herdu zarok ji xewê ra-
kirine û gotiye, „de rabin tiralno, em
ê herin daristanê û êzingan bînin!“
Paşê wê parçeyek nan daye her zaro-
kekî û gotiye, „Aha ji we ra xwarina
nîvro, lêbelê berî nîvro nexwin, paşê
hûn tu nanî din nabînin.“ Çima ku
Hênzel kevir kiribûn berîka xwe, Grê-
telê nan helnaye û kiriye bin pêşmalê
xwe. Paşê gîştan tevhev dev dane rêya
daristanê. Gava ku ew demekê bi rê
da çûyîne, Hênzel bêliv dawestîyaye
û paş xwe va li malê mêze kiriye û wî
ev hertim dubarê kiriye. Bavê gotiye,
tu li çi dinihêrî û paşva dimeyî, diqet
bike û çîpên xwe ji bîr meke!“ „Ax,
bavo,“ Hênzel gotiye, „ez li pisingika
xwe ya sipî vediniherim, ew li jor li
ser banê xaniyê ketiye û dixwaze ji
min ra bibêje oxir be!“ Jinikê gotiye:
„Dîniko, ew ne pisinga te ye, ew roja
sibehê ye û kevirên baceyê dibiriqî-
ne.“ Lê Hênzel di rastîyê da li pisingê
nedinihêrîye, wî gav bi gav ji berîka
xwe kevirên biriqokî yek diavêtiye ser
rêyê.

Gava ku ew gihêştine nav daris-
tanê, bavê gotiye, „Zarokno, niha
êzingan berhev bikin, ez dixwazim

agirekî dadim sewa ku hûn neqefi-
lin.“ Hênzel û Grêtel çiloyên zirav û
hîşkbûyî berhev kirine û dane serhev
jê lodeke mîna çîyakî piçûk çêkirine.
Agir vêketiye û gava ku pêtiyên agir
têr bilind bûne, jinikê gotiye; „Za-
rokno nêzikî agir bibin, vehesin,
em ê herin nava daristanê êzingan
bişikênin. Kîngê karê me tewa bû,
em ê şûnda vegerin û we bi xwe ra
bibin mal.“ Hênzel û Grêtel li dor
agir rûniştine, û gava ku nîvro bû her
yekî parçenanê xwe xwariye. Û ji ber
ku dengê bivir dibihîstin, wan bawer
dikirin ku bavê wan nêzikî wan e. Lê
ew denga ne yê bivirê yê êzingan bû.
Ew dengê çiloyekî ku bavê bi dareke
bêhêz va girêdayîbû. Ew bi derbeyên
bayê vir da û wê da dihêjîyaye û pê
darê va didaye. Ji ber pir rûniştinê
çavên wan diketine hev û ew ketine
xeweke kûr.

Wexta ku ew nihayed bi xwe
hesîyane şereş bûye. Grêtelê dest
pê girî kiriye û gotiye: „Em ê niha
çawa ji nava daristanê biderkevin?“
Hênzel ew aşt kiriye û jê ra gotiye:
„Bîstekê bipê, hetanî ku hîv heltê,
hingê em ê bikanin rêyê biderxin.“ Û
wexta ku hîva gilover helatiye, Hên-
zel rahîştîye destê xwangê û xwe li
kevirên biriqokî girtiye, yên ku mîna
penazê ecer tebirûsîne û rê bi wan

dinimandine. Ew bitunî şevê bi rê da meşîyane û devdeve sibehê giheştine mala bavê. Wan derî kutane, gava ku dêmarîyê derî vekirîye û Hênzel û Grêtel li ber dêrî dîtiye, gotiye: „Şeytanno, hûn veqas pir li daristanê raketin, me jî digot hûn qet şûnda venagerin.“ Lêbelê bavê zarokan şa bûye, dilê wî pê şewitîye ku wî zarok bi tenê li wir cih hîştibûn.

Pir neçûye ji her alîyî da dîsa bûye tuneşî û zarokan dibihistine ku dayikê bi şevan di nav nivînan da ji bavê ra wer digotiye: „Hertişt teva bûye, tenê niv parçe nan maye, paşê bi dawî dibe. Zarok gerek e herin, gerek e em wan bibin kurahiya daristanê sewa ku ew nikanîbin rêya vegerînê bibînin, wekî din ji bo me tu çareya xelasîyê tune ye.“ Dilê merik dişevitîye û xwe bi xwe gotiye: „Baştir e ku tu parîyê paşîyê bi zarokên xwe va parva biki.“ Lê jînikê guh nedidaye ser tu gotinên wî û wer lome lê dikirine: „Kê got A mecbur e ku bibê B û ji ber ku ew cara pêşî li ser gotina xwe danewestîyaye û anîha jî ew ê careke din jî wer bike.“ Lê zarok hîn payî bûne û gili û gotinên bavê û dêmarîyê bihistine. Gava ku jin û mêr ketine xewê, Hênzel dîsa rabûye ser xwe û xwastiye ku derkeve pêş malê mîna cara berê kevîr



û kurçikan berehev bike. Lêbelê dêmarîyê derî kilîd kiribû û Hênzel nikanîbû derkeve derva. Lê ew bi ber dilê xwanga xwe da çûye û gotiye: „Grêtel megirî û rehet rakeve, Xwedê yê ezîz dê alîkarîya me bike!“

Siwê zû jinîk hatiye û zarok ji nav nivînan rakirine û wê parçeyek nan dayîye her yekî ji wan, lê ew ji yê berê piçûktir bûye. Ew li ser rêya daristanê di berîka Hênzel da hur dibûye, û carcaran ew bédeng disekinîyaye parçayek jê diavetiye erdê. Bavê gotiye, „Hênzel çima tu disekinî û li derûdora xwe dinihêrî, bi rêya xwe da here!“ Hênzel lê vegerandiye û gotiye, „ez li kevoka xwe vedinêrim, ew ê li ser banê daniştîye û dixwaze xatirê xwe ji min bixwaze.“

Jinë gotiye, „Budelewo, ew ne kevo-ka te ye, roja sibehê ye û ewî kevirên baceyê dibiriqîne.“ Hênzel nanê ku di berîya wî da hurbûyî pêda pêda li ser rêyê belav dikiriye. Jinikê zarok hîn zêde birine kûrahîya daristanê, cihekî ku wan di jîyana xwe da qet nedîtibûn. Dîsa agirekî şên hatiye dadan û dayikê gotiye; „Tenê li vê derê peya bibin zarokno, eger westiyane hûn dikanin gavekê rakevin. Em ê herin nav daristanê êzingan bişikênin û êvarê, kîngê ku me karê xwe xelas kir, em ê şûnda vegezin û we bi xwe ra bibin mal.“ Gava ku nîvro bûye, Grêtelê nanê xwe bi Hênzel va parva kiriye, ji ber ku wî nanê xwe bi rê da belav kiribû.

Paşê ew radikevin û êvar rabir-tiye, lê tu kes nehatiye ba zarokên xizan. Kîngê şereş bûye ew bi xwe hêsiyane û Hênzel bi ber dilê xwangê xwe da çûye û gotiye: „Tozikê din sebir bike hetanî ku hîv helat, hîngê em ê parçeyên nanê hûrik yên ku min bi rê da belav kiribûn bibînin û ew ê rêya mal bi me binimînin.“ Wexta ku hîv helatiye ew bi rê ketine lê qet tu parçenanê hûrik bi ber çavên wan neketine, ji ber ku bi hezaran çûçikan yên ku li daristanê û li zevîyan wirda û wêda difriyan bi nikûlên xwe ew berehev kiribûn û

xwaribûn. Hênzel ji Grêtelê ra go-tiye: “Em ê rêyê viderbixin!” Lê wan rê vidernexistine. Bitûnî şevê ew meşiyane û rojeke din ji ji siwe da hetanî êvarê meşiyane lê bi şîya ne-kirine ku ji nava daristanê derkevin. Û ew ewqas pir birçî bûne, ji çend tûyên ku li herdê weşiyayî bêtir qet tişteki wan tunebûye. Û çima ku ew pir westiyabûn, çîp û ranên wan ned-ixwastin wan kaş bikin, li bin darekê wan xwe dirêj kirine û ketine xewê.

Siweya sêyemîn bû ku wan mala bavê terikandibû. Wan dîsa dest bi meşînê kirine, lê ew her ku meşiyane ketine kûrahîya daristanê û eger zûtir alikariyek negihêstiba wan, ew ê ji qam da bikevtana. Gava ku nîvro bûye, çûçikeke bedew û sipî wekî berfê ya ku li ser şaxê darekê danîştibû û pir xwaş distraye, bi ber çavên wan ketiye. Ew dawestiyane û guh dayîne ser wê. Gava ku çûçikê stran bi dawî kiriye, wê per û bask hêjandine, xwe daye pêşîya wan û firîyaye. Û wan ji dayîne pêy wê he-tanî ku gihêstine xaniyekî piçûk û çûçik li ser banê wî danîştîye. Gava nêzikî xaniyê bûne ew pê hêsiyane ku ewî ji nan hatiye avakirin û li ser banê wî paste hatine rêxistin û pen-cereyên wî ji şekirê gewr hatine çêkirin. Hênzel gotiye, “De kerem

kin em dest pê bikin û noşî can be! Ez dixwazim parçeyekî ji banê bixwim, Grêtel tu dikanî ji pencereyê bixwî, tehmê wê şîrîn e.“ Hênsel dest avêtiye alîyê jor û ji banê tozikek jêkiriye û xwastiye ku tehmê mêze bike, Grêtel çûye ber pencereyan û camê wê kirt kirine û alastine. Ji odeyê dengêkî narîn bilind bûye: „Kirt, pirt, ma kî tolîka min kirt û pirt dike?“ Zarokan lêvegerandine û gotine, „Ba, ba, zarokê Xweda” û ji xwe ra nekirine xem, bêyî ku dest jê berdin, xwarin dewam kirine.

Hênsel, çima ku jê pir hez kiriye, parçeyekî gir ji banê jêkiriye û Grêtelê jî ji cama pencereyê parçeyekî gir û gilover şeqandiye û rûniştiye kêf kiriye. Li wê navberê ji nişka va derî ji hev bûye û jineke pir pîr ya ku bi gopalê bi rê diçûye, derketiye. Dil li Hênsel û Grêtelê qetîyaye, ji tîrsa ra tiştê ku destê wan da heyî ketiye. Pîrê serî hejandiye û gotiye: „Wey, zarokên hêja, kê hûn anîna vê derê? Kerem bikin werin hundir, li ba min bimînin, tu nerindî nagihê we!“ Wê bi destê herduyan girtiye û ew birine hundirê malîka xwe. Xwarinek xweş dayiye ber wan, şîr û kilorê bi şekirê xurik, sêv û findiq. Paşê, Hênsel û Grêtel ketine nav du nivînên piçûk yên bi lihêfên sipî nixûmandî û xwe

bi xwe digotine qey ew ê di bihuştê da ne. Pîrê hewl didaye ku xwe tim bi rengêkî dostane nîşan bide, lê di eslê xwe da ew cadûyeke pir niyetxerab bûye.

Pîrê bi zanetî xwe dost dinimandiye lê di eslê xwe da ew cadûyeke zîyankar bûye û dixwastiye zarokan têxe kemîneyê. Gava ku yek dikeve destê wê, ew hema wî dikûje, dikelîne û dixwe û ew ji wê ra dibû rojekê cejnî. Çavên cadûyan sor in û nikanin dûrîyê baş bibînin, lê ew mîna ajalan pê dihesin gava ku meriv nêzikî wan dibin. Wexta ku Hênsel û Grêtel nêzikî wê bûne, ew neçê kenîyaye û bi rûreşî gotiye: “Ew yên min in, divê carek din ji destê min nefilitin.” Sibê zû hîn ku zarok bi xwe nehêsiyane, ew rabûye ser xwe û gava ku wê ew weng rindik û birûçikên têr sorik dîtine, di ber xwe de wer gotiye: “Ew ya bibe piçek baş.” Bi destê xwe yê hişk wê cîhlê rahîştiye Hênsel û ew kaş kiriye biriye axurekî piçûk yê bi derîyêkî bi pêçikên hesinî. Hênsel çiqas biqîrîyaya jî tu feydeya xwe bi wî nedibû.

Paşê, pîrê çûye cem Grêtelê û sewa ku hişyar bike wê ew hêjandiye û gotiye: “De rabe, kun bi xwelî ye, here avê kaş bike û ji birayê xwe ra tiştêkî xwaş bikelîne, ew î li derva di axurê da rûniştiye û gerek e ku ew qelew

bibe. Kîngê ew qelew bû, hingê ez dixwazim wî bixwim.” Grêtelê dest bi girî kiriye, lê tu feydeya wî nebûye, ew mecbûr maye ku xwestinên pîrê bi cih bîne. Ji Hênzel ra şîva herî baş hatiye kelandin, lê ji qalikên kevjalên bêtir tu jê nebûye nesîbê Grêtelê.

Pîrê her sibeyê bi dizikî diçûye axurkê û wer bang dikiriyê: “Hênzel tilîya xwe dirêj bike, sewa ku ez hîs bikim ka tu ê li nêzikî qelew bibî.” Lê Hênzel hestîyek dirêjî wê kiriye û pîrê, ji ber ku çavên xwe ewrî bûn nedikanîye baş bibîne û bawer dikiriyê ku ew tilîyên Hênzel in û ecêb dimaye ku wî çima qet nedixwastiye qelew bibe. Wexta ku çar hefte derbas bûne û Hênzel tim jar maye, sebra pîrê nemaye ku benda wî bipê. Wê berve Grêtelê bang kiriye û gotiye; “Keç Grêtel lez bike û avê bîne! Qelew yan jar sibe dixwazim Hênzel serjêbikim û bikelinim.” Ax, xwanga xizan çiqas bi berxwe dike-tiye gava ku wê mecbûr av kişandiya û hêsterik bi ser cênigên wê da dihatine xwarê! Ew qîrîyaye û gotiye, “Xwe-dayê ezîz alîkarîya me bike, xwazika ku heywanên bejî em bixwarina, qet nebe em ê tevûhev bimirana!” Pîrê ji wê ra gotiye, “Qîr û wêrinîyan li cih bihîle tu fêdeya wan bi te nabe!”

Sibê zû gerek bû ku Grêtel ji mal biderketa û beroşa ku av têda bi dar-

da kira û agir li binê wê dadaya. Pîrê gotiye, “berê em dixwazin bibirêjin, min tenûr vêxistiye û hevîr straye.” Bi pêranayîna pîrê ra Grêtela xizan berve tenûrê ya ku pêtiyên agir jê belav dibûn, şengijîye. Pîrê ji wê ra gotiye, “bi çarpê bikeve tenûrê û lê mêze bike ka ew rind germ bûye, ji bo ku em bikanin hêvîr têkin hundirê wê.” Ku Grêtel biketa hûndirê tenûrê pîrê dixwast deriyê tenûrê li ser wê bigire sewa ku Grêtel di wir da bihê biraştin û ew wê bixwe. Lê Grêtel bi fena wê hêsîyaye û gotiye: “Ez nizamim, ez ê çawa bikevim hundirê wê?” Pîrê gotiye, “Qaza ehmaq deriyê tenûrê têr gir e, ma tu nabînî ez bilem dikanim tê ra bikevim hûndir” û wê xwe bixwê ra ber bi deriyê tenûrê kaş kiriye û serîye xwe radaye tenûrê. Hîngê Grêtelê ji par ra pînek bi pîrê va daye, pîr bitûn ketiye hundirê tenûrê. Grêtelê deriyê tenûrê yê hesinî girtiye û zend kiriye. “Hi!” Pîrê dest bi girî kiriye û gotiye “vira mîna cehenemê ye!” Di wê navberê da Grêtelê bazdaye û çûye. Cadûya bê Xwedê bi ezîyetekî giran şewitiye.

Grêtel bi lez çûye ba Hênzel, deriyê axûrê ji hev kiriye, bang kiriye û gotiye: “Hênzel, em xelas bûn, cadûya pîr mir!” Hênzel bazdaye derva mîna teyreki ku ji qefesê di-

fire gava ku derî li ber wî tê vekirin. Ew çiqas pir şa dibûn, wan dest di stûyê hev ra dibirin, virda û wêda bazdidan û hevûdu maç dikirin! Û sebeba ku bitirsîn êdî nemabû, lewma ew ketin mala cadûyê. Li her qunceki kodikên tijî gewher, morî û mircan hatibûn bişûnkirin. Hênzel gotiye, “Vaneyê di ser kevîrên birîqokî ra ne” û berîyên xwe jê tijî kirine. Û Grêtelê jî gotiye, “Ez jî dixwazim tiştêkî bi xwe ra bibim mal,” û pêşmala xwe jê tijî kiriye. Hênzel gotiye, “Lê aniha gerek e ku em bi rê kevin û ji nava daristana cadûyan derkevin.” Ew sê çar seetan bi rê çûne û gihêştine çemekî mezin. Hênzel gotiye, “em nikanin derbasî hêla din bibin, ez tu pire û bendên pey-ayan nabînim.” Grêtelê gotiye, “li vira keştiyên piçûk jî tunin, lêbelê li dera han werdekek sipî ajînî dike, şayet ez ji wê bixwazim, ewa alîkarî bike sewa ku em derbasî aliyê din bibin.”

Wê wer bang kiriye:

Werdek, werdek

Grêtel û Hênzel li vira ne.

Ne bend û ne pirek heye,

Me helîne ser piştê xwe ya sipî.

Werdek hatiye nêzikî wan bûye. Hênzel li wê sîyar bûye û ji xwanga xwe xwastiye ku ew li hêla wî bi şûn bibe. Grêtelê gotiye, “na, em ê her du bi hev ra ji bo werdekê giran bin, ma ew me yek bi yek bibe aliyê din.” Heywana rind wer kiriye û gava ku ew şad derbasî aliyê din bûne û gawekek bi rê da çûyîne, daristan her çû bi wan nas dihatiye û li dawîyê, ji dûrê da mala bavê bi ber çavên wan ketiye. Ew bezîyane û bi lez ketine mabeynîya malê û xwe avêtine stûyê bavê. Mêrik, jikî ku wî zarok li daristanê li cih hîştibûn, tu gavekê dilrehetî nedîtiye û jina wî jî miribû. Grêtelê pêşmala xwe dawêşandiye û gewher, morî û mircan li mabeynîyê bir û belav bûne û Hênzel jî yên di berîyên xwe da giştik derxistine û çeng bi çeng tevê wan kirine. Derd û keder giştik bi dawî bûne û ew tevhev pir şad jîyîyane. Çêroka min bi dawî bû, li dera han mişkek dibeze, kê ew girt heqê wî ye ku jê kumekê çêrminî ji xwe ra çêbike.

Qerfo

Stîleke nu ye. Bêhed, bêsansur û otosansur e. Rexne û henek in.
Bêtirs in, lê zik û hîsên kesî naêşînin. Çav û mejo vekirîye.

herkes li ber derîyê xwe
otorîtê
li ber her derî

zewke hêwisînê
rîya ku bi gulan xemi-
landîyê
konê pîrikê

çelengîyê
di çavên

temaşevanda ye
bilûrvanê navdar
li nav ga
deşta ziwa

çil û axaftina
siyasetmedar
herkî li ziravekî têxe

Seyfî Dogan



Quto

berf barî
tarî bû ronî
berxwedan

berf barî
gulên sipî
dar xemilandin

stêrkên
di tarîyê da
bi hemdî xwe bibirqên

mala kê ava bike
çar demsala
nas bike

rojê taca darê tazî
zer boyax kir
kenê germ

Seyfî Dogan

Helbest

xweş be

çiqas xweş be
herro roj hilê
dema ku baran barî şemsîyê me î hebe
berf barî merasî me yî germ be

çiqas xweş be
zikî me yî sê dana têr be
li çol û baniya kîtêbxane hebin
ziman mîna çeman biherike

çiqas xweş be
fikir azad be
gotin şîrîn be
kar ji bo dilşahîyê xizmetkar be

çiqas xweş be
aşqê ken li ser lêvan
zengilî derî lêxe

çiqas xweş be
zarok stêrkan temaşe kin
û birçî ranekevin

çiqas xweş be
namlû bi bilûr bin
li ziravên dilan xin.

Seyfî Dogan

Kawa

mala te ava be
kawayê nefsbîçûk
durdîtê dilpak

mîrê hunermendîya agir û hesin
çîkên hesinî te
pêtîyên agirî te

bi hezaran sal in ku
rêberîyê û rîya me ronî
û mejîyê me germ dikine
serkêşê meşa azadîyê

dizanin
tu newestîyî
rîyên li ber me pir bûn
rîyan li ber me digiherîne

were bi mêvanî me be
em ê xûya enîyê te
bi destmala herîrî pak kin
em ê ji te re li bin dara jiyane

kulavî ji hirîyê berxên reş û sipî rêxin
piştê xwe bi darê da
agirên çar qûlan li dor alîyê te
di cam-î û cem da haoma

erd û ezman bi yek ke
ala te î ku serbilind û bextîyar dike
di dest me da ye
em ê li dîwanî te bisekinin
xizmetî te bikin.

Seyfî Dogan

Henek/Yaranî

Ferîdun

Remo bi Hesê ve ê terin malê merlixîyekî xwe yî li ber mirinê.

Li ser deriyê xwe yî rastê kerîyek mîhên bi şîr tîn. Mîhên bi şîr gelek jar û bêhêz bûn. Remo yî di ber xwe da xwe bi xwe deng dike. Piştî dibinin ku du xort li kevîyê rê rûniştine. Nêzik dibin. Yekî ji wan dibê: “Xalno, agirî we heye? Cixarê xwe pê vêxim.”

Remo û Hes ê danawestî. Dema ku tîn malê merîyên xwe, Xoce yî quranê dixwîne û cemeat guh dide ser Xoce û di ber xwe da dike piltepit.

Remo yî xar ve tê û di guhê nexweş da dike pistepist. Tu kes gotinên Remo nabîhîze.

Hes î pir meraq dike. Dema ku ew derdikevin derve, Hes î ji Remo dipirse: te di guhê Celo da çi got?

Remo yî şorê nake didu.

-Min got Celo! Ê li dinê walî li dor te bicivin û pirsan bikin. Ew ê rewzê vê derê meraq bikin. Wexta ku wan rewzê me zîndîya ji te pirs kirin, bê:

-Lawê Xelî Osê Mixterê gund e. Ew ê fêhm bikin.



Payîza dereng e.

Roj î bi qîymet e.

Devdeva nivro ye.

Remo û Hesê yê xwe dane berroj.

Ortalix î xewle ye. Heryekî henarek di deşt da ye.

Remo deştên xwe yên wek bêran dendikên henarê diweşîne.

Hesî ji heqî xwarinê henarê derdikeve. Hesî temaşe dike ku Remoyî di deşt henarê da ketîye belayê.

Hesî bi Remo re dibê: “Dîqet ke! Te dendik gîştik weşandin!”

Remo li Hesê wek qurşunê mêz dike.

”Çir bikim, Hesî mino! Hefsaran di serî dendikan kim!”

Hes î Remo dipesine, bi hewa têxe.

”Tu yî serşivan bûyî! Te şivanî bi ber vî gundî xist!

Te bi bilûrê xwe dil sîz û bûk siwar dikirin.

Tu sergovend î!

Divê ku em hêkelî te danin! Remo yî xwe ji wan deran nake

Hes î naterkîne. Remo yî çexe Hesê tewe û bi mûrizekî tahl

”Magî, çi tê bîrê! Hêkelî min danê sewê ku ma kûçik bi lingan da bimîz û çûçik jî bi serî da zîç kin”



Baranê dibare

Hesî li bin çardaxê li ser mînderê rûniştîye

Derûdor şilûşepelî ye

Ramo kerîyê pêzî daye ber xwe î ji çolê tê.

Dema ku di ber malê Hesê re derbas dibe;

Hesî; Ramo! çiyê wan çîpên mîh û bizinan bi çamûr bûna

Tu bi wanan çamûrê kerpîçan lihevtêxî”?

Ramoyî çexe Hesê dibe;

”Yê mina tê yê qunbixwale di bin çardaxandan runiştin!

Îşê ji mîh û bizina re bimê.

Çîroka Dîkê Kuliksor

Berîvan Keskîn

Malbateka cotkar ji ber ku dîkê xwe yê heyî di wextê da bang nedida dereng ji xewê şiyar dibûn, nema dikarîn kar û barên xwe yên cotkarîyê bi rêkûpêk bimeşînin. Biryarê didin ku dikekî nû biştînin. Cotkar diçe bazarê û dikekî diştine. Dîkê nû standî dikekî ciwan, pûrtkesk û kuliksor bûye. Dîkê kuliksor yê nû dixwe kolika li nêzikî malê. Dîkê xwe yê berê, yê kulikreş û pûrtreş jî dixwe kolika li dûra malê. Çend roj dibuhurin û dîk dibin heval. Dîkê kuliksor ji dîkê kulikreş dipirse: "tu hîn xurt û berz î, ji bo çi xwedîyê malê ez standim?" Dîkê kulikreş yê tiral û ezez dibêje: "ji ber ku ez êdî êxtîyar im, dikim nakim nikarim sibê zû şiyar bibim û bang bidim ku xwedîyê xwe ji xewê şiyar bikim û ew jî karûbarên xwe yên cotkarîyê bimeşînin. Loma tu standin." Dîkê kulikreş bi şûmî û bi dengê kelogirî dibêje: "dibe ku ew ê min serjê bikin ji ber ku êdî feyda min tune." Dîkê kuliksor dilê xwe bi dîkê kulikreş dişewitîne, dilê xwe naçê ber ku dîkê kulikreş were ser-

jêkirin û dibêje: "tu xeman nexwe, ez ê her sibê ji ber te ve li ber kolika te bang bidim ku xwedîyê me te serjê neke."

Ji wê rojê bi şûnda dîkê kuliksor her sibê diçe li jorê hewşê li ber kolika dîkê kulikreş bang dide. Dîkê kuliksor ji ber çûyîn û hatina li hewşa mezin, roj bi roj jar dibû. Nikil û kulik lê zer bibûn. Dîkê kulikreş genim û av li ber, ji serjêkirinê ve bêxem û qet li ber dîkê kuliksorê dilovan nediket. Roj û meh bi wî awayî didomin. Cotkar bala xwe dide dîkê kulikreş her sibê bang dide û roj bi roj bigoştir û berztir dibe û bala xwe dide dîkê kuliksor qet bang nade û roj bi roj jî jar dibe. Cotkar ditirse ku dîkê kuliksor nexweş e û ew ê mirar bibe û bi wê tirsê, bi demildest dîkê kuliksor serjê dike.

Di ser serjêkirina dîkê kuliksor da roj derbas nabin, dîkê kulikreş tê serrewza xwe ya berê. Dîsa bang nade, dixwe, vedixwe, dikemişe û cotkar jî her sibê dereng ji xewê şiyar dibe, ji bo vê jî kar û barên wî bi derengî

dikevin. Cotkar fehme dike ku yê her sibê bang dida, dîkê kuliksor bûye ne dîkê kulikreş. Cotkar ji ber tiraliya dîkê kulikreş pir aciz dibe. Ji aliyekî ve bi ber dîkê kuliksor yê serjêkirî, ji alîkî ve jî ber kar û barên xwe yên ji ber tiraliya dîkê kulikreş dikeve ku bi rêkûpêk nameşin. Cotkar ewqasî li dîkê kulikreş hêrs dibe ku sond dixwe goştê wî jî nexwe. Feqet roj tîne hefte diçin. Hêjî dîkê kulikreş wekî berê tiral û bêxem e. Cotkar fikirî û xwe bi xwe got: ji ber ku min goştê dîkê kulikreş li xwe heram kir, serjêkirina wî êdî nabe! Lê divê ez rê li wî dîkê

tiral bikim. Lê dilê cotkar nayê ber ku dîkê kulikreş ji baneya xwe biqewirîne. Ewqasî ji dîkê kulikreş aciz bûbû ku wê êvarê ne dîkê kulikreş yê kir, ne jî xist kolikê.

Bi şev dengê qêrîn û hawaran bi ser cîranên cotkar dikeve. Cotkar bi tirs ji nav nivînên xwe bazdide, derdikeve hewşa mala xwe. Dema ku derdikeve hewşê, çavên xwe li pûrtên reş yên li her aliyê hewşê belavbûyî dikevin û hingê xwe bi xwe dibêje: "tola dîkê kuliksor bû para rovîyê boçqol."



AGAHDARÎYEKE GIRÎNG

Em dixwazin di her hejmareke xwe de, ji cil û bergên kurdên Anatoliya Navîn wêneyekî kevn di Bîrnebûnê de biweşînin. Bi vî awayî em ê hem bi tevgirêdana kurdên Anatoliya Navîn bizanin, hem jî em ê hay jê hebin ku kincên wan ên berê bi çi awayî ne.

Bi rîca û bi kêfxweşî em bi hemû kurdên Anatoliya Navîn didin zanîn ku: wêneyên kesên ji malbatê (jin-mêr), bi kinc û tevgirêdanên kurmancîyê li ba we hebin, ji kerema xwe ji me re kopîyekê bi rê bikin. Bi vî yekê em ê bi dewlemendiya tevgirêdana xwe bizanin û em ê wan kesan careke din bi bîr binin.

Redaksiyon

Şare ew jin e ku li ser mirîyan bi melodîya dengê xwe, bi şîn û girîyê xwe re xweşgotinan li hev tine û davêje ser ew kesê mirî. Ev fenomen weke edet û marîfet di serdema antîk de jî hebûye: li rojhilata navîn, di nav kurdan de, li cem grekî û romayîyan jî hebûye. Herweha piştî wextekê ev hunera şaretî û şarebûnê li gelek deveran û di nav kurdan de jî dibe weke kar. Û kesên ku evî karê şînê dikin, bi navê şare li hinek deveran dibe karê debara rojane û parçeyek kulturî. Bi swêdî dibêjinê “gråterska” Heta salên şerê duduyan jî li Swêd û Finlandîyayê ev karê şaretîyê hebûye û dûre nemaye. Lê îro li Helsingforsa Finlandîyayê komeleyeka wan jî heye û dixwazin ev kultura şaretîyê wenda nebe.

Baş nayê zanîn ka li Kurdiştanê li dereka din ev kultura şaretîyê maye an ne, lê li cem me kurdên Anatoliya Navîn hîn jî heye. Ew kesên ku nikanin êş û hîsên ji bo trajedîya mirîyên xwe der bikin, ew banî van şareyan dikin ku li ser mirîyên wan şînê girêdin. Û şare jî karê xwe dikin: bi heq, bi diyarî, an jî ji bo xatirê kurdûna xwe. Balkêş e, evî karê şaretîyê tenê jin dikin.

Piştî evê ritualê xwedîyê kesê mirî, bi xweşgotin û bi melodîya dengê şareyê êşa xwe sivik, ruhê xwe aram dibe ... û belkî êdî xwe zêde bêkes jî hîs neke.

Bîrnebûn

Ejê

Altun Başaran

Ej ji gundê Altilera bi navê Rawê Meştî Alî Begê jineka li ser xwe, şorên xwe şor bûye. Wekî jineka li ser xwe bûye. Li alî jorî civatî mêran rûdiniştîye. Berê titûn hebûye ku titûnê xwe dipêçaye keva li ber mêran dikirîye. Nevîya Ewnî Xoce ye. Kalê wê Ewnî teqrîben 150 sal berî vê li gundê me medrese vekirîye û medrese bi rêva birîye. Xoce û li medresê dersdar bûye.

Ejê çar keçik û sê lawikên xwe hebûne. Lawikê wê yî bi navî Hecî 19salî dimire. Hecî heft salan li Erebiştan Siûdîyê xwandîye. Jê ra digotîne Mil Hecî. Lawê wê yî bi

navê Abdila, yî 22salî jî dimire. Du lawikên xwe li dû hev dimerin, agir bi kezeba wê dikeve, dibe şareyek, kila-man distirê.

Keça xwe ya bi navê Zêva Xelê, ji Atilera dike berdêlî Abdila li gundê Çoplîyê, nêzikî Altilera ye. Berdêla Zêva Xelê navê xwe Goz bûye. Raw naxwaze ku Gozê berde, dixwaze li lawê xwe yî salbiçûk, Omer re mar bike. Omer î biçûk e, nizane zewac çi ye, lê li ber dêya xwe deng nake. Goz ji Omar pir mesttir e. Welhasil, Raw bi peya dikeve rê, bi kincên xwe yên vajoyî, distirê, digirî û dere mala bavê Gozê, li Çoplîyê.

Veng distirê:

Tême, tême Hecî Abdila tême
Ez a bi peya ketime rêya Çoplîyê ténagême
Bi ningê xwas, kincên vajoyî
Min royê li xwe kirine dûrme
Ez ê ki herime mala Omê Îvê rûnime
Ez e ku bême ez a, hima azincî hima xwazgincî me
ku li ber çavên dê da were
Ez ê li yara Abdilê xwe bi rucû me

Li ser Mil Hecî jî veng digot:

Erê berxê tu gelar î
tu bi enîyê gewr, bi perçemê zer î
Xwedê tu dayî Xwedê tu birî
Ez teme şênû Mil Hecî xwe naterkînim
min ji waqa paşî newêrî
A niha Mehmedî malê Karê were
E bê ka xwarzîyê me yî dîlkelem aqil defterî
Ez a odê Mil Hecî xwe rêş kim, av kim
Qêmîş nawim di ser ra gav kim
Ez a sond xim bi sondê mezin
careka din di pê hevalê te mêz nakim

Zêva Xelê yanê berdêla Gozê lawikek û sê keçikên xwe hebûne. Keçikên Zêvê yên bi navê Goz û Rawîk mezin dibin û dibin bûk. Li gorî edetên berê bûkek ku suwar dibû, şeş mehan nediçû zeyî. Li pişt şeş mehan Goz bi Rawê ve derine zeyî, mala bavê.

Goz bûka xaltîya xwe ya Rehm bûye. Yanê ji gundê Çoplîyê bûye. Bûye bûka malê xaltîya xwe ya Rehm li malbata Îzmirlî, li gundê Omera. Mêrê wê bi navê Şêxê Rehmê bûye.

Di şevêkê de him Goz him jî Rawik dimirin. Mêrê Gozê, Şêxî Rehmê bi çoka dikeva erdê çing mirina Gozê dibize. Zêv ê teze ye, hewêsa xwe ji hev neşkênane.

Dêya Gozê jî dibe şareyek û li ser cotê keçikên xwe veng distirê:

De menale Goz Gozê tu menale
Avcîya rameke hawê wan xezala
Goza min bûka xaltîyê zeya xalê
Şêxkê xwanga min î aşê xwe yî di êş da cî hiştîye
Şev bi nîvê şevê çûye ber pencera malê xalê
Î ji Fatika kekî min î bêbira dikîye savalê
Rawê berxê mere kanîyê Xelê avê
Porê Goz û Rawê min dirêjî zêr î li navê
Yavrim wun ê bi mal in, wun ê bi mêt in
Wun cima di destî hev da sond duxune li hodê bavê.



Zêva Xelê

Em ji kalikên xwe jî paşdetir in

Zinarê Xamo

Nazim Hikmetê şair di şîreka xwe da dibêje: "Ez ji zarokê xwe yê hatiye dinyayê paşdetir û ji bavê xwe yê mirî pêşdetir im."

Bi van gotinan Nazim Hikmet dixwaze bibêje, bi giştî nîşkek (çilek, qirnek) tim ji nîşê din pêşdetir e. Bi bawerîya min jî îstîsna ne tê da, ev dîtîna bi gelemperî rast e. Lê ne ji bo me kurdan.

Ez دنیا alemê nizamim, lê em kurd bira pêşdetirîya ji bavê xwe li wir bimîne, em ji kalikên xwe jî, ji kalên kalên xwe jî gelkî paşdetir in.

Hema wek millet dema em li halê xwe binêrin (yanî em kurdên Kurdistanê Bakur) em ê bi hêsanî bibînin em him ji bavên xwe û him jî ji kalên xwe çuqasî paşdetir in.

Erê, bav û kalên me gelek pir nexwenda bûn, ne xwedî şehade û dîplomayên cûr be cûr bûn, belkî ji wek me zêde ne çep, "şoreşger" û "sosyalîst" bûn jî.

Lê qenekê wek me dev ji zimanê xwe bernedidan û ne heyran û evîndarên zimanê tirkî bûn.

Kurd bûn, bi kurdî dipeyivîn û zarokên xwe jî fêrî kurdî dikirin.

Lê em, ma em ji wiha ne?

Berê (heta salên 1970î) çavkaniya jînê ya zimanê me dîndar, şêx û melayên me bûn.

Zimanê kurdî di medreseyan da bi riya wan kêr zêde dihat xwendin, zindî dima û belav dibû.

Lê nuha wan jî dev ji kurdî berda ne, çend îstîsna ne tê da, hemû malper û waşanên wan jî êdî bi zimanê tirkî ne. Diyar e wan jî "terakkî" kirine (!)

Ya xerab, çepîtî û kurdperperîya me jî tu feydeyek zêde negihand me. Ji dêlî ku zanîna siyasî û bi taybetî jî çepîtî nasname û hestên me yên netewî xurttir bike, di warê zimên da qelstir kir.

Li gor salên 1960î kurd bêtir politîze bûne, bêtir organîze ne, xwedêgiravî bêtir xwe û cihanê nas dikin. Yanî di warê siyasî de bêtir "şiyar" bûne.

Lê "şiyarbûneke" bêberhem û belovacı ye.

Heger ne wiha bûya dibê nuha axaftin û nivîsandina bi zimanê kurdî di nava kurdan da bûba tiştekî herî tabîî, bûba zimanê danûstendin û nivîsandinê.

Pir mixabin netîce eksê vê ye. Her ku em "polîtîze" bûne, bûne kurdperwer, çep, sosyalîst û şoreşger, hewqasî jî em ji ziman û kultura xwe dûr ketine û nasnama me ya netewî ya kurdariyê zeîf bûye.

Yanî jî delî ku em bi pêş kevin, em bi paş de çûne. Heta ku em gundî, şivan, gavan û cotkarî bûn me zimanê xwe parastîye, lê roja em bûne bajarî, xwedî diplome û "bekçiyekî" dewleta tirk, me tavilê dev ji zimanê xwe berdaye.

Ev yek paradokseke pir mezin e. Lê rastiya me ye.

Li gor teoriya Nazim Hikmet, dibê em ji bav û kalên xwe pêşdetir bin, ji wan bêtir li nasname, kultur û zimanê xwe xwedî derkevin.

Lê çi heft ku sifra hazir eksê vê ye. Her nîfşê (cîlê, qirnê) nuh, li gor yê din hîn zûtir û rehetir dev ji zimanê xwe berdide û bi zarokên xwe ra bi tirkî dipeyive.

Û wek kurd di vê şêla xwe de jî tu anormaliyekê, tu çewtiyekê nabîne.

Ma ne dibê wek mirovên dindar, sosyalîst, pêşverû, ronakbîr, şoreşger û nizamî çi û çi, em ji her kesî bêtir bi berpirsiyarî û mesûliyetên xwe yê netewî rabin û bi zimanê xwe bipeyivin, xwe û zarokên xwe fêrî xwendin û nivîsandina zimanê xwe bikin.

Yanî wek mirovên welatperwer sosyalîst, pêşverû û çep, dibê berê em zimanê xwe fêr bibin, dûra yê xelkê.

Lê çi heft ku em wiha nakin, em bi zimanê xwe ra tim miamela zarokê dêmariyê dikin.

Di vî warî da ez dixwazim îcar jî nimûneyekê ji kurdên me yê Enedoliya Navîn, ji kurdên Konyayê bidim.

Ez bawer dikim cara pêşî min kurdên ji herêma Konyayê li Swêd dîtin.

Di sala 1980î da dema ez hatim Swêd, min gelek kurdên Konyayê jî nas kirin û bi gelekên wan ra jî bûm dost û heval. Ez dikanim bibêjim he-ma ji destpêkê min ji wan gelkî hez kir.

Ji ber ku xusûsiyeteke wan gelkî kêfa min jê ra dihat: Bi hev ra bi kurdî dipeyivin.

Min wek şexs her tim qedir û qîmetêke mezin daye vê şêl û xusûsiyeta kurdên Konyayê.

Lê wer xuyaye ku ew jî hêdî hêdî dev ji vê xusûsiyeta xwe ya netewî, yanî dev ji zimanê xwe yê dayikê berdidin û dikevin prosesa asimilasyonê, yanî wendabûn û tirkbûnê.

Ev 400-500 sal in ku kurd li Enedoliya Navîn, li herêma Konyayê dijîn, lê ne heliyan, ne dev ji zimanê xwe berdane û ne jî bûn tirk.

Bi zarokên xwe ra tim bi kurdî peyivîn û dev ji kultura xwe berne-dan.

Lê zarokên wan (nifşên piştî 1970î) vê tradîsyona bav û kalên xwe xera dikin, yanî hêdî hêdî dev ji zimanê xwe yê dayikê berdidin.

Tiştê wê rojê min dît ez gelki xemgîn kirim û bû seb ku ez vê nivîsê binivîsînim.

Wê rojê şagirtêka (xwendekareka) keç ya 19 salî ji bo çend hefteyan hat li ciyê ez lê dixebitim dest bi kar kir. Dibistanê ji bo praktîkê ew şandibû.

Dema min fêhm kir ew kurda Konyayê ye kêfa min hat û hema raste rast ez pê ra bi kurdî peyivim.

Lê bersîva wê ya bi tirkî ez matmayî hiştim.

Ez bi tirkî nepeyivim û min di kurdî da israr kir. Wê jî di tirkîya xwe da.

Dema dît ez bi tirkî bersîvê nadimê, dest bi swêdî kir. Got ez bi kurdî nizanîm.

Li gel ku ew li Swêd hatiye dinyayê lê dîsa jî bi tirkî wek bilbilan bû. Û bi kurdî jî qet nizanîbû.

Li gor gotina wê, ew bi dê, bavê xwe ra jî bi tirkî dipeyive. Min hinekî gazin ji vê yekê kir û got, "çima ew li Swêd fêrî tirkî dibe?"

Bersîva wê pir balkêş bû. Ji min ra got:

-Ez li swêd dijîm, loma jî dibê ez bi swêdî bipeyivim. Û ez diçim Tirkîyê, loma jî dibê ez bi tirkî bizanibim.

Di sohbetên me yên dûra ez fêhm bûm ku ne li vir tenê, dema ew diçe gund, li wir jî bi kalik û pîrika xwe ra bi tirkî dipeyive.

Ev destpêka asîmilasyon û wenda-bûna kurdên Enedoliya Navîn e.

Helbet nimûne ne ev tenê ye. Di çend programên televîzyonê da jî min dît ku li gundên herêma Konya û Kûlûyê zarokêdî bi kurdî nizanin, zimanê malê jî bûye tirkî.

Çi heyf ku teoriya Nazim Hikmet, "Ez ji zarokê xwe yê hatiye dinyayê paşdetir û ji bavê xwe yê mirî jî pêşdetir im" ne li ba me kurdên bakur tenê, li ba kurdên Konyayê jî belovaciya vê teroriyê ye. Çimkî li gel hemû şiyarbûn, pêşketin, kurdperwerî û çepîtîya wan jî ew ji bav û kalên xwe ne pêşdetir in.

Heger pêşdetirbûna, wek bav û kalên xwe, ewê jî bi zarokên xwe ra bi kurdî bipeyivîyana.

Dibê em baş bizanîbin, di nava kurdên Enedoliya Navîn da wendabûna zimên, wendabûna wan bi xwe ye jî...

Zimanheziya min ji gundê min Doda dest pê kir

Konê Reş

Doda gundê min e, li navbera Qamişlo û Nisêbînê ji rex rojilat ve û Amûdê û Mêrdînê ji rex rojava ve dikeve. Gundekî sînori ye. Li ser herdû şivên hesin e. Di sala 1917an de dema ku almanan xeta tirênê a (Berlin-Bexdayê), di Nisêbînê re derbas kirin û li gundê Tilzîwan sekini, hingê Dodayî ji mirovên xwe yên di ser wê xetê re qut bûn û navê wan bû Binxetî û yên di ser xetê re navê wan bû Serxetî. Bi demê re mirovên herdu rexên xetê, ji encamê danîna mayîn û têldiriyanan, dûrî hev ketin; bira ji bira, xal ji xwarê, ap ji birazî qut bûn, tevî ku pîr nezîkî hev bûn û her roj ji dûr ve hev diditin!

Di sala 1946an de, Sûriye ji destê fransîyan rizgar bû û di sala 1948an de dewleta erebî qereqolek leşkerî li gundê Doda ji kelpîçan ava kir û di sala 1954an de ji dibistanek ji bo fêrkirina zimanê erebî lê avakirin û wiha xwendinê bi zimanê erebî dest pê kir. Ta wê hingê kesî ji gundê Doda û gundên derdorê ne bi zimanê erebî û ne bi zimanê tirkî zanîbû... tevan bi kurdî xeber didan û jiyanek kurmancî derbas dikirin... Piraniya xelkên wê bi cil û

bergên kurmancî û bi kum û kolos bûn. Min çavên xwe li wî gundî, di malek kurmancî ya orjînal de vekirin û bi irf û adetên herêma Berîya Mêrdînê mezin bûm. Her sibeh li ser dengê şivan û kerîyê pez, xulxula tayr û tilûrên hewşê û dengê meşka dewkilana dayika xwe şiyar dibûm...

Nizanim ev kurdperwerî û hezkirina ziman kurmancî ji ku bi min re çêbû?! Bav û kalên min beşdarî di ti şoreşên kurdî de ne kiribûn. Di malbatê de dihat gotin ku sê birayê bapîrê min (Sîrac, Ixêr û Arfo) di zindana Mêrdînê de mirine. Ser çi ber çi nizanîm. Li gor ku tê bîra min behsa zulm û zora tirkî dikirin û cudabûna xwe ji tirk û ereban bi zimanê kurmancî nîşan didan. Di odeya bavê min de me bi mereq li çîrokên Memê Alan, Siyabend û Xecê, Evdalê Zeynê, Rêstemê Zal, Mîr Miheme, Xandimdimê Çengzêrî, Pîra Sehirdar û çîrokên mîrekên Botan guhdarî dikir... Di dawîya salên 1950î de, di wê biçûkaniya min de, berî ku bavê min radyoyekê bikire, her êvar di wê odeyê de çîrok, serpêhatî û stran dihatin gotin û di nav re qala berfa giran û a sor dikirin...

Qala fermana Filla, sala Kurmancî, sala kuştina şêxan dikirin... Sala xelayê tanîn ziman... Behsa şerên gundê Nicim ku di navbera eşîra Bûblana û Temika de bû, dihat qalkirin. Behsa mêraniya axayê Bûblana Êsivkê Qaso û birayê wî Hecî Îbrahîmê Qaso dihat kirin... Behsa şerê Elîkê Betê û vekirina wî ji hebisa Nisîbînê re dikirin... Şerê Haco û Cimo û şerên mala Perîxanê dikirin... Çîroka şewata bajarê Amûdê ji hev re digotin...

Qala berberîya Dekşûrîya û Hevêrkîya, Îssabegîya û Xelîlbeğîya û Mehmûdkîya û Etmankîya dikirin û pêre bînxetbûna Ehmedê Silêman, axayê Omerîya a gundê Niqare ji hev re digotin... Ji ber ku em malbatek çîrokhez bûn, çîrok û serpêhatî bi pîrbûn di odeya bavê min de dihatin gotin, her êvar ew ode tijî zîlam dibû, min jî xwe li wan digirt û ji xwe re li gotin û çîrokên wan guhdarî dikir... Belê piştî ku şoreşa Barzanîyê nemir di sala 1961ê de dest pê kir û bavê min radyoyek kirî, zextên rêjîmê li ser gundîyan ji berê diwartir bûn, rewşa wê odeyê jî hinekî hat guherîn... Tevî wê rewşê her sibeh û her esir zîlamên gund li dor wê radyoyê komdibûn û li nûçeyên şoreşa Barzanî û mêraniya pêşmergeyan guhdarî dikirin û ji aş û bajar ve go-

tinên di pesnê pêşmergeyan û Mele Mistefa Barzanî de ji hev re digotin... Erê, wek ku min got, di wî heyamî de kesî ji gundîyan bi zimanê erebî nedizani jî bilî melayê gund pê ve, erebîya wî jî a Quranê bû, dema ku bi cendirmeyên qereqola gund re bi erebî xeber dida, neferên qereqolê bi erebîya wî dikenîyan...

Di wê biçûkanîyê de ji min werê xelkên dinyayê tev bi zimanê kurmancî xeber didin... Ji min werê ji zimanê kurmancî pê ve, ziman di dinyayê de nînin... Ta ez agahdar bûm ku ew çend neferên qereqola gund yên ku bi zimanê erebî xeber didin, ereb in, ew jî xwedî zimanekî xweser in. Jixwe ji roja ku ez agahdarî derdora xwe bûm, mezinan em şîret dikirin û ji me re digotin: Nêzikî sînor û herdu şîvên hesin nebin, wê cendirmeyên tirkî ji qereqola gundê Qesra (Serçixanê) û gundê Çûva tivingan berdin we û we bikujin...

Gelekcaran jî digotin wê romîwebîkujin, ev peyva dawî (romî) kalemêran digot. Bi wateya tirkî, anku romî û tirkî yek in. Erê ji wê hingê ve min naskir ku tirkî jî xwedî zimanekî xweser in û ne tenê zimanê kurdî zimanê dinyayê ye. Bi serwestbûn û fêrbûna rewşa derdora xwe re, min jî bi nîfşên xwe re, di navtar û ser benderên gund de bi

listik û yarîyên kurmancî dilist; Çav-
girtinkê, Hitkê, Xar û Kab, Tûştê,
Çirê, Qijimqal, Babûtan... Kesî ji me
zarokan bi zimanê erebî nizanîbû...
Dema ku ez di sala 1960î de çûm di-
bistanê, şagirtên berî min ta bi sinifên
çaran hebûn... Bi çûna dibistanê re ez ji
dinyakê çûn dinyayeke din; me tiştek
ji mamoste fam nedikir... mamoste
ji bi zimanê me nizanîbû... Ta ku em
fêrî tipên erebî bûn, me sed dijarî
kişandin. Belê dijarîya herî mezin ku
me wateya peyvên nizanîbû...

Me dor û dersên xwe ezber dikirin,
bêyî ku em maneyê zanibin... Em fêrî
nivîsandinê bûn, lê em fêrî şiroveya
wê nivîsandinê nebûn, dê û bavê me ji
bi erebî nizanîbûn ku ji me re bêjin...
Bi tenê ewên ku li ber destê Melayê
gund Quran xwendibûn, wan, ji yê
din bêtir zîrekîya xwe nişan didan.
Dawîya sala sisyan bû, dema ku careke
din Xelîlo bi ser neket û têkçû, bavê
wî Xelefko gelekî aciz bû û ji zilmên
ku li ber dîwar rûniştî bûn got: Law!
Hûn qerfê xwe bi têkçûna Xelîlkê min
dikin, de bela xwendin bi zimanê kur-
mancî ba, we ê bidîta bê çawa kurê
min zorîya zarokên we dibe û li pêşîya
wa ye... Lawo!

Ma xar û kab bi zarokên we ve
hiştine... Lê ev zimanê erebî pê gi-
rane... Nizanim ev ziman ji kû ji me

re anîne! Bela dibistan bi zimanê kur-
mancî ba, we ê hunerê Xelîlo bidîta...
Pirê caran, piştî çend heyvan gelek za-
rok ji dibistanê direviyan, qîma xwe bi
şivantîya ber peş û dewaran tanîn, lê bi
çûna dibistanê netanîn... Tevî ku ka-
lemêran ji hev re digotin: Cegerxwîn
dibêje, ne bi xwendinê be em bi pêş
nakevin û nabin wek ereb û tirk...
Hin caran, di xwe de diponijîm û min ji
xwe re digot: çima xwendin û nivîsan-
dina bi zimanê kurmancî ji nîne?!

Di wî heyamî de em di nav agirê
du zimanan de dihatin şewitandin:
Ji bakur ve tirk û zimanê tirkî ser-
dest bû û ji başûr ve ereb û zimanê
erebî serdest bû... Me di navbera
Xelîl û Celîl de li berxwe da... Me bi
zimanê erebî xwend, digel re ji me
zimanê xwe ji bîr nekir û parast... Bi
rastî qencîya vê parastinê a pêşî li
dê û bavê me vedigere, li civata me
a gundîtîyê vedigere... Îro bi saya
wan û saya alfabeya Mîr Celadet Be-
dirxan, em bi zimanê xwe dixwînin û
dinivîsîn, tevî ku bi demê re gelek
ji zargotina me toşî windabûnê bûye,
gelek ji peyvên me yê resen nebedî
bûne û gelek ji pêmayê me xelkê
dizîye û kiriye ji milk û malê xwe...
Erê hêjano! Zimanhezîya min ji
gundê min Doda û trajîdîya gelê min
dest pê kir.

Şofêrê texsîyê

İbrahim Korkmaz

Rojekê Rojan Ali li balafirgehê hevalê xwe Şervan dit, çû ba Şervan û xal xatirê wî pirsî bi şûnda li dor aliyê xwe mêze kir, dît ku Memedê dinik û sê-çar kes li doralîyê wî sekinîne û bi baldarî gudarîya wî dikine û carcaran jî bi dengê bilind dikenine. Memed î serhev deng dikîye û tu fîrsetê nadiye kesekî din. Rojan Ali bi Şervan ra got: Were, em jî herin ba Memedê dinik, em hem hinekî kêf bikin û hem jî hinekî stresa xwe bavêjin.

Memed qala şofêrekî xwedanê çar texsîyan dikir. Serê xwedanê çar texsîyan pir tehlihev bû. Ji dest çar texsî û şofêran da perîşan bûbû. Carna şofêr nedihatî kar, îş li cih dihiştin. Divê şofêrekî nû bigirê, carna jî qeza dikiirin. Ew tim diçû tamîrxaneya ereban. Tamîrxane tu halekî meriv bikişîne neye. Cizirtîya matqabê, dengê çakûçan, nalinalî dengê ereban û bina boyaxê her derek hilnandibû. Tu halekî meriv bikişîne nîne. Patron Hesên di çileyeka mezin da bû. Patron jî ber stresê pêş çavên xwe nedidît. Derdê patron Hesên ne yek ne jî dudu bûn. Carna jî bo sîgorta eraban çêbike û jî bo meaşa şofêran bordoyên wana çêbike, divê he-

re ba muhasebê jî. Eger hesab rast nebe daîra bacê dê cezayên mezin lê bibirin.

Hesên di halekî pir bi stres da bû. Meslegê texsîtiyê pir bi zehmet bû. Halê Hesên halekî pir pêrîşan bû.

Rojekî Hesên li jina xwe ra telefon dike, dibê: Ez, îro saet li şeşan warime mal, şîvekê jî bo min çêke!

Jina Hesên jî radibe şîvekê jî Hesên ra dikelîne û hazir dike, dide ser sîfrê. Saet dibe şeşê êvarê Hesên nayê mal. Hesên yan dîsa jî bîr kir, yan jî tureka dûr derket û nikarî were. Şîva jina Hesên amade kirî, dîsa di beroşê da maye. Hesên carekê têye mal û jî jina xwe dipirse, dibê:

– Te şîv da ser?

Jina Hesên dibê: Te ti îro jî bo şîvê telefon nekir.

Hesên dibê, min ji te ra telefon kir. Jina Hesên dibê, te do ji min ra telefon kir, îro te ti ji min ra telefon nekir. Te yî êdî roj jî tevhev kiriye. Va çilê min î giran, ez ji destên te da dikişînim!...

Hesên: Temam jina min temam, tu çi bêje ew heqê te ye! Ne sîcê te ye û ne jî sîcê min e! Ev sîcê karê min e! Meslegekî pir bi zehmet e, carna şofêr

nêne kar, carna erebe dişkên, qeza dibin, ez terim tamîrxaneyan. Ji ber vî karî heş li serî min de nemaye. Ez nizanim, ez çi dikime.

Paşê jina Hesen derbasî aşxanê dibe û dibê: Ez ji te ra şîvekê serdim.

Jina Hesen ji nişka va got: Ez te ra tişteki bêjim, sibê tu mere kar, mêvanê me dike warin.

Hesen got: Bila bi xêr buwe, çima û kî têye mêvandariya me? Jina Hesen got: Erê, bi xêr e, mêvanên me keça me li lawikê xwe ra dixwazine. Lawik û keça me li hevdu hez dikine û dixwazine bizewicin.

Hesen şaş bû! Bi meraq li ser hev pirsra li jina xwe dike. Jina Hesen ji ber pirsên Hesen hêrs bû. Hesen dipirsî: Merivên baş in? Merivên dewlemend in? Karê wana jî texsî ye? Lawikê wana kar dike? Lawik ti berdûş nîne?

Jina Hesen li ber pirsên Hesen din bû!.. Ji Hesen ra got: Derdê te tim pere ne! Perên te serê te bixwin! Perên te çi fayda xwe li me heye? Eger ez jineka li ser xwe nebûma, niha zarok hinek alkolîk, hinek narkoman û hinek jî li kolonan da serserî bûna. De bibê, perê te çi faydeya xwe li me heye?

Hesen ji jina xwe ra got: Tu nabîne? Xwarin, wexwarin û kincên wana ez tînim û min ew muhtacî kesî nekirine.

Jina Hesen êdî tam hêrs dibe û dibê: Li vî welatî dewlet perê xwarin, wexwarin û kincan dide. Ez jî terim kar û tu qet qalê vê nakî, ez jî ji mal ra pera tînim. Tu tenê kar nakî! Tu qet qalê vê nakî!..

Hesen got: Temam tamam jina min, tu her tişteki ra qulpeki pêva dike. Ez nikarim te ra baş bikim! Tu çi bêjî, tu heqlî yî! Heta tu şîvê dide ser, ez herim oda din, serê xwe daynim û îstirahet bikim.

Jina Hesen şîva xwe çêkir û amade kir. Çû bang Hesen bike. Çi bibîne, Hesen bi frekanseka mezin xorxor bû û ketibû xeweka kûr. Jina Hesen dîsa bi hêrsekî got:

– Mêro, Xwadê bela xwe bi te de!.. Şîva min dîsan di beroşê da ma!..

Hesen roja paşin li xewê rabû serê xwe şûşt û rûyê xwe kur kir (traş bû) û kincên xwe yên rind li xwe kir. Hesen ji bo mêvanan xwe rind çêkir. Êvarê mêvanên Hesen hatin. Hesen bi dengêki ken got: Werin, kerem kin, werin hundir!..

Mêvanên Hesen dê û bavê zêve û zave bi xwe bûn. Zave xortekî dirêj û por-bijang reş bû. Burîyê zavê çatik û porê xwe ber paşîyê ve şekirî bû. Zave rabûn û rûniştina xwe dizanî, xortekî ciwan bû. Destên wî ne destên merivên karî bi zahmetkirî bûn, destên wî

destên qelemgirtî bûn. Mêvan rûniştin bi şunda, dor paş xwe nêrîn. Di odê da, diwarî yek cilek Hz. Elî bi zulfikarî va nakişkîrî bû. Dîwarî yek ji cilek bi wêneya xezalan darxistî bû. Dîwarê ortê ji Qurana kerîm darxistî bû. Wekî malên gundiyeî Anatoliyê bû. Hesen di koltixekê da rûniştibû. Di koltixê da hilnedihat. Hesen di elbîse da rihet nedikir. Zikê Hesen pir pêşta derketibû. Zikê gir li serî Hesen bûbû bela.

Jina Hesen pir jar bû, meriv bala xwe didayê ew estîyên wê derketibûn û meriv dikarî parsîyên wê bijmêre. Çavên wê wekî li serê da pêşta firîbûn. Wekî ku barê hemû dinyayê wê kişandibû.

Dê û bavê zavê merivên kîbar bûn. Hesen ji nişka va li zavê pirsî û got: Tu çûyî dibistanê?

Zêve bersiva Hesen da û got: Min Unîversîteya Kopenhagê xwandîye. Min ekonomî û iktisadî xelas kiriye.

Hesen tiştê li xwendina wî fam nekir, dîsa li zavê pirsî: Tu bahsa pera min ra bike. Tu rind pera distînî?

Zavê bersiva Hesen da û got: Ez karê xwe memnûn im. Ez ji bo karê xwe aciz neme.

Vê wextê bavê zavê deng kir û got: Bi emrê Xwedê û bi qewlê peyxamberê me, ez keça te Sunayê li lawikê xwe Ertan ra dixwazim.

Meriv nizane serê Hesen li ku derê ye û belkî neda guhbiser bavê zavê jî. Ji nişka va Hesen pirsê li zavê pirsî: Te li nexwaşxaneyê repora tendurîstîyê hanîye? Û te li polîs kaxiza xwe ya qencbûnê stand?

Di odê da bayekî sar çû û hat, mêvana li çavên hev mêze kirin. Giştikan şok derbas kirin. Jina Hesen çavên xwe mîna bomba atomê, li serî dikirîn bifirin. Di destên keça Hesen de fîncana kirin şegeteq. Hesen her tişt xirab kir!..

Paşê zave bi xwe da hat û got: Ez li te kar naxwazim û ez ti muhtacê karê te neme. Ez keça te talib im.

Hesen êdî berda çû ku tiştêkî neçê kiriye, qise çex kir û got: Her xortek hat ba min, ez ji rev xwe tim wana dîsa hatine kar bixwazine û ji bo vê min tevlihev kir. Hûn giştik qusura min bibexşînin! Niha zewaca we ji me herdu alîyan ra bi xêr buwe! Êdî em xismên hevdu ne.

Her du hêla qehwa xwe vexwarin û mêvanan misada xwe xwastin. Mêvan derketin derva û bavê ji lawikê xwe ra got: Tu bi çi cesaretê, keça van merivên ehmaq ra dizewîciye? De here çîla serî xwe bikişîne û Xwedê tewîşê te buwe!..

Ji çarînên Omer Xeyam

Wergera ji farisî: Ehmed Mîlan

Wekû çerxa felekê li gor mirazê dizane negerya
Dixwazî felekê heft bijmêre yan heşt
Divê heke bimirî, bila miraz hemû bibin heşt!
Çi mûristang bixwe di gorê da, çi gur bixwe deştê da

Di xewnê da, zaneî porsipî mi ra dibêje
Ji xewê, - kesekî gula şahîyê neqetandîye
Çi kara dikî, ku bi ecel ra cot û heval dibî
Meyê vexwe, tu yê gelkî bin axê da bixewe

Heyf ku nama xortanîyê barkir û çû
Û ew nûbahara jiyanê bû zivistan çû
Demak, navê xortanî ji pê ra digotin
Me'lûm nebû ku ew kînga hat û kînga çû

Ewanê ku jîngeha, zanist û edebê re cur bûn
Di koma kemala şemê da hevdest dibûn
Rê ji vê şeva reş û tarî, pêşta nedibirin
Gotin efsane ye û li ser da jî dixewin

Esrara ezelê ne tu dizanî û ne jî ez
Hella vê meselê ne tu dixwînî û ne jî ez
Heya ji pişt perdê da gotêbêja min û te ye
Dema ku perde bikeve, hîngah ne tu mayî û ne jî ez

Ey xwedanê fitwayê em te pirtir dixebitin.
Li gor wandeyî mestî û serxweşî ji te hişyartir in.
Tu xûna kesan dixwî û em xûna rezan.
Însaf bike ka gelo kîjan ji me xûn xwartir in.

Kesekî nemir hebe cihanê da, me nebihîstîye
Divên ji wê dinê hatî û gihîştîye, me nebihîstîye
Hêvî û tirsê me bi tiştêkî ye, ku ji vê berhemê jî
Xêncî nav û nişanê mayî, tu tişt ne eşkere, diyar e

Li ber kargeha kûzegerekî derbas dibûn
Li bin pîyê çerxê da ostakî kar dikir
Li kûzkan ra her destê û qolp çêdikir
Ji herrîya serê padişah û destê parsekçîkî bûn

Divên cennet û hûryên çevreş yê hebin
Û li wê derê çemin şerab û hingiva hebin
Heke me mey û dilber hilbijartibe çi xem
Axiret û a'qibet, dîsa ew mey û dilberê bibin

Ji wê meyê ku jiyana cavdane¹ ye, bixwe
Sermaya lezzeta ciwanî û xortanî ye, bixwe
Dişewûtine wek agir, belam him jî xem û derd
Sazende² wek ava jiyanê û heyatê ye, bixwe

Heke bade vedixwî, baş e ku bi zana ra vebixwe
Yan bi senemek gulrû û lêvken ra vebixwe
Pirr venexwe mest û serxweş nebe, eşkere meke
Kêm vexwe, car caran vexwe û dizîka vexwe

¹ Cavdan: ebedî, dayim, hemîşe her wext, her dem, her gav.

² Sazende: ev kesê ku tiştêkî çêdike, saz kirin, dorist kirin.

Teyr

Giovanni Boccaccio (1313-1375)

Çavkanîya almanî: *Aus dem „Decamerone“*

1348-1353: 5. Tag, 9. Geschichte. Übertragung von Karl Witte

*Giovanni Boccaccio, ji alîyê hin pişporên mijarê da, wekî bavê nivîsandîna hikayeyê tê bi nav kirin.


Wergera ji almanî: Nuh Ateş

Di zemanekî nêzik rabirtî da li Filorenzê esilzadeyekî ciwan dijîyaye û belkî îro jî dijîye. Ew bi navê Federîgo di Messer Filîppo Alberîghî dihatiye naskirin û bi rabûn û rûniştinên esilzadetîyê di ser hemsal û hevpişeyên xwe yên li Toskanayê ra dihatiye girtin. Wekî ku dihatiye serîyê esilzadeyên ciwan, Federîgo jî bûye dilketîyê sitîya bi navê Monna Giovanna ya ku wê demê li Filorenzê wekî jina şîrin û bedewtir dihatiye naskirin. Wî, sewa ku xwe bi wê bide hezkin, bi camerî xwe didaye ber zehmetiyên tûrnuva û pêşbaziyên cengê, şênûşahî amede dikirine û bêyî ku hay ji sermîyana xwe hebe ûd û dîyarî belav dikirine. Lê sitîyê ya ku li rû bedewîya xwe mûtewazî jî bûye, pir kêmbala xwe didaye van qewimîyên ku ji bo xatirê wê çêdibûn û xwedîyên wan.

Her çiqas ku Federîgo di ser îmkan û heyîyên xwe ra mîqdarên

ewqas mezin bê mene xerc dikiriye jî qet tişteke bi dest nedixistiye. Lewma ew di demeke kurt da pir xizan bûye, ji çêwlikek piçûk ya ku wî bi zehmet pê debara xwe bikira û ji teyrekî xalîs yê li rûyê dinyayê bêemsal bêtir, heyîyên wî gişt ji dest çûyine. Di wê navberê da evîna wî her diçûye bi şewat dibûye û ji ber ku wî wer bawer dikiriye ku ew êdî nikane weha wekî bajarî li gor dilxwazîya xwe bijîya, ji bajêr vekîşiyaye melbendê. Li wir ew li çewlika xwe bi cih bûye. Bêyî ku mihtace kesî bibe, wî di nav nêçîrvanên teyrûtûyan da bi sebir tehemûle xizaniya xwe dikiriye.

Dema ku êdî şertûşûrtên bi-heyîbûnê ji bo Federîgo pir xeraw bûne, waqî bûye ku mêrê Monna Giovannayê giran nexwaş ketiye. Gava ku ew pê hesîyaye ku jiyana wî berve dawîyê dihere, wî wesîyetna-meyek çekiriye û tê da lawê xwe yê ku êpê mezin bûye, wekî mîrasxwarê



yasayî ji bo dewlemendiya xwe ya mezin êlan kiriye. Û şayêd ku kurê wî bêî mîrasxwarên qanûnî bimire, wî jina xwe, Monna Gîovanna ya ku wî pir jê hez dikirîye, wekî mîrasxwara qanûnî êlan kiriye. Pir neçûye ew miriye û jinebîya ku jêmayî, wekî ku li ba jinên vê cîhûwarê edet bûye, havîna wê salê tev lawê xwe bar kirîye havîngeha wan ya ku pir nezîkî çewlika Federîgo bûye.

Wengina ew zaroka yê ku bi hebûna kûçîk û teyrûtûyan pir

şadibûye, bi Federîgo va bûne nasê hevûdu. Çend caran ew bûye şahîdê firîna teyrê Federîgo û pê pirûpir şa dibûye. Daxwazîya wî ya herî mezin ew bûye ku bibe xwedîyê wî teyrî. Lê belê rûyê wî nedigirtiye ku teyr ji Federîgo bixwaze, ji ber ku wî didîtiye ku teyr li ba Federîgo çiqas bi qîymet e. Li wê demê qewimîye, zarok nexwaş ketiye. Dayîka wî ya ku tenê zarokekî wê hebûye û mîna rûhê xwe ji wî hez dikirîye, pir bi berxwe diketiye. Ji sibê hetanî



êvarê wê bi libergerînên bi lez ji wî dipirsîyaye ka dilê wî çi dixwaze û digotîye çi dibe bila bibe, her çi daxwazeke gengaz be, ewa wê bi cih bîne. Xortê nexwaş yê ku çend caran van pêşnîyaran bihîstine, nihayed wengina bersiv dayîye:

„Dayê hun dikanin rê lê bikin ku ez bibim xwedîye teyrê Federîgo, hîngê bawer dikim di demeke kin da ezê dîsa sihetxwaş bibim.“ Gava ku sitîya esilzade wan gotinan bihîstîye, pêçekê ew li ser wan fikiriye û ji bo ku çi bihê kirin, gihêştîye qenaetekê. Wê baş dizanîbû ku Federîgo demeke dirêj ji wê hezkiribû beî ku nêrîneke wê bûbûbê nesibê wî. Lewma wê ji xwe bi xwe ra gotîye: „Ez dikanim sewa vê teyrê kê bişînim ba Federîgo yan jî ez bi xwe herim ba wî. Û li gor ku min bihîstîye, ev teyreki bi esiltir e yê di xizmeta neçîrvanekî da û bi ser da jî bi vî awayî debara xwedîyê wî pê dibû? Û ez a çawa bikanim evqas bêînsaf bibim û ji merivekî esilzade yê ku jê ra ji xeyrî vê tişteki ku ew pê şabibe nemaye, bixwazim vê jî ji dest wî bigirim?

Her çiqas ku ew emîn bûye, eger rica bikira wê teyrê werbigirta jî, bi van dîtinên tevlihev wê bersiv nedaye lawê xwe û bêdeng maye. Nihayed hezkirina wê ya ji lawê xwe

biserketîye û sewa ku wî rehet bike, encam çi dibe bila bibe, wê biryara xwe wer dayîye ku wî neşîne ba Federîgo, bilakis bi xwe here ba wî û teyr bîne. Lewma wê gotîye: “Lawê min ji xwe ra neke xem û hewl bide da ku tu zû sihetxwaş bibî, lê ez ehd dikim ku sibehê zû gava min ya pêşî ji bo teyr be û ez bawer dikim ku eza wî bînim!” Tenê vê bersivê zarok ewqas pir şa kiriye ku pê di eynê şevê da xweşbûneke sivik li wî xûya bûye.

Dora din ya rojê Monna Giovanna bi sitîyek din ya refeqetvan va bi kêfxwaşî hetanî xaniyê piçûk yê Federîgo çûyîne. Ne wexta neçîrvanîya çûçikan bû û lewma çend roj bûn ku Federîgo ji mal derneketibû. Wengina qewimîye, gava ku Giovanna li wî pirsîyaye, ew li baxçeyê xwe bûye û li wir bi karên hûrik ra mijûl dibûye. Gava pê hesîyaye ku ewê li ber derîyê wî ye û li wî pirsîye, ew mat maye, bi lez û silavên rêzdar berginde wê çûye. Lê ew rabûye ser pîyan sewa ku wî zarîf silav bike û gotîye: “Roj baş Federîgo!” Di dûv ra daye ser û gotîye: “Ez hatime ku ji bo hemû derd û kederên ku ji avrûyê min da hatine serê te, bedeleki bidim. Ji ber ku tu dilketibûyî û te bi dilşewatî ji min hezkiribû, ya ku ji te ra bê feyde bû. Bedel ew e, ez difikirim ku bi refeqet-

vana xwe va, beî kesên din, îro li ba te xwarina nîvro bixwin.”

Federigo bi dîlnizmî bersiva wê dayîye û gotiye: “Sîtîya ezîz, ez qet tu nerindîyan nizanim yên ku ji alîyê we da li min hatibûn kirin. Lê eger ji ewqas pir xweşbextiyê parek pesne bibûye ya min, vava tenê di saye rasthatina bi we va û hezkirina min ya ji we da, bûye. Û bi rastî ew serdana we ya ku ji dîlpakîya we tê, li ba min, herçiqas ku hun hatibin ba xwedîmalekî destteng, pirûpir bi dilê min e, mîna ku bibêjî zengînîyên ku ez zemanekî xwedîyê wan bûm û min pê xercîyên mezintir dikirin, şûnda li min hatibûn veğerandin.” Ji van gotinan şûnda, wî bi fedî ew bire mala xwe û paşê ji wir da jî bire baxçeyê. Jiber ku tu kesî wî yê din tune bûye ku bikanîya refaquetîya wê bikira, wî gotiye: “Sîtî Gîovanna, çima ku kesî din li vira tune ye, ev jina hane baş, jina rêncberê min e û ewa refaquetîya we bike, ez jî bi dagirtina sîfreyê ra mijûl bibim.”

Her çiqas xizaniya wî mezin bibûye jî hetanî wê demê wengîna nedihesibandiye ku israfkarîya bêhûdud ya dewlemendiya berê wî desteng bike. Lê vê sibeyê ew berê bi desttengîya xwe hesiyaye. Ji bo rûmetdayîna Gîovannayê her tişt



bi kêmanî bû, halbûku zêmanekî wî sewa xatirê wê bêhêjmar kes têr û birûmet dikirin. Bi diltirsokîyeke fedîkar, mîna ku hay ji xwe nebe, ew virda û wêda diçûye û dihatiye, gava ku wî ne pere û ne jî tiştêkî ku bikira bedel dîtiye, lome li qedera xwe dikiriye. Di vê navberê da saet nêzik bûye û herçiqas dîlxwazîya wî pir mezin bûye ku xizmeta xanima hêja qet nebe heta redevêke bikira, lewma wî nikanîbûye biryar bide, ku tiştêkî ji kesekî din, heta jî rêncberê xwe bixwaze.

Ajalê wî yê hêja yê ku li mitbaxê li ser darîkê xwe danîştibû bi ber çavên wî ketiye. Ji ber ku tu çareyeke din nedîtiye, wî ew girtiye, li ajalê bi esil nihêriye û ew, sewa xwarinekê, rind xwedîkirî û rewayî xanimeke weha dîtiye. Û bêî ku zêde bifikire, wî stûyê wî badaye û bi lez ew daye xizmetkara xwe, sewa ku ew bi baldarî

karê rûçikandinê û biraştina bi şîş bike. Dûv ra wî hin paçê sifreyê yên sipî mîna berfê, yên ku jê ra mayîbûn, li ser maseyê rexistine û bi rûyekî dîlşad çûye derva ba xaniman sewa ku ji wan ra bibêje, xwarina nîvro, vîqasî ku imkanên wî rêdayîye, amede ye. Sitî û refeqatvana wê rabûne û çûyîne maseyê û dest bi xwarinê kirine, bêî ku bizanin, wan tev Federîgo yê ku bi pûtêya mezin xizmeta wan dikiriyê, teyrê heja xwarine.

Gava ku ew ji ser sifreyê rabûne û demekê bi wî ra sohbetên dostane kirine şûnda, ji bo xanim Gîovannayê dem hatibû ku ew qala sebeba hatina xwe bike û bi nêrîneke hevalane ya berbi Federîgo kirî, wê wer dest pê gotinê kiriye: “Federîgo gava ku tu serpêhatiyên xwe yên berê bibîrtînî û hîşkîya torevanîya min ya ku mimkun e te wekî zalimane hesibandibe, hînge ez ne şikdar im ku tu yê derheka cesareta min da ecaîb bimeyî, gava ku tu bibihîzî ka ez di eslê xwe da sewa çi hatime vira. Lêbelem zarokên te hebûyana yan jî tu ji bo hinekan pir ketîbûyayî, hîngê ez wer rind bawer dikim ku te yê bikanîya hezkirina ku meriv pê wan diparêze binasîya û kêmbê jî qet nebe eza li ba te heta redyekê efkirî xwîya bibûma. Tu ne xwedîyê zarokekî yî,

lê ez dayika lawikekî me û wekî hemû dayikan nikanim xwe ji ber qeydeya ku bo hemû dayikan derbas dibe, badim. Û ev qeydeya min mecbûr dike ku dijî dîlxwazîya xwe, erê dijî tore û hewcedariyan ji te diyariyeke ricû bikim ya ku ez pê dizanim ew li ba te çiqas giranbiha ye. Ji bo vê pir sedemên te jî hene ku tu wê giranbiha bibînî, ji ber ku nerindiya qederê ji te ra ji xeyrî wî tu tiştêkî din yê ku tu pê aşt, şa û xemrevî bibî, nehiştiye. Lê ev diyariya teyrê te ye yê ku xortê min bi arzûyeke bêhemd dixwaze bibe xwedîyê wî. Eger ew nebe xwedîyê wî, tîrsa le min ew e, nexwaşîya wî ya ku ew ji ber ramedîyaye, pirûpir xerabtir bibe, kî dizane belkî ji ber wê ez wî wenda bikim. Lêwma ez li ber te digirim, ne sewa xatirê hezkirina te ya ji min, -ji ber ku sewa xatirê wê tu qet ne minetdar î-, tersîne li gor zihniyeta xwe ya esîlzadetîyê ya ku te li gor edet û destferehiya li qesr û qonaxan ji her kesî bêtir parastîye, hez bikî teyrê xwe diyarî min bikî, sewa ku ez bikanim bibêjim, te bi vê diyariyê jiyana lawikê min xelas kir û ew ê pê herdem di bextê te da bimîne.”

Wexta ku Federîgo daxwaza Gîovannayê bihîstîye û bi rû da şiyar bûye ku ew nikane daxwaza wê bi

cih bîne, ji ber ku wî teyr wekî xwarin dayibû ber wê û berî ku bikanîya bersivek bidaya, ew horûhor giriya. Gîovannayê berê bawer kiriye ku sebeba barandina van hêstiran êşa veqetîna ji teyr e û ew giheştiye wê geneatê ku hema bibêje, ew naxwaze bibe xwedîyê teyr. Lêbelê wê xwe girtiye û bersiva Federîgo payîye. Federîgo gava hêstirên xwe zeptkirine şûnda deng kiriye û wer gotiye:

“Banû, jikî ku Xwedê razî bûye û min dilê xwe berve we kiriye, li ba pir derfetan min qeder wekî dijmine xwe dîtiye û derheqa nerindîyên wê da şikatdar dibûm. Lê evana giştik li hemberî ya ku niha tê serîyê min, pir nizm bûn. Ji bo ku ezê çawa bikanim carek din bi qederê xwe va li hev bihem. Gava difikirim ku ez bi xapandinên wê bêmecal mayî me, da ku bikanim dîyarîya piçûk ya ku we ji dil da dixwazt û niha sewa wê hatina mala min ya xizan ya ku we, gava ew dewlemend bû, rewayî serdanê nedîtibû. Çima ez nikanim vê bikim, dixwazim kurt qala wê bikim. Wexta min bihîst ku we xwaztiye -spas ji dilovanîya we re- li ba min xwarina nîvro bixwin, min bawer dikir ku, serîyê min da esilzadetîya we û hevditina bi we va, ya minasib bibe, biqasî ku imkanên min rê bidin, we

bi xwarinekê rûmetdar bikim ya ji yên ku meriv pê mivanên din bi rê dixin, giranbihatir. Hîngê teyr hate bîra min yê ku hun niha ji min dixwazin û ew çiqas mikemel e, ez wî wekî xwarineke rewayî we dibînim. Bi vî awayî îro bi nîvro ew braştî li ser tebaxa we bû û min bawer dikir ku min cihêkî baştirin ji wî ra amede kiribû. Lê niha ez dibînim ku hun bi awayekî din ji wî hez dikin. Ji ber ku ez nikanim xwazteke we bi cih binim, êşa min ewqas pir giran e û ez bawer nakim derbarê vê da careke din bikanim xwe aşt bikim.”

Ji van gotinan bi şûnda, wî wekî delîlê wan perrik, pençe û nikûlê teyr bi wê daye nimandin. Gava Gîovannayê ev gişt bihîstine û dîtine, di destpêkê da wê rexne li wî kiriye, ji ber ku wî sewa xizmeta jinekê teyrekî wengînayî esîl kûştiye. Lê paşê, ew bi dizikî heyrane mezinahîya wî bûye ya ku tahlîya belengazîyê nikanîbûye kuh bikira û ji wî ra aha di vê demê da jî mayibû. Ji ber ku omîdî giştik yên ji bo ku ew bibe xwedîya teyr ji dest çûyibûn, tirs û endîşe yên derbarê sihetxwaşîya lawik da li wê peyda dibûn. Ew pir biberxweketî veqetîyaye û vegeriyaye ba lawikê xwe. Niha, yan têsîra hêrsbûna ji ber ku wî nikanibû teyr bidesbixista, yan

nexwaşi çêşidek weha bû ya ku bêyi kanibûya encameke weha bidaya, bes hatiye, pişti rabirtina tenê çend rojan wî, bi kedera herî mezin ya dayikê, jîyana xwe ji dest dayîye.

Di encama vê wendayîya giran da dayikê demeke dirêj bi şîn û yas derbas kiriye. Lê ji ber ku ew hîn ciwan bû û serweteke mezin bidestxistibû, birayên xwe rehetî nedidane wê û sewa zewaceke duyem pir ling didane ser. Her çiqas wê çêtir ditiye ku xwe ji bo vê paşda bigire, lê li hemberî zordayîna birayan ew fiki-riye û ji bo zewacê wekî îsabetîyeke baş, Federîgo û delîlê wî yê dawîyê, comerdîya wî ya bi rihekî bilind hatiye ber çavên wê ya ku wî pê teyrekî weha sewa xatirê wê kûştibû. Lewma wê ji birayên xwe ra wer gotiye: “Çêtir e, eger hun destûrê bidin, ez dixwazim kursiya xwe ya jinebîtiyê neguhertî bihêlim. Eger daxwazîya we ew be, ku ez ji bo zewaceke duyemîn gav biavêjim, hîngê bi rastî

eger Federîgo Deglî Alberîghî nebe nesîwê min ez qet bi kesî din ra naze-wicim.” Bi ser vê gotinê da birayên wê qerfên xwe pê kirine û gotine: “Bêaqilê, tu li wira qala çî dikî! Tu çawa dikanî wî bixwazî yê ku li rû vê dinyayê qet tişteki xwe tune?” Lêbelê wê hema wer bersiv dayîye: “Birayên min, ez baş dizanim, rewş weha ye wekî ku hun dibêjin. Lê ez mêrê ku ji dewlemendîyê fereget di-ke li hemberî dewlemendîyê tercîh dikim, ya ku bê mêr e.”

Gava ku birayan zîhniyeta wê fehmkirine, ew qanîbûne ku Federîgo, herçiqas xizan be jî, merivekî herî bi rûmet e û pê razîbûne ku ew, li gor xwastinên Giovannayê, bibe mêrê wê û xwedîyê hemû zengînîyên wê yên bêsinor jî.

Lê wî biryar dayîye ku bi xwedîbûna jineke mikemel ya ku wî pir zêde jê hez dikiriye û bi ser da jî xwedîya sermîyanêke pir mezin bûye, bi salan rojên dîlfrehî derbas bike.

Helbest

Baranê Qereyazîyê

Şev tarî bû
Stêrk li ezman bûn
Hîva tijî Kurdistan ronahî dîkir
Ez ketim xeyaleke şîrîn
Min dît Kurdistan ava bûye
Ala kesk, sor û zer li asimana
Çar perçê Kurdistanê bûne yek
Bêdaletî û zilm ji ser rûyê cîhanê rabûne
Zarokê birçî û tazî nemane
Azadî û aşîti hatîye Kurdistana rengîn
Neyartî û xainî nav me rabûye
Xain û dijminê derdorê me belav bûne
Çiyayê Sîpanê û Şengalê roja azadîyê pîroz dîkin
Kulîlkê serê çîya kilamê azadîyê dibêjin
Çiyayê Agirî hêstirkên şabûnê dibarîne
Sîpan û xelat hevdi hemêz dîkin
Firat û Dîclê coş bi coş diherikine
Dibistan û zanîngehê kûrdî vebûne
Zarok û xortên me zimanê dayîkê dipeyîvin
Bav û kalê me kilamê mêranîyê distirên
Xuşk û dayîkên me govenda azadîyê digirin
Bi dengê dayîka xwe ji xewna şîrîn hişyar bûm
Min fêm kir ku ev tiştê xweşik xewneka şîrîn û daxazîyê bêdawî bû...

Hevbandoriya çand, bawerî û tevgerên tewşê

S. Erdem

Destpêk:

“Di kovara fransî *Le Nouvel Observateur* de, ji felsefevan û civaknasê olî yê fransî Frederic Lenoir hatiye pirskirin, ka civakên nûjen çawa dikarin bi ezoterîzmê re li hev werin. Wî jî bi ev gotinên jêrîn ên Edgar Morin bersîv daye û gotiye: “Ademîzad hem zana ye hem ecêb e. Ji bo ku mirovkî bijî, bi qasî mantiqê hewcedarê hestê ye û bi qasî zanistê jî hewcedarê efsaneyê ye.”¹

Mirov, heyînê tenê ye ku hay ji kêmasîya xwe ya biyolojîkî û belkî jî, ji bidawîya xwe heye. Ji ber vê yekê jî, dilxwazîya bawerîyê dike. Her çend ev dilxwazîya bawerîyê ji hêla faktorên çandî û civakî bandordar dibe û dimenên cîhêreng derdixe pêş jî, bi gelemperî wekî ol hatiye saz kirin. Ji yekem lêkolînên zanista civakî va tê kirpandin ku ol, di rêxistinbûna civakê de faktoreka pir girîng e. Lê belê, cureyên ku neyekser ên bawerîyan pêwendî

bi tiştên pîroz re hene û di çarçova olan de li ser wan nayên sekinîn. Ji van cureyên herî girîng, bi gelemperî, bi hiş, ramana zanist-analîtîk û carinan jî bi dogmayên olî yên kevneşopî re neguncandî ne. Ev bawerîyana bi gelemperî bi têgînen mîna efsûn, bawerîya tewş, bawerîya bêbînî û yawe tînen vegotin. Ramana efsûnî di navbera tişt, mirov û bûyeran de tê wateya sazkirina sedemên cûrbecûr û pir caran çewt. Di vê sayê de derfet hebe ku mirov li ser tiştê ku li dora xwe diqewîme bi têkiliyeka sedemî ya watedar bi-sekine û ji şoka guherînên ji nişka ve dûr bikeve û bi girêdana guhertine, bi xwedayan, melean, mûcîzeyan, bi cezakî bi heq, bi kêfaretê ya jî bi kiryarên efsûnkaran bikaribe lihevhatinekê di navbera cîhana ku lê dijî û hişê xwe saz bike. Bi vî rengî ew ê bikaribe pêşbînîyê bike yan jî qet nebe fîkarê kêmbike.² Di pergala civakî de (veşartî yan eşkere) fon-

¹ Köse&Ayten,2009:48

² Parladir&Ozkan,2015:174-175

ksîyona her tiştî heye.³ Di civakê de ti nirx û rastîyên civakî ne vala û bêwate ne. Ji ber vê yekê, êşkere ye ku xurafeyên di civakê de hevpar ji fonksiyoneka xwe yê veşarî yan êşkere bibe.⁴ Bawerîya tewşê, bi hebûnên civakî yên herêmekê re têkildare.⁵ Bi heman rengî, bandora hêmanên civakî-çandî, wekî malbat, siyaset, aborî, exlaq û ol, li çêbûna bawerîya bêbinî, ya li cîhekî diyar mezin e. Pêwendîya hevparîya serxure hejmarra sêzde, ya li Rojavaya Xiristîyan, bi çanda Xiristîyanî; girêdana bawerîya serxura hejmarê çaran, bi çanda Japonî re (Kaneko, 1990) pêwendîya, bawerîya dê zîrar dayîna nezera çavê xerab, bi çanda Rojhilata Navîn re û ev rastîyekê ku pêwendîya çanda misilmantîyê, bi wekî ku bawerîyên, bêoxir a daweta di navbere du îda de û dê carandina kesê ku bêbingeh di ser kulik û çopan re derbas bin. Wekî ku bawerîyên ji çandeka diyar derdikevin û tenê li wir bêhempa hene, bawerîyên ji tixûbên cîhê çêbûne derbas dibin û li cîhanê belav dibinê wek mînak, derbasnebûyîna di bin merdîwan û di ber pisîka reş

re, bi xwe re gerandina hejmarek an tişteki bextewar û hwd ji hene. Ji ber vê yekê, eger bawerîyên tewş, şopên çandeka diyar hildigire, hingê dikare were gotin, mimkun e ku bi dîtina bawerîya tewşê ew çand, agahdariya ji derheqê hin taybetmendîyên wê çandê hebe.⁶ Ji bo ku em tevkarîyê li lêkolînê li ser çandê bikin, di vê xebatê de em ê çend mînakên ji bawerîya tewşê yên gundê me (Gundê Hesina / Şereflî Koçhisar / Enqere) bidin û wan şîrove bikin.

1. Danasîna bawerî û tevgerên tewşê:

Pênaseyeka bi gelemperî pejirandî ya têgîna bawerîya tewşê tune ye. Ji ber ku, ya ku kesek ecêb û derew dibîne, dibe ku yên din wekî diyardeyên normal û rewşên adetî bibînin. Her weha çî bawerîya bêbinî ye û çî, ne ye dibe ku li gorî dem û cîh biguhere. Çimkî her çend bawerîyên bêbinî, di jiyana rojane ya mirovên nûjen de cîhekî bêhempa û mezin digirin û bi jiyîn, urf, adet û ramanên çand û gelên cîhêreng bi salan e ku teşe bigirin ji⁷ hin bawerîyên ku di rabirdûyê de pir hatinê pejirandin, niha ji hêla pir kêman kesan va tên qebûl kirin an

³ Arslan, 2004:11, ji Tolan, 1996 veguherîye.

⁴ Arslan, 2004:11, ji Dönmezer, 1982 veguherîye.

⁵ Arslan, 2004:11, ji Turhan, 192 veguherîye.

⁶ Arslan, 2004: 11

⁷ <https://www.history.com/news/migrant-mother-new-deal-great-depression>, tarîxa gihiştinê: 25.01.2021

jî yên ku îro ji hêla çend kesan ve tîn qebûl kirin, dibe ku di pêşerojê de belav bibin. Ji ber vê yekê, pêdivî ye ku meriv gava pênasa bawerîyên tewşê bike, peywenda civakî, çandî û dîrokî bide ber çavan.⁸ Bi heman rengî bawerîya tewşê, wek mînak mûzîk û çîrokan ji kevneşopîyên kevînar e û ev kevneşopî alîkarîya danasîna çandê dikin.⁹

Yekem zanyarên civakî yên ku bi bawerî û tevgerên bêbînî eleqedar in, bawerîya tewşê wekî meyla vegotina bûyerek ji sedemên xwezayî ji hêla sedem an sedemên ku derexwezayî, razdar û bi zanistî tîne derewandin, dana nasîn.¹⁰ Mînakî, li gorî Alfred Lehmann, xurafe “gumanek gelemperî ye ku, bi oleka diyarkirî re lihevnehatî ye û bingehek wê tune, yan gumanaka giştî ye ku mixrikî asta zanînê ya ku civak gihiştîyê dike.” Her weha Wuttke ji xurafetê wiha vedibêje “taybetîyên derexwezayî didin tiştan û yên sermirovane jî didin mirovan.”¹¹ Li gorî van hemî nirxandinan, bawerîya tewşê yan xurafe yan jî bawerîya bêbînî, dikare wiha were pênasekirin; “Bawerî û tevgerên bêbînî, bawerî û kiryarên ku bi sane

û têgihîştina olî ya nivîsarên pîroz re naguncin in û ji ber vê yekê bêwate xuya dikin, lê feydeyên psikolojîkî ji kesekî re peyda dikin û ji nîfş bi nîfş berdewam dikin.”¹² Li gor va pênasekirinan, dikare were gotin ku bawerî û tevgerên tewşê xwedîyê taybetmendîyên wekî bêbingeh û bê aqil in, li gorî dem û cîh diguherin, û ji kesekî re sûd werdigirin.

2. Dabeşandina bawerî û tevgerên tewşê:

Tevgerên xurafetê, ji jiyana takekesîya rojane ya mirovan, heta çanda civakî û kevneşopîya di gelek waran de tîn ditîn. Ji ber vê yekê ev babeteke pir fireh e û em ê di vê xebatê de dabeşkirina mijarê li ser raştîyên ku di jiyana mirovahîyê de cîhekî girîng digirin bikin wekî: zewac, jidayikbûn, mirin û yên din. Çimkî di jiyana mirovan de serdemên girîng hene û mirov ji kêliya têgihîştinê ve di gerdûnekê de ye. Mirov bi jidayikbûnê re veguheztineka li qadek bi tevahî cuda dike. Li gorî Arnold Van Gennep, ku peyva rêûresmên derbasbûnê destnîşan kiriye û ji ber vê yekê ew yekemcar bi kar anîye rêûresmên derbasbûnê “merasîmên ku

⁸ Köse&Ayten, 2009:49

⁹ <https://www.history.com/topics/folklore/friday-the-13th>, tarixa gihiştinê: 08.05.2021

¹⁰ Köse&Ayten, 2009:49, ji Rudskî,2003 veguherîye

¹¹ Köse&Ayten, 2009:49, ji Örnek,1966 veguherîye.

¹² Köse&Ayten, 2009:51, ji Rudskî,2003 veguherîye.

bi guherînên di cîh, rewş (statu), pozisyona civakî û temenê de ne.”¹³

Ev sê demen girîng ên veguhestinê ev in: Jidayikbûn, zewac û mirin. Li dorê van sê qonaxên girîng, gelek bawerî, adet, kevneşopî, merasim, rêûresm, pêvajoyên binyata olî û efsûnî kom dibin, û ew van “veguheztinan” li gorî bendewarî û qalibên çanda ku ew tê de bi rê ve dibin”. Demên derbasbûnê ên din ev “bendegeh”ên girîng ên di jiyana mirovan de ne. Armanceka van bawerî û rêûresmên bi taybetî di dema derbasbûnê de çêdibin heye. Ev ji bo destnîşankirin, pîrozkirin, pîrozkirina rewşa nû ya mirovê di “dewra” veguhestinê de ye, û di heman demê de parastina mirov ji xeter û bandorên zîrarê yên di vê demê de têne bawer kirin. Ji ber ku, li gorî bawerîya hevpar, mirov di serdemên derbasbûnê de qels e û ji bandorên xisar re vekirî ye.”¹⁴

2.1. Bawerî û tevgerên tewşê yên di derbarê zewacê de:

Di jiyana mirovan de cîhê zewacê girîng e û xwedî rêûresmên ku, ji jiyana civatî/çandî nayên veqetandî ye. Ji ber vê yekê, dema dahol (dawet) ku di civaka me de awayê herî hevpar yê rêûresmên di derbarê zewacê de ne, têne lidarxistin,

bawerî û tevgerên tewşê ji nayên paşguh kirin. Ku çend mînakên ji gundê me (Gundê Hesina/Şereflî Koçhîsar/Enqere) bidim:

2.1.1. Sibeha ku bûk were malê zavê, li ber malê ji siware dernakeve heta ku xezûr an xesûya bûkê neyê û nebêje: ez ê mangekê (çelek), golik, pez an bizinekê û hwd bidim bûkê. Bi vê re dibejin “yola bûkê” û tê bawerkirin çawa ku ev heywanana bi zayîne pir zêde dibin, bûk ji hatiye vê malê pîroz bike û zîretê wan bidomîne.

2.1.2. Gava sibeyê derketina bûkê, bûk derxistin û anîn berî malê zêve, merivek li ser xanîyê malê zêve neynikê li bûkê û zêve digire ku ma bextê wan wekî neynikê geş û ronahî be. Bi heman awayî merivek jî, ji ser xanî de çerezan wek mînak şekir û fistiqan bi ser serîyê bûkê û zêve de belav dike ku ma ji zewacî wan re pîrbûnê û jiyaneke dewlemend bîne.

2.1.3. Di heman demê de merivekî ji eqrebê zêve wekî xwesû, gorim û hwd. kûzekî avê li ber ningê (lingê) bûkê li erdê dixê û dişkîne. Tê bawer kirin ku ger xûyên bûkê yên xerab hebin, ew ê bi kûz re werin şikandin.

2.1.4. Sibeyê derxistina bûkê gava ku li malê zêve, bûkê di hundurê

¹³ Kartal, 2017:36, ji Yeşil, 2014 veguheriye.

¹⁴ Kartal, 2017:37, ji Örnek, 2014 veguheriye.

malê kin, li ber devê deriyê derve, li ber şemûgê kevçiyekî darîn didin binê pehnîya meresê bûkê ku ma pêlêne û bişkîne. Tê bawerkirin ku ger bûk bihêz bû û ew kevçiya şikand pîrbûnî ê were malê.

2.1.5. Piştî ku bûk ket hundurê xanî, wê dibin odeya ku mêvan wan pîroz bikin û li ser bilindahîya bûkê li jor serê wê re mixekê li dîwêr dixin ku bila bûk di wê malê de wekî mix zexm di wê malê de asê be.

2.1.6. Dema ku mêvanan li odê bûk û zava pîroz kirin bi şûn de, dergûşekê didin hemêzê bûkê ku ma dergûşên wan ên xweşik jî bibin.

2.1.7. Roja hineyê, pezê ku ji bo nanê hineyê were serjêkirin, divê bi lênêrînek taybetî ji merivên nenas û ne eqrebe û xêrnexwes were parastin ku ma ew merivana, mûyê wê pezê yan tişteki din jê hilnenîn û pê ji bûk û zavê re efsûna çênekin an nedin

çêkirin. Çimkî tê bawerkirin ku heke efsûn were çêkirin, bûk û zava ê di şeva zewacê de bikevin tengasiyê.

2.1.8. Şeva dawetê dora xanîya malê zavê tê xêzkirin ku ma ji bûk û zava re pîrsgirêk çênebin. Bi he-man rengî, devê tiştên wekî sandoq, berkêşk, buxçik û sindirûkan vekirî têne hiştin ku ma wê şevê pîrsgirek çênebin.

Zewacyekji qonaxên girîngên demen veguhêz e, yek ji kevneşopîyan e ku bandorê li jiyana me ya civakî dikin. Her çend bawerî û tevgerên tewşê yên di zewacên çandên din de ji hev cûdane jî, ew di her kevneşopî û çandê de hene û cihê wan ji aliyê pênasandina çandê ve girîng e.

Nîşe: Merivên ku di lêkolînê de nimûneyên bawerî û tevgerên tewşê yên gundê me dayinê Sultana Ereb (Sultan Erdem) û Şekira Malê Birê (Şakire Çağan) e.

Çavkanî

Arslan, M., 2004, "Kişilerin Batıl İnanç Kaygı Düzeylerinin Bazı Değişkenler Açısından İncelenmesi", *Dergipark / Değerler Eğitimi Dergisi*, s.10-34.

Kartal, A., 2017, "Türk Kültürü İçinde Bozkır (Konya) Düğün Geleneğinin Değerlendirilmesi", *Dergipark / Karadeniz Uluslararası Bilimsel Dergi*, Cilt: 36, Sayı:36, s.34-46.

Köse, A. & Ayten, A., 2009, "Batıl İnanç Ve Davranışlar Üzerine Psikososyolojik Bir Analiz", *Dinbilimleri Akademik Araştırma Dergisi IX*, Cilt: 47, Sayı:3, s.45-70.

Parladır, H. S. & Özkan, D., 2015, "Sosyal Bilimlerde Paranormal İnançlara Dair Çalışmalar: Sekülerleşme Ve İnanç İnkileminde Modern Birey Ve Toplum", *Celal Bayar Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, Cilt: 13, Sayı:1, s.172-202.

Salname Kalender 2021



ZIMAN Û ZAROK HEBÛN Û PÎROZÎYÊN ME NE!



MIZGÎNÎ JI BO ZAROKAN

Geli zarokên qenc û şîrîn!

Mizgîniya me li we. Va ye APECê

ji bo we bi kurdî: bi zaravayê za-
zaki, soranî û kurmancî ev kitêbên şîrîn

weşandine. Hinek ji van kitêbana CDya xwe ji hene. Hinek wek **Pûkbook** bi deng û hinek ji **online** hene. Ku hûn
bixwazin, hûn dikanin di ber xwendina kitêbê re bi deng ji guhdari bikin. Hûn dikarin li wan malperên jêr binêrin.

www.pukbook.com och <https://varldensbibliotek.se/shelves/kur/children>

Li Stockholmê: **Apec Tryck & Förlag AB**, Mjölmarstigen 1, 163 41 Spånga

Tel: 08-761 81 18 • Mobil: 0708 32 39 58 www.apecpublishing.com • E-post: order@apecpublishing.com

Çarşema Sor cejna êzidiyan ya herî naskirî ye. Her sal di yekemîn çarşema meha nisanê ya li gor salnameya gregorî
tê pîrozikirin. Li gor baweriya êzidiyan, Xwedayê alemîn her sal melekeki rê dike rûyê erdê, ji bo ku nebaşiya li nav
însanan ji holê rake û başi di nav însanan de belav bibe.

Cejna Çarşema Sor cejna herî mezin e di nav civaka êzidî de. Ev cejn li gor salnameya gregorî
her sal di çarşema pêşîn ya meha nisanê de tê pîrozikirin. Li gorî ola êzidî di çarşema pêşîn ya meha
nisanê de dunya hatiya avakirin. Di vê cejnê de civaka êzidî hêkan dikelinin û reng dikan, ew hêk ji
temsila nûavakirina gerdûnê dikan. Bi hezarên salan e ku civaka êzidî vê cejnê pîroz dike.




Weke Weşanxaneyê Apecê ev çend sal in ku em vê salnameya kurdî û swêdî diweşînin. Herweki di salnameyên
dunyayê de me ji xwest ev salname bi hinek xisûsiyetan be: bi rojên navên keç û lawan, bi rojên girîng ku di dîroka
kurdan de giraniyeke xwe çêbûye.

Lê di navên mehên kurdî de aloziyek heye. Bi kêmanî di navên şeş mehên kurdî de aloziyeke mezin heye. Me li
gelek salnameyên kurdî mêze kir, lê em negêhiştin encamekê ku kîjan rast û kîjan ji aliyê etimolojîk û pedagojîk ve
baştir e. Lê me tiştekî din kir. Em vegeriyan ser sêra berê û kurmanciya malê ku demsalan li sê peryodan par dikan
û welê dibêjin. Ev babetê binavkirina mehan hîn ji di hinek zimanan de maye. Di swêdî de ji **förhöstén**, **mitthöstén**
û **senhöstén** heye. Herweki di kurmanciya malê de dibêjin, **payîza pêşîn**, **payîza navîn** û **payîza paşîn**. Me ev forma
bilêvkirina mehan çêtir dît û ji xwe Mîr Celadet Alî Bedîrxan ji di Hawarê de bahsa evê yekê dike. (hejmar:2, rûpel:7)

Îsal ji bo salnameyê me cil û bergên kurdî hîlbijart. Wêne ji arşîva kovara Bîrnebûnê hatine wergirtin.



Ni som vill stödja Stiftelsen-KAN
swishar till nedanstående nummer.
Xêrxwazên ku bixwazin alîkarîya Waqîfê bikin
ji vê numra Swishê re bişînin.



123 356 67 91

Swish-nummer

www.stiftelsenkan.com • info@stiftelsenkan.com



www.birnebun.eu